Arşîva Bîra Kurdan: Ji parêzer Huseyin Yildirim gotara, "Kurdistan: Piştî sê salên dîktatorîyê" (Kanûn- 1983) ▶ R. 12

LE MONDE
diplomatique
kurdî

Gulan 2011 - Hejmar 18 · www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com · 24 Rûpel

**Patrick Seale**
Pêlên raperînên gel yên azadîxwazîyê ji destpêka nîsanê ve xwe gihandin Sûrîyê jî. Beşar Esed dê bikaribe bi reforman rê li ber hilweşîna xanedanîya xwe û rejîma baasî bigre?
▶ R. 8

**Christophe Jaffrelot**
Gelo têkilîyên tevlîhev yên Çîn û Hindistanê dê li hember cîhana rojava bikaribe pêşî li hevkarîyên herdu welatan bigre? Konsepta "Çîndistanê" dê van pirsgirêkan ji holê rake?
▶ R. 11

**Wade / Sigurgeirsdottir**
Li gor lêkolîneke navneteweyî ya 2006ê, îzlandî, dilşadtirîn gelê cîhanê bûn. Lê bi krîzeke aborî ya îlona 2008ê rûxînê dest pê kir. Stêrka Îzlandayê çawa beriqî û çawa vemirî?
▶ R. 14

**Ignacio Ramonet**
Rojnamevanîya li ser înternetê ber bi ku derê ve diçe? Medyayên klasîk ên nûçeyan dê bikaribin li hember malperên nûçeyan û otomatên ragihandinê li ber xwe bidin?
▶ R. 18

**Philippe Rivière**
Stuxnet a ku kurmikeke komputerê ye û li gor şarezayên vîrusan li seranserê cîhanê bi dehan hezar makîne xirap kirine li dij bernameya nukleerî ya Îranî jî hate bi kar anîn?
▶ R. 20

# Siyaseta kurd û raperîna sîvîl

PROF. DR. MESUT YEGEN *

Piştî ku li navendên gelek navçe û bajaran bi sedhezaran hemwelatîyên kurd tevlî xwepêşandanên Newrozê bûn, du rêxistinên girîng yên siyaseta kurd ên li Tirkiyeyê Partîya Aştî û Demokrasîyê (BDP) û Kongreya Civaka Demokratîk di 24ê adarê de kampanyayeke siyasî dan dest pê kirin. Bi vê kampanyaya nû ku bi navê raperîna sîvîl dest pê kir, BDP û DTKyê daxwazên xwe yên "perwerdeya bi zimanê dayikê", "serbestberdana girtîyên siyasî", "dawîlêanîna operasyonên leşkeri û siyasî" û "rakirina sînorê sedî 10 ya hilbijartinê" dan diyar kirin. Tê gotin ev kampanyaya ku serkêşîya wê ji alîyê birêvebirên BDP û DTKyê ve tê kirin û tê de çalakvan bi rûniştinan rêyan asê dikin, di navenda bajaran de li hin meydanan "konên çareserîya demokratîk" vedidin, heta ku daxwaz bi cî bên dê berdewam bike.

Wisa dixuye ku hêmaneke girîng ya kampanyaya hilbijartinê ya BDPê raperîna sîvîl e ku bi demê re bi çalakîyên nû berfireh bû û dê heta hilbijartinên 12ê hezîranê dewam bike. Berê hevserokê BDPyê Selahattin Demirtaş ji bo protestoya merasîma sondxwarinê ku her serê sibehê di dibistanên seretayî de tê xwendin, bi îdîaya ku ew nijadperestî ye serî li birêvebirîya perwerdeya netewî ya bajarê Amedê da û ji wan daxwaz kir ku keça wî ya ku şagirda dibistana seretayî ye, beşdarî van merasîman nebe. Piştre dîsa hevserokê BDPyê bang li kurdan kir ku "li pişt wan meleyên ku bi misyona têkoşîna dijberîya terorê tên şandin û propagandaya ramana yek netew dikin, limêj nekin". Piştî vê bangê hemwelatî li meydana Derîyê Çîyê ya Amedê, li cîyê ku Şêx Seîdê rêberê serhildana 1925ê hatibû bi dar vekirin, kom bûn û limêja înê dêvla camîyê, li meydanê li paş meleyekî sîvîl kirin. Di xutbeya înê de ku bi kurdî hat xwendin, mele li ser pirkulturî û biratîya gelan weaz da.

Kampanyaya raperîna sîvîl ku BDP û DTKyê dabûn dest pê kirin, di bîrûraya giştî de cidî deng veda. Beşekî piçûk kampanyayê pejirand, lê bi taybetî rojname û televîzyonên alîgirên desthilatê yên kevneparêz îdia kirin ku kampanya ji bo ragêşî bê holê, hatiye organîze kirin. Bûyer û pevçûnên hûrikbar yên di navbera şênîyên kombûyî û hêzên ewlekarîyê de hatin holê, ji alîyê medyaya kevneparêz ve pir mezin hatin pêşkêş kirin û hat îdia kirin ku çalakîyên BDPyê ne di maneya raperîna sîvîl de ne. Bê ku destûrnedana polêz ji çalakîyên raperîna sîvîl re, li gelek deveran xirecirên di navbera siyasetmedarên BDP, pêşander û polêz, mîna ku xema BDP raperîna sîvîl nebe, hat şanî dan.

Ev kampanyaya BDP û DTKyê ku mehek e dajo û wisa dixuye ku dê herî kêm heta hilbijartinên 12ê hezîranê dewam bike, du pirsên mezin derdixin pêş. Pirsa yekem çima BDP û DTKyê pêwîst dîtine ku kampanyayeke wiha organize bikin? Mîna ku medyaya alîgira îktidarê ya kevneparêz îdia dike, ev kampanya berîya hilbijartinên giştî bi rastî jî, bi tenê bi armanca ragêşî bîne holê, dest pê kiriye yan jî, armancên BDP û DTKyê yên ji wê yekê wêdetir hene? Pirsa duyem jî, der barê şêwazê kampanyayê ye. Li vê derê jî pirs ev e: Ev kampanya bi rastî jî kampayayeke raperîna sîvîl e yan na?

## Çima raperîna sîvîl?

Li gor texmîna min ne mimkun e ku mirov bibêje tenê sedemeke kampanyaya raperîna sîvîl ya ku BDP û DTK pêşengîya wê dikin, hebe, bi taybetî jî, hemû armanca vê kampanyayê ew be ku bixwaze berîya hilbijartinê ragêşî bîne holê. Ji vê yekê zêdetir sedemên vê kampanyaya ku du rêxistinên mezin yên siyaseta kurd dixwazin îro organize bikin, hene.

Sedema yekem helbet berîya hilbijartinên giştî mobîlîzekirina alîgirên BDPyê ye. Ji ber ku BDP û DTK

▶ R. 3

**Almanya: 4,50 €**
**Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Holanda:** 5,00 €
**Brîtanya:** 4 £, **Danîmarka:** 40 DKK, **Norweç:** 40 NOK, **Swêd:** 50 SEK, **Swîsre:** 6,50 CHF, **Tirkiye:** 7 TL

# Hilbijartinên giştî û yekîtîya neteweyî ya kurdan

ORHAN MIROGLU *

Hilbijartinên li Tirkiyeyê dîsa di bin sîya gengeşîyên her sê partîyên mezin de pêk tên, ku yek ji van partîyan jî di warê çareserîya pirsgirêkên welêt de xwedî bernameyeke aşkere û fambar nîne. Heta niha li ser pirsgirêkên kurd û ermenî, dawîlêanîna şidetê, ku her ku diçe civakê dorpêç dike, berfirehtirkirina maf û azadîyên bingehîn, Qanûna li dij Terorê (TMK), ku herî zêde serê siyasetmedar û rewşenbîrên kurd dixe belayê, pêvajoya muzakereyên digel Yekîtîya Ewropayê, ku gelek hêdî dimeşe û herweha sebaret bi destûreke nû ji partîyên siyasî gotineke cidî nehat. Weha xuya dike ku ji niha û pê ve jî nayê.

Ji ber ku tu partîyeke siyasî siyaseta xwe ji ser rojeva rastîn a Tirkiyeyê re nameşîne. Di şûna wê de her sê partîyên mezin (AKP, CHP û MHP) siyasetên weha dimeşînin, ku mebesta wan hişyarkirina hest û refleksên neteweperest ên welêt in. CHPyê, ku ergenekonî, ku neo-îttîhadîyên Tirkiyeyê ne, xist nav lîsteyên berendamên parlamentoyê, parêzerîya Ergenekonê, ku ji alîyê Baykal ve hatibû ragihandin, kir rastî û peyamake girîng da vê damara sereke ya neteweperestîyê.

Ji alîyê din de jî MHPyê li Erdoğan û AKPyê, ku wekî reqîbên xwe yên herî mezin dibîne, bi "bozkurtan" ("Gurên boz" li Tirkiyeyê ji mîlîtanên MHPyê re tê gotin) gef xwar, yan jî ew tirsand. Serokê MHPyê Bahçeli, di hilbijartinên 2007ê de werîsê îdamê, ku di bêrîka wî de bû, li meydanan bi xwe re digerand. Dema ku wî ji neteweperestên tirk deng dixwest, sond dixwar ku dê Öcalan bi dar ve bike. Bahçeli di van hilbijartinan de wê ristê dilîze, ku hertim amade ye ku "bozkurtên" xwe bera meydanan bide. Di lîsteya wî ya pêşîn de Engin Alan heye û leşkerek e, ku di şerê li dij kurdan de wezîfên girîng stendine. Alan demekê fermandarîya Hêzên Taybet kiribû û herweha serokê wê komê bû, ku Öcalan girt û anî Tirkiyeyê. Kesê ku li Îmralîyê îfadeya Ocalan girtibû jî ji wî pêvetir kes nebû. General Engin Alan jî wekî gelek leşkerên din ên bersûcên JITEM-ERGENEKONÊ, ku di şerê li dij kurdan de por weşandine, dibêje ew 'fermandarekî welatparêz ê neteweperest e, ku hatiye têk birin' û ew wê yekê wekî îxaneta li dij neteweyê dibîne, ku dema ku cudaxwaz di meclisê bûn, ew jî digel hevalên xwe li ber dadgehan dihatin darizandin, ku li Silivriyê hatibûn damezirandin. Heger were hilbijartin ew dê bikeve meclisê û dê tekoşîna xwe, ku li ser çîyan nîvco hiştibû, di çarçoveya fikir û ramanên xwe de li vê derê berdewam bike. Ji ber vê yekê di warê pirsgirêka kurd de ji bilî xurîna neteweperestîyê tu kes li benda polîtîkayeke din a MHPyê nîne.

▶ R. 4



MÎRÊ HÊKAN: **Dûmana sor**, (1992) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê, 100 x 60 x 10 cm

www.arsivakurdi.org

# JI ÇAPEMENÎYÊ

## "PKK, êdî baskê çekdar ê BDPyê ye"

Hilbijartinên giştî yên 12ê hezîranê yên Tirkiyeyê ji nêz ve bala çapemenîya cîhanê jî dikşîne. Kovara brîtanî ya **The Economist** di 14ê nîsanê de gotareke li ser hilbijartinên li Tirkîyeyê weşand ku tê de dengên kurdî jî nirxandin. Kovar dubare-namzetîya Leyla Zana wekî nîşaneya guherîna li Tirkîyeyê bi nav dike û dibêje "Vegera Leyla Zana [bo sîyasetê] nîşan dide ku Tirkiye ji wan rojan, ku çavên zana hatibûn girtin, îşkence lê hatibû kirin û ew li pêşîya girtîyên zilam hatibû tazî kirin, cudatir e." Kovar herweha vê angaşta xwe weha berdewam dike: 'Û hevdîtinên nepenî, û heta bi rêk û pêk, yên navbera hikûmetê û Abdullah Öcalanê serokê zindanîkirî yê PKKyê hîna jî berdewam dikin.'

Kovara brîtanî wekî pêşbînî radigihîne ku herçend dê partîya îslama lîberal AKP di van hilbijartinan de jî têra xwe deng bistîne daku bikaribe ji bo cara sisîyan bi tena serê xwe hikûmetê ava bike, lê xuya dike ku AKP vê carê, wekî hilbijartinên 2007ê, nikare li herêmên kurdan zora BDPyê bibe. Kovar sedema vê yekê jî weha şîrove dike: '14 mîlyon kurdên vî welatî êdî qîma xwe bi komira belaş û ummeta îslamî naynin. 'Vekirina' AKPyê, ku dê efûyeke giştî bianiya, serhildêrên PKKyê, hilanîne ser refikan.'

Kovar herweha doza li dij KCKyê û kampanyaya raperîna sivîl a BDPyê bi bîr dixe ku dibêje ' ev stratejîya BDPyê hêja ye ku analîst guman dikin ku BDP di van hilbijartinan de dikare dora 30 kursîyan bi dest bixe. Namzetên çilmisî yên AKPyê yên rojhilata başûr a welêt jî nikare alîkarîya wê bike. Dibe ku ew yek baş be. Li Enqereyê çiqas zêde kurd hebin destûra nû, ku Erdoğan soz dabû ku piştî hilbijartinan derxe, dê ewqas berfirehtir be.'

Di dawîya şiroveyê de The Economist dinivîsîne ku: 'Ewên ku ji 'provokasyonên' BDPyê gazinan dikin, divê bangên xwe yên li PKKyê ji bo danîna çekan bi bîr bînin û bihêlin ku kurd bi awayekî aştîyane bigihîjin armancên xwe.' Kovar herweha dibêje ku Öcalan piştî girtîbûna xwe ya 12 salan hukimkirina xwe ya hesinî ya li ser PKKyê (bi herweha li ser BDPyê) sist dike. Nivîs bi vê tespîta balkêş bi dawî dibe: 'BDP niha hindiktir wekî baskê sîyasî yê serhildayan xuya dike. Ji delêva wê êdî PKK wekî baskê çekdar ê BDPyê xuya dike. Lê belê heta ku daxwazên kurdan bi cih neyê, weha xuya dike ku ne mumkin e ku ev baskê çekdar bandora xwe wenda bike.'

## Raperîna sivîl: Azmûna demokrasîyê ji bo Tirkiyeyê

Di 21ê nîsanê de rojnameya amerîkî The New York Times gotarek li ser çalakîyên raperîna sivîl a kurdan a li Tirkiyeyê weşand. Rojname bi bîr dixe ku kurd ji damezirandina komarê û vir ve ji bo mafên xwe têdikoşin ku di rabihurîyê de ev yek bi şerê çekdarî dihat kirin, lê belê niha kurd têkoşîna xwe bi çalakîyên raperîna sivîl dimêşînin ku îlhama xwe herweha ji têkoşîna ji bo mafên sivîl a amerîkî ya salên 1960ê distîne, ku amerîkîyên afrîkayî serkêşîya wê dikir.

Rojname herweha di arefeya hilbijartinên 12ê hezîranê de çalakîyên BDPyê jî ji bo serokwezîr Erdoğan wekî azmûna demokrasîyê bi nav dike. Rojname wekî din banga Erdoğan a li Husnu Mubarek bi bîr dixe, ku pê ji Mubarek dixwest ku guh bide gelê xwe, û lê zêde dike ku dijwarîyên ku partîyên kurdan rû bi rû dimînin, (nemaze biryara Lijneya Bilind ya Hilbijartinan a li dij namzetên kurd) îtîbara Tirkîyeyê û ya Erdoğan kêm dike.

## Gelo aborîya Tirkiyeyê ber bi ketinê de ye?

Heman rojnameyê di 25ê nîsanê de jî gotarek li ser aborîya Tirkiyeyê weşand. Gotara ku bi pirsa ' Gelo aborîya Tirkiyeyê ku pir bilez geş dibe, dike bikeve? -Teqez weha xuya dike.' dest pê dike; dibêje ku aborîya Tirkiyeyê dikele û berpirsiyarên serekê jî banka ne. Rojname dîyar dike ku dana kredîyên bi riya sms û bankomatan, lihevderneketina budçeya welêt mezintir dike, ku tê guman kirin ku % 8ê GSMHa Tirkiyeyê ye.

Rojname serûbinbûna aborîya Tirkiyeyê ya sala 1994 û 2001ê bi bîr tîne û cih dide bankevanekî tirk Atilla Yesilada ku dibêje: 'Em mezinbûna aborîya welêt bi giştî bi kredîyên derveyî welêt fînanse dikin, ku ev kredî her ku diçin buhatir dibin. Roj tê jîyan xwe digihîne te û tu dikevî.'

Rojname hevdem dinivîsîne ku hikûmeta AKPyê ji xwe bawer e û dibêje ku ew tedbîran distînin, lê belê bi bîr dixe ku di çend dehsalên çûyî de li dû hev mezinbûneke aborî ya bi vî rengî de serûbinbûna aborîyê rû daye.

## Gelo AKPyê herêm ji BDPyê re hişt?

Cengiz Çandar di gotara xwe ya14 nîsanê de, ku di **rojnameya Radîkalê** de hatibû weşandin, bi giştî hilbijartinên li Tirkîyeyê û nemaze jî namzedên AKP û BDPyê dinirxîne.

Çandar dîyar dike ku ew bi lîsteyên namzedên AKPyê yên herêmên kurdan şaş maye, ku tê de gelek navên girîng cih nagirin. Gotarnivîs herweha dibêje nebûna namzedên girîng ên AKPyê bi wî dide fikirîn ku AKPyê herêma kurdan ji BDPyê re hiştiye. Weha berdewam dike: 'Piştî ku min lîsteyên AKPyê dîtin ez ji xwe re fikirîm ku heger lîste weha bin, dibe ku serokwezîr derbarê pirsgirêka kurd de xwedî planeke nepenî ye ku piştî hilbijartina dê derkeve holê.'

Di warê temsîlkirina kurdan de Çandar dinivîse ku serokwezîr ji xwe re kiribû 'adet ku bi 75 wekîlên xwe yên bi eslê xwe kurd pesnê xwe bide, lê belê kurdbûn û bi eslê xwe kurd bûn du tiştên cuda ne. Çandar bi bîr dixe ku di navbera 2007 û 2011ê de yek jî van 75 wekîlên bi eslê xwe kurd di kursîya meclisê de, ji ber qedexeya AKPyê ya li ser wan, carekê jî navê kurd bi lêv nekiriye.

Nivîskar wekî din dibêje rast e ku BDP temsîla hemû kurdan nake, lê belê bê şik û guman e ku BDP temsîla wan kurdan dike, ku xwe wekî alîyê pirsgirêka kurd dibînin. Çandar herweha dibêje ku heger benda % 10ê bihataya daxistin, hejmara wekîlên BDPyê dê herî kêm ji % 50 zêde bibûya, ku ev yek 'edaleta temsîlîyê' ji bi xwe re bîne. Çandar weha bi dawî tîne: 'BDP -an ku enîya PKKyê- di meclisê de çiqas pir werin temsîl kirin, pirsgirêka kurd dê ew qas ji şiddetê bê paqij kirin û dê bikaribe xwe bigihîne çareserîyeke siyasî. Ev yek dê tirkîyeyîbûna partîyê jî bi xwe re bîne. Nebûna namzedên girîng ên AKPyê jî di vî warî de dikare bi kêrî BDPyê were.'

# Piştî çar salan…

SERGE HALIMI

Fona Pereyan a Nevneteweyî (IMF) hê nû lê mikur hat: "*Qederê çar salan piştî destpêka krîza malî, bawerîya bi îstîqrara sîstema bankeyan a navneteweyî hê jî divê bi tevahî bê nû kirin.*" (1) Lê belê tiştê ku serokê Rezerva Federal a Amerîkî Ben Bernanke weke "*Buhrana Mezin* [ya sala 1929ê] *jî di nav de, krîza malî ya herî xirab a dîroka dunyayê*" (2) dinirxîne, li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê nebû sedema tu mueyîdeyên cezayî. Goldman Sachs, Morgan Stanley, JP Morgan pereyên xwe li hilweşîna sermayeguzerîya bi rîsk didin û van bi lez û bez pêşniyazî mişterîyên xwe dikin... Di rewşa herî xirab de cezayê pereyan li wan tê birîn, lê para bêhtir bonusan distînin.

Ber bi dawîya salên 1980yê ve, di encama îflasa bi hîle ya bankayên tesarûfê yên amerîkî de, heştsed bankevan hatin girtin. Ji hingê ve hêza bankayan bi avakirinên ji nû ve yên ku hêza wan navendî kirin, zêdetir bû û vê hêzê ew li hemberî dewleta di bin barê deynê gelemperîyê de lawazbûyî, kire rewşeke ku ceza li wan neyê birîn. Di serî de Barack Obama, namzetên bê yên ji bo Qesra Spî, ji bo ku Goldman Sachs alîkarîyê bide kampanyaya wan a hilbijartinan ji niha ve lavan dikin; midûrê BNP-Parisbas qet xwe jê venade ku bi arizeyeke kredîyan gefan li hikûmetên ewropî bixwe, heke hikûmet bankayan bi awayekî cidî ji nû ve birêkûpêk bikin; ajansa notdayîna kredîya Standard & Poor's ya ku nota xwe ya herî baş a rîskê (AAA) dabû Enron, Lehman Brothers, Bear Stearns û herweha her şêwaz "ferzên kelevajî" (*junk bonds*), îşaret pê dike ku heke ew bi leztir mesrefên dewletê kêm neke, ew ê vê notê ji hêza super a amerîkî bistîne.

Sê salan civînên G-20ê yên ku armanca wan çêkirina "*semfonîyeke nû ya cîhanî*" bû, sîstemek parast ku lîberalkirina bankeyan, prîmên weke yên firewnan yên dahîyên piçûk ên "vedîtinên nû yên malî" û mesrefên tevahîya karesatên ew dibin sedem jî bi welatîyên bacê didin û bi dewletan didin dayîn (*gotara li ser Îzlandayê bixwîne*). Sosyalîstên fransî aciz dibin ji ber ku "*salên piştî krîza kredîyên subpriman* [nota wergêr: kredîyên piçûk ên bankeyan, kredîyên ji bo kirîna xanîyan û deynên kartên kredîyan], *hikûmetan ji yê ku li tevahîya dunyayê di nav nîv sedsalê de ji bo alîkarîya welatên xizan xerc kir, bêhtir pere dan destekkirina banka û sazîyên malî!*" (3) Lê belê dermanên ku ew didin pêş, geh dişibin pîneyan (ji bo bankeyan % 15 baca zêdekirî), geh dişibin daxwazên nemumkin, (nehiştina bihuştên malî [nota wergêr: Welat û deverên bac li wan nayê dayîn yan jî kêm e], avakirina ajanseke notdayîna qada dewletê, backirina veguheztinên malî), lewra pêkanîna wan girêdayî "*çalakîyeke hevdeng a wan dewletan e ku endamên Yekîtîya Ewropayê ne*" û kirineke bi vî rengî jî pir kêm muhtemel e.

Bi vî rengî ya ku diviyabû bibe "krîza ji hedê xwe zêde [nota wergêr: Serokkomarê Fransayê Sarkozy ev peyv piştî krîzê bi kar anîbû û îşaret bi birêkûpêkkirineke ji nû ve ya cidî ya bankeyan kiribû] ", bû krîzeke ji bo ne tu tiştî. Şêwirmendê sereke yê China Banking Regulatory Commission Andrew Cheng îşaret pê dike ku sedema vê pasîfbûnê "*pirsgirêkeke dîlgirtina*" dewletan ji alîyê pergala wan a malî ve ye. (4) Ango berpirsiyarên siyasî gelek caran weke marîyonetan tevdigerin, marîyonetên ku berîya her tiştî fikar û mitaleyan dikin ku ziyafeta bankevanan aciz nekin, lê nebin bar.


1 IMF, Rapora li ser îstîqrara malî li dinyayê, nîsana 2011ê

2 Jeff Madrick ji ber girtiye, "The Wall Street Leviathan", *The New York Review of Books*, New York, 28ê nîsana 2011ê

3 Projeya Sosyalîst 2012. Pêveka *L'hebdo des socialistes*, hejmar 610, 16ê nîsana 2011ê

4 *In* James Saft, "Big Winners in crises: The Banks (Yên di krîzan de gelekî bi ser dikevin)", *International Herald Tribune,* 13ê nîsana 2011ê

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



MÎRÊ HÊKAN: **Bêna azadîyê,** (1993) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê, 120 x 60 x 14 cm

**Le Monde diplomatique kurdî**
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**

Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

**Lijneya Weşanê**
Murad Satik
Riza Dînç

**Le Monde diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

**Alîkarên vê hejmarê**
Yado Ciwan
Semra Polat
Ergün Yetkiner
Celîl Kaya
Nedîm Baran

**Revîzyona Wergeran**
Luqman Guldivê
Simko Destan

**Berpirsê Hunerî**
Hasan Huseyîn Deveci

**Designer**
Fabio Biasio

**Web Developer**
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

**Abonetiya Salane:**
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

**Le Monde diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêveberê giştî**
Serge Halimi

**Serniviskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Serniviskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Birêveberê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

# Siyaseta kurd û raperîna sîvîl (Dewama rûpela 1.)


gelek girîngî didin hilbijartinên 12ê hezîranê, dixwazin alîgirên xwe ji bo hilbijartinan amade bikin. Hilbijartinên 12ê hezîranê ji bo BDPyê herî kêm ji du alîyan ve giring in. Diyar e ku piştî hilbijartinê cîyê sereke di rojeva parlamentoya nû de dê gengêşeyên li ser zagona bingehîn bigirin; di vî warî de ji bo ku BDP xwedîya tesîreke xurt be, berîya hertiştî divê encameke baş ji van hilbijartinan bi dest bixe. Bi heman awayî herçiqas niha hatibe nedîtbar kirin jî, bi îhtimaleke mezin dê piştî hilbijartinê vebûneka kurd (Kürt açılımı) ya di 2009ê de dest pê kiribû, dîsa bê holê û nemaze ji bo di pirsa çekberdana PKKê de xwedî gotin be, pêwîstîya BDPyê bi encameke ji hilbijartinên 2007ê çêtir heye. Eger ev nebe û BDP di hilbijartinên 12ê hezîranê de encamên ji hilbijartinên 2007ê xirabtir bi dest bixe, dê întibayek derbiçe, qey siyaseta "bi reformên qels halkirina pirsa kurd" ku demek e AKP ketiye pey mîna qebûl dibine, derbas bibe. Evê bê maneya ku BDP li dijî reqîba xwe ya herî mezin AK Partî têkçûneke tund wergirtibe. Dîsa BDPyeke ji 2007 lawaztir ne mimkun e ku di gengêşeyên zagoneke bingehîn a nû de bi tesîr be. Bi kurtî, sedema yekem a maqûl ya kampanyaya raperîna sîvîl, rêlibergirtina jîndewarîya wan îhtimalan û wergirtina encameke baş ya hilbijartinan, divê girseyên kurd ji hilbijartinê re bên amade kirin.

Sedemeke din a texmînî ya destpêkirina kampanyaya raperîna sîvîl; dibe ku berîya hilbijartinê lawazîya siyaseta AK Partî derbarê vebûneka kurd, şanîdana hilbijêrên kurd be. Perwerdeya zimanê dayikê, serbestberdana girtîyên doza KCK û rakirina sînorê sedî 10 ya hilbijartinê ku bi kampanyayê re tên ziman, berîya hilbijirtinê derbarê şanîdana dûrbûna AK Partî ji van daxwazên gelek maqûl ji bo BDPyê wek malzemeyeke bikêrhatî dixuyê. Bi gotineke din wisa dixuyê, BDP û DTK fikirîne ku kampanyaya raperîna sîvîl ji bo teşhîrkirina lawazîya siyaseta AK Partî di derbarê pirsa kurd de dikare bikêrhatî be. Gava mirov bifikire ku li bajarên kurdan yekane reqîba BDPyê AK Partî ye, siyaseta vebûneka kurd ya AK Partî ku di pirsa kurd de ne ewqas kûr e, teşhîrkirina wê jî, ji alîyê BDP ve maqûl dixuyê.

Armanceke din ya destpêkirina kampanyaya raperîna sîvîl ku texmînî dê piştî hilbijartinê jî dewam bike, bikare li ser siyaseta vebûneka kurd ku li ser bingeha çekberdana PKKê avabar dixuyê, fişardar be. Vebûneka kurd ku di 2009ê de dest pê kiriye, demek e li pişt derîyan tê meşandin, di bingeha xwe de bûye pêvajoya hevdîtinên Öcalan û dewletê. Bi kampanyaya raperîna sîvîl dibe ku him ji bo hêzdarîya Öcalan him jî, texmînî di rewşa neserkeftina vebûneka kurd de dixwazin li ser bûyerên muhtemel biqewimin îşaretan bidin dewlêtê.

Sedemeke din ya derveyî hilbijartinên nêzîk ya kampanyaya raperîna sîvîl ku di vê deme de pêk tê, dibe ku pêvajoya siyasî ya wek "bihara ereb" tê bi nav kirin be. Wiha diyar dibe ku siyaseta kurd bajarên Amed bi Qahîre û paytextên ereb yên mazûbanîya rejîmên otoriter dikin, tîne ber hev, hewl dide girseyên kurd serxwet bike ku ew jî dikarin di pirsa kurd de bi pêşanderîyên girseyî û bi şewazên wisa dikarin statukoyê biguhirînin. Dîsa kampanyaya raperîna sîvîl bi danberheva şekle "Tahrir" ve meşandin dikare vê daxwazê ji raya navnetewî re bîne ziman ku di navbera hikumet/dewleta tirk û girseyên kurd de bîyanîbûneke zordest wek yên rejîmên Rojhilata Navîn heye.

Welhasil di pişt destpêkirina kampanyayeke raperîna sîvîl ya siyaseta kurd de, berîya hilbijartinê ji ragêşîyê bêtir gelek sedem hene ku dixuyên. Diyar e ku gelek hesabên cidî yên siyaseta kurd yên piştî hilbijartinê hene; mîna bitesîrbûna dîtinên li ser zagona nû û vebûneka kurd, teşhîrkirina lawazîya vebûneka kurd ya AK Partî û hîn zêdetir balkişandina raya giştî ya navnetewî ser pirsa kurd.



Mîrê Hêkan: **Firçeya qedexe**, (1994) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê, 120 x 60 x 15 cm

## Gelo raperîn sîvîl e?

Pirsa yan jî gengêşeya duyem ya giring li ser siyaseta kurd ku çalakîyên kampanyaya raperîna sîvîl mîna girtina rêyan, vedana konan li meydanan û limêjnekirina li pişt meleyên ku karmendên dewletê ne ev e, gelo ev kampanya bi rastî jî sîvîl e yan na. Li gor hin şirovekaran ji ber ku di van çalakîyan de carcaran pevçûn di navbera çalakvan û hêzên ewlekarîyê de çêdibin ku tê de birêvebirên BDP û DTKyê jî hene, ev kampanya ne kampanyayeke raperîna sîvîl ya rasteqîn e. Pevçûnên dema çalakîyan hin gumanên biheq derdixînin pêş ka ev kampanya bi rastî jî kampanyayeke raperîna sîvîl e yan na. Lê sebaret medyaya alîgira desthilatdarîyê van ragêşîyan bi taybetî mezin dike, loma mirov dikare bibêje ev kampanya qet ne kampanyayeke raperîna sîvîl e, ya rastî ez bi xwe ne ewle me.

Ji bo ku em bizanin ev kampanyaya navê wê derbas dibe kampanyayeke raperîna sîvîl e yan na, di derbarê raperîna sîvîl de nêrîna lîteratûra navnetewî dikare bi kêrî me bê. Lîteratûra navnetewî ya halîhazir, eger zagon bê şîdet bê binpêkirin û kesên zagonê bin pê dikin amade ne ku encamên vê binpêkirinê bipejirînin, çalakîyên wiha wek raperîna sîvîl bi nav dike. Bi vê nêrînê zehmet e mirov bibêje ku kampanyaya siyaseta kurd bi giştî raperîna sîvîl e. Kampanya bi hin beşên xwe li gor raperîna sîvîl dilive, di hin beşên xwe de jî, derveyî raperîna sîvîl e.

Berîya ku mirov livgerîya guhêrbar ya kampanyayê salix bide, divê vê yekê bibêje: Kampanya dêvla ku xwe rasterast bide ser çalakîyên qedexeyeke heyî, balê dikişîne ser daxwazên gelemperî yê xwepêşandana girseyî ya li ser perwerdeya kurdî û benda hilbijartinê ku jixwe di çarçoveya pirsa kurd de tên ziman. Bi vê maneyê eger binpêkirinek hebe, ew jî, ji dijberîya zagonên ku van daxwazan bin pê dikin zêdetir, binpêkirina zagona civîn û xwepêşandanê ye.

Em bên ser boçûna guhêrbar ya kampanyayê… Di dema kampanyayê de, çalakîya li derveyî mizgeftê û li pişt meleyên sîvîl limêja inê kirin, bêşik çalakîyeke raperîna sîvîl a rasteqîn e. Bi vê çalakîyê wek çapemenîya kevneparêz îdia dike, tevgera kurd ji kurdan re nabêje limêj nekin, dibêje, li pişt îmamên ku ji alîyê dewletê hatine wezîfedar kirin, limêj nekin. Çalakîya limêja inê ya sîvîl ku bi armanca têkilîya girseyên kurd û dewletê qels bike, wek çalakîyeke aştîyane di çarçoveya mînaka raperîna sîvîl de ye. Çalakîya neşandina zarokan ya dibistanên seretayî ku merasîma sondxwarinê bi wan didin kirin jî, dikare di nav vê çarçoveyê de bê nirxandin. Ji alîyê din dema kampanyayê carna li hember şîdeta polêz hin çalakvan jî bi şîdetê bersiv didin ku divê bê pejirandin ev rewş bi temamî li derveyê paradigmaya raperîna sîvîl in.

Him boçûna kampanyayê ya wiha xilexwarî him jî, ji binpêkirina zagonekê bêtir hin daxwazên mafî bi rêya xwepêşandanên girseyî şanî dan, vê yeke dide xuya kirin: Kampanyaya raperîna sîvîl ya siyaseta kurd ji kampanyayeke raperîna sîvîl ya li gor qaîdeyan bêtir, çalakîyeke din a sêyemîn e di navbera çalakîyên leşkerî yên PKKyê û çalakîyên siyasî yên zagonî yên BDPyê de. Wiha dixuyê ku dê di demen pêş me de BDP û DTK giranî bidin vê şewazê sêyemîn ya çalakîyê û bi vî awayî zorê bidin guhertina siyaseta Tirkiyeyê. Derketina pêş ya siyaseta şewazê sêyemîn ji du alîyan girîng e. Yekem, ev rewş enerjîya berxwedana kurdan di bingeha xwe ve êdî ji mîlîtanên PKKyê yên li serê çîyayan zêdetir yan jî, li tenişta wan ji hejarên kurd yên komî bajaran bûne, tê. Duyemin, ev şewazê sêyem siyaset ji bizavên zagonî yên BDPyê bêtir zor dide û ihtîmala ji çalakîyên PKK yên leşkeri hîn revatirbûn dikare bêtir bi kêrî xirakirina statukoya pirsa kurd bê.

Ji 24ê adarê vir ve ye ku siyaseta kurd kampanyaya raperîna sîvîl dimeşîne, ev nîşaneya bilindbûna çalakîyeke şewazê sêyem e û vê yeke şanî dide: Pirsa girîng ya kampanyaya binavkirî ne ew e ku ka kampanya di rastîyê de sîvîl e yan na. Pirsa hîn girîngtir ev e: Di bin sernivîsa raperîna sîvîl de, li tenişta çalakîyên raperîna sîvîl ya rasteqîn, siyaseta kurd dixwaze şewazekî sêyemîn bi cî bike, bêyî ku dest ji kapasîteya siyaseta zagonî û bizavên leşkerî yên zorbar jî berde. Pirsa bingehîn di kampanyayê de ji sîvîlbûn û nebûna wê wêdetir bi daxwaza siyaseta kurd ya pergalên zagonî, sîvîl û leşkerî hemû bi kar bîne û bi vê yekê siyaset bike ve elaqedar e. Pirsa bingehîn çalakîyên di bin navê raperîna sîvîl de çalakîyên ne sîvîl jî tê de cî digirin, zêdetir ev e ku siyaseta kurd hîn bi temamî ji çek û şîdetê pak nebûye.

Ji alîyê din ve jî zêde mimkun naxuyê ku di demeke kin de ev rewş bê guhertin. Siyaseta kurd ji bo guhertina statukoya heyî di pirsa kurd de, dê hîn demeke din siyaseta zagonî, bizavên leşkeri û zorbarîya hêzên girseyan bi hev re bi kar bîne.

* Profesorê sosyolojîyê ya Zanîngeha Istanbul-Şehir

Wergera ji tirkî: Hüseyin Kartal

---

## Wênesazê vê hejmarê



# Cemal Abdo: Mîrê Hêkan

Cemal Abdo, di sala 1961ê de li Kurdistana başûrê rojava li Derbêsiyê ji dayîk bûye. Jiyana xwe heta dawîya dibistana navendî li ser sinor derbas kirîye. Loma jî, ew jiyana parçe parçe tesîrek mezin li wî kirîye û di heman demêde jî, bûye çavkanîyek herî dewlemend ji bo pêşeroja wî.

Jiyana wî li ser sînor derbasbûye. Ew bûye govanê evîna Mem û Zînê, ew bûye mêvanê Cîgerxwîn û ew bûye govanê jiyana parçe parçe. Belê, mijar hunermendê nûjen, hunermendê xwedî ramana azad, xwedî hestên ji kûrahîya ax a welat, Cemal Abdo an jî Mîrê Hêka ye.

Piştî qedandina perwerdeya dibistana navîn, di destpêka sala 1981ê de di nozdeh salîya xwe de koçber dibe û diçe Almanyayê. Li Almanyayê, di Zanîngeha Aachenê de beşa tabloya şanoyê dixwîne û di heman demê de bi hinek derhêneran re dixebite û herweha di şanoyan de berhemên xwe jî pêşkeş dike.

Cemal Abdo di tabloyên xwe de, hêkên rengûreng bi kar tîne û mijarên tabloyên wî jî; jîyan e, jiyana mîrovatîyê ye, jîyana parçe parçe ye, axîn e, bêrî ya welat e, bêbextî ye û zor û zordestî ye. Bi kurtahî naverokên berhemên Cemal Abdo; serîhildana li dijî têlên li ser sînor yên nîşana bêbextî û zordestî yê ne.

Cemal Abdo, bi rengan, bi sazman û bi materiyalên cûrbicûr, tabloyên cîhanê bi şêweyek nûjen çêdike û dide ber çavên mîrova.

Cemal Abdo, bi taybetmendîyên şêweya zimanê xwe û bi gengazîyên xwe yên mezin, bala mîrov dikişîne ser xwe û mîrov dixe nava hestên cuda!

Cemal Abdo, tiştên herî balkêş yên ji dîroka cîhanê derdixe berçavan.

Cemal Abdo, bi şanoyên xwe, bi dekorên xwe, bi dansên xwe, bi axaftinên xwe yên rûşane û bi tabloyên xwe yên rengûreng; taybetmendî ya xwe û hunera xwe derdixe holê û dide ber çavên mîrovan.

Cemal Abdo çawa dest bi vê hunerê kiriye?

Cemal Abdo weha dibêje: "Gava ku ez li Kurdistanê hê zarok bûm, ji berê de min ji resman û ji şanoyê hez dikir. Berê wexta ku hê ez li gund bûm em feqîr bûn. Ez gelek caran diçûm kadînê û min ji dayîka xwe re hêk dianî. Ji xwe wê çaxê min hêk naskirin û ji xwe ev jî bû sedem ku min ev huner afirand. Gava mirov, tiştekî ji zarokî ya xwe nas bike, mezin bibejî ji bîr nake".

Çima hêk?

Li gor nêrîna Abdo: "Hêk nîşana bûnê ye, nîşana nûhbûnê ye, ji xwe jiyan jî weke hêkê ye".

Cemal Abdo dibêje: Min dît ku her hunermendek hunerek bi kar tîne, min jî xwest ku, ez bibim xwedî hunerek ku hê nehatîye afirandin.

Ji bo ku mirov Cemal Abdo baş nas bike, divê mirov li wî temaşeke û guh bide wî. Cemal Abdo bi malpera xwe www.mirhek.com ê de bi zimanê îngilîzî, almani û kurdî xwe bi xwendevanan dide naskirin. Lê ji xwe ne hewceye ku ew xwe bide nas kirin, lewra bi hunera xwe ya nûjen, ji xwe hertim di rojeva ewropîyan de ye.

Divê ji herkesî bêtir em kurd xwedî li hunermendê nûjen Cemal Abdo derkevin û qedir bidin wî û hunera wî.

# Hilbijartinên giştî û yekîtîya neteweyî ya kurdan (Dewama rûpela 1)

## AKP û MHP: Reqîbên herî dijwar

Di van hilbijartinan de reqîba herî dijwar a MHPyê dê AKP be, ku hewlê bide ku wê li jêrî benda ji sedî dehê bihêle. Stratejîya esasî ya AKPyê ew e ku MHPyê li jêr bendê bihêle û piranîya li meclisê bi dest bixe. Anket niha MHPyê hinekî li ser % 10ê nîşan didin. Anku MHP li ser sînor e. Heger ev partî li jêr benda ji sedî deh bimîne, AKP dê bibe xwedî zêdeyî 400 wekîlan.

Sedema ku kir AKP li dû dengên neteweperest here, encamên referandûmê bûn, ku tê de guhertinên girîng ên destûra 12ê îlonê hebûn. Dihat hesab kirin ku girseya AKPyê dora % 40- 45 e, lê belê di referandûma destûrê de % 58ê dengên erê derketin. Herçend MHPyê gotibû 'na' jî nemaze li hin herêmên Anatolyaya Navîn û Deryaya Reş rêjeya dengên 'erê' gihîştin % 75ê. Lê ev der, ew herêm bûn ku şerê li dij kurdan herî zêde lê bandor kiribû û gelek cenazeyên leşkeran diçûn wê herêmê. Ji ber ku MHPyê li dij guhertina destûra 12ê îlonê gotibû 'na' ev yek ji bo wan "ulkucuyan" ( "îdeal, nimûneya bîqisûr" ji endam, alîgir û mîlîtanên MHPyê re tê gotin), ku bixwe ji 12ê îlonê zirar dîtibûn, wekî hêjayî bawerîyê nehat dîtin û hinan ji vê girseyê di referandûmê de gotin erê.

Wateya vê yekê ji wateya gotina erê ya di referandûmê de bêhtir bû. Ji ber ku weha xuya dikir ku propagandaya MHPyê, ku digot pêvajoya pêşîlêvekirinê (mebest jê "siyaseta vebûnê" ya AKPyê ye) dê welêt parçe bike û AKP digel Öcalan di nav dîyalogê de ye û digel wî hevkarîyê dike, encam nedabû. Ji ber ku li wan herêman, ku dengên neteweperest lê zêde ne, dengê erê gelek pir derketin, ev yek weha hat şirove kirin ku êdî ev dengdarên neteweperest, ku ji bêçareserîya pirsgirêka kurd zirara herî mezin dîtibûn, li çareserîyekê digerin.

## MHPya ku li derveyî meclisê bimîne, dikare here ser xeteke mîlîter û ergenekonî

Serokwezîr Erdoğan, ku girîngîya encamên referandûmê dîtibû, niha berê xwe dide girseya MHPyê û ji bo partîya xwe deng dixwaze. Herweha tê meraq kirin ka ev girseya neteweperest dê bersiveke çawa bide vê lîstoka siyasetê ya Erdoğan. Ev alîyekî rûyê madalyonê ye, lê belê alîyekî din ê madalyonê jî heye. Encam çi dibe bila bibe, dibe ku berdêla hewldana AKPyê, ku MHPyê li jêr bendê bihêle, berdêleke giran be. MHPya ku li derveyî meclisê bimîne, dikare xwe bikişîne ser xetekî mîlîter û ergenekonî û hetta dikare dawî li siyaseta Bahçeli were, ku bi enyad rê nade ku Ergenekon bikeve partîyê. Lê belê jê girantir ew be ku AKP, ku îddîa dike ku di xeteke muhafazakar-demokrat de dimeşe, nêzî neteweperestîyê bibe û xwe di nav siyaseteke neteweperest de bibîne. Nîşaneyên vê yekê jî ne ku tunene.

Serokwezîr dibêje êdî pirsgirêka kurd nemaye û ji ber ku bi zimanekî, ku kêfa neteweperestên tirk jê re tê, bang li ewropîyan dike, anku 'bi zimanekî ku ew (ewropî) pê fêm dikin', pesnê xwe dide û weha xuya dike ku pêşengên siyasetmedar ên partîyê her ku diçe girîngîyê didin referansên neteweperest. Şiroveyên girîng jî hene ku Erdoğan dixwaze 4 salên din welêt bi rê ve bibe û paşê jî derkeve Çankayayê. Di her du hilbijartinên meclisê de, ku Erdoğan tê de beşdar bibû, bi serkeftî derket.

## Xuya ye grafîka serkeftinê ya AKPê dê berdewam bike

Grafîka serkeftinê ku AKPyê ji hilbijartinên 2002ê ve bi dest xistiye, weha xuya dike ku di van hilbijartinan de jî dê berdewam bike. Hilbijartinên 2002yê weha ketin dîrokê ku tê de siyaseta li Tirkiyeyê ji nû ve hat dîzayn kirin û têkilîya siyasî ya çep û rastên navendî, ku digel civaka kurd danîbûn, hatibû wê merheleyê ku dawî lê were.

AKP ew partî ye ku ji jihevketina siyasî maye, ku piştî anîna Öcalan a Tirkiyeyê dest pê kiribû. Partîyên din ji ber ku tu alternatîfên çareserîyê pêşniyar nekirin û di navbera xwe û kemalîzmê de tu mesafe dananîn, tabelayên xwe yên li wan deveran, ku lê dengdarên kurd zêde ne, yek bi yek daxistin. AKPyê jî nemaze di 2007ê de konsepta derbarê daxwazên ji bo guhertinê baş nirxand. AKPyê dengên xwe ne tenê li Kurdistanê, lê herweha li bajarên Mersin û Stenbolê, ku kurd lê gelek zêde ne, bilind kirin. Lê belê ev tablo di hilbijartinên 2009ê de bi leha BDP guherî.

Di van çar salan de AKPyê têkilîya wekîlên xwe yên kurd ên digel dengdarên wan pirsîyar nekir. Yan jî raya giştî pirsîyarkirineke aşkere nedît.

AKPyê, him li ser navê reqabetê, him jî bi şêwazekî qure bi 75 wekîlên xwe yên 'bi eslê xwe kurd' pesnê xwe da. Lê belê ebdekî Xwedê derneket, nepirsî ka madem ku ev wekîl kurdan temsîl dikin, ji bilî çend kesan, çima derbarê pirsgirêka kurd de, ku girîngtirîn pirsgirêka Tirkiyeyê ye, ewqas bêdeng in. Niha jî demeke kurt berîya hilbijartinan derxistina van wekîlan ji enîya hilbijartinê çiqas rast e gelo? Ji bilî wezîr Mehdi Eker tu kesê ku li vîtrînan bûn, nedikaribûn bikevin lîsteyan.

## Sala 2023 û rewşa kurdan

Em di sala 2011ê de ne, ji 2023ê re hîna 12 sal hene. Serokwezîr, ku ji bo hilbijartinên du mehên din daxuyanîyek weşand, sala 2023ê, an ku sedemîn salvegera damezirandina komarê wekî armanc nîşan da. Wî got 'em populîzmê nakin, bi tenê soza wan tiştan didin ku em dikarin encam bidin.' Di 2023ê de komar dikeve sed salîya xwe. Serokwezîr ev tarîx nîşan da û ev yek herweha derfetê dide ku bi encamên komarê re bikevin nav hesabkirinê û rû bi rû hatinê. Piştî sedsaleke dûr û dirêj kurd û tirk dê bi hev re komareke demokratîk pîroz bikin yan jî em dê şahidîya pêvajoyekê bikin ku di dawîya wê de jêcudabûneke herî mezin a sedsalê pêk were.

Nûçeyên ku 'psîkolojîyên neteweyî' bera hev du didin, têrê dikin ku mirov fêm bike ka em di arefeyeke çawa de ne. Ka werin em bi hev re li nûçeyên rojane yên malpereke kurdî binêrin:

"Bombeyên TSKê jîyana Baran tarî kir"
"Bombeya rondikrêj a polîsan Elîfa du salî bi giranî birîndar kir"
"Li Dêrsîmê di navbera HPG û TSKê de pevçûn"
"Li Nisebînê bombeya dengî avêtin qeymeqamtîyê, li Stenbolê jî avahîya AKPyê"
"Leşkerkêşîya ser xeta sînor"
"Li Hekarîyê tîmên taybet gundîyek birîndar kir"
"Ruhê Omer Muxtar li Kurdistanê digere"
"Artêşa tirk herêmên sivîlan ji xwe re kir qada talîma çekan"
"Bi deh hezaran gerîlayê HPGyê Mazlûm bi rê kir" (Di nûçeyê de tê diyar kirin ku Mazlûm Arcagök, ku ji bo protestokirina komploya 15ê sibatê li bakurê Îraqê agir berdabû bedena xwe, li Dîyarbekirê li kêleka gora Vedat Aydın hatiye veşartin.)
"Di hefteya pîroz a ji dayîkbûna Pêxember de ji bo endamê PKKê Rauf Akbay, ku di 1985ê de hatibû kuştin, mewlîd hat dayîn"
"Yek ji wan sê zarokan, ku di teqînê de birîndar bûbûn, milê xwe wenda kir"
"Gülten Kışanak got yekîtîya neteweyî mebesta me ya hevbeş e"
"Dayîkên Şemîyê: Bêyî ku rû bi rû hatin nebe aştî pêk nayê"
"Dayîka Aştîyê, ku sê kurên wê gerîla ne, li Qendîlê bi merasîmeke leşkerî hat defin kirin"
"111 gerîla, ku perwerdehîyên xwe yên li cem Fermandarîya Akademîyên Apollon a Hêzên Parastina Gel (HPG) qedandin, bi merasîmeke leşkerî bawernameyên xwe stendin"
.......

Dibe ku bi ya we ne rast be ku ev nûçe weha hatine dayîn, lê belê mirov ne dikare rastîya ku ev nûçe radixin ber çavan tune bihesibîne, ne jî li hember daxwazên wan hevwelatîyan, ku li qismekê welatê we dijîn û psîkolojîya neteweyî ya ji ber van nûçeyan peyda dibin di hinavên xwe de dijîn, xwe ker û kor bikin û pîrozbahîya sedsalîyê bikin. Li pêşîya Tirkiyeyê de salek heye, ku dê bi du psîkolojîya neteweyî û siyasetê derbas bibin. Li cem xelk jihevcudabûneke ciddî tên jiyîn.
Di nav 12 salan de, ev cudabûna ku em îro dijîn, yan dê biqede û komar dê wekî komareke demokratîk bikeve sed salîya xwe, yan jî ev komar dê bêyî kurdan riya xwe berdewam bike. Di vê merheleyê de helbet girîng e ku BDP û PKK daku pêbawerîyê pêk bînin, hin gavan biavêjin, lê belê li alîyê din ew yek wezîfeya partîyên sîyasî ye, ku li seranserî welêt xwedî hêz in; ji bo avakirina pêvajoyeke weha hewlê bidin, ku tê de civaka tirk bikaribe mafên kurdan nîqaş bike û rêzê li van mafan bigire.



MÎRÊ HÊKAN: **Deşta qedexe**, (2000) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê, 125 x 60 x 19 cm

www.arsivakurdi.org

Di vî warî de AKPyê hin kar encam dan, û nabe ku werin piçûk dîtin. AKPyê hişt ku nasnameya kurdî li cem civaka tirk were rojevê, were nîqaş kirin. Ji bilî qismeke nîjadperest êdî îro li cem tirkan him nasnameya kurdî him jî nirxên bi ser vê nasnameyê tên nîqaş kirin. Ev nîqaş weha tê bi rê ve birin ka ev nirx di çarçoveyeke qanûnî de dê çawa werin diyar kirin, bi kurtasî statuya siyasî û ya çandî ya kurdan di şert û mercên Tirkiyeyê de dê avabûneke çawa derxe pêş.

## AKP nikare bi pêngava 'neteweyî' ya BDPyê re bikeve pêşbirkê

Têkilîyên digel kurdên bakurê Îraqê, piştgirîya dengdarên kurd a ji bo wan, pêşketinên aborî yên li herêmê, pêngavên ku di qada çandî de tên avêtin, zêdebûna hecma bazirganîyê, ku ser Xabûrê re dewam dike, zîndebûna ku GAPê li hêrêma pêk anî, bi kurtasî têkilîyên nû yên AKPyê, ku ji hilbijartinên 2002ê ve digel civaka kurdî tê ava kirin, di çend salên dawî de ket serdema fetretê.

Dema ku ev hemû bên bi bîr anîn, bawer dikim siyaseta ku AKP dişopîne, nikare bi tenê li ser lîsteyên namzetan re were fêm kirin. AKP ne di wê rewşê de ye ku digel pêngava 'neteweyî' ya BDPyê re bikeve pêşbirkê, ku aşkere ye ku dê BDPyê hêzdartir bike. Jixwe sûda ketina pêşbazîyeke weha jî ji AKPyê re nîne.

Ji vê hêlê ve, ez bawer dikim ku di warê têkilîyên AKPyê û kurdan de meseleyên din hene ku girîngtir in ji cih girtin yan negirtina navên wekî Haşim Haşimi, Abdurrahman Kurt, Mir Dengir Fırat, ên di lîsteyan de, ku ev kes bi nasnameyên xwe yên kurdî derdikevin pêş. Ji bilî van navan bawer nakim ku AKP navine din, ku di asta BDPyê ne, li Kurdistanê bikaribe derxe pêş. Siyasetmedarên ku bikaribin bi 'sembolên neteweyî' yên wekî Hatip Dicle û Leyla Zana bikevin nav pêşbirkê nîne û jixwe feydeya pêşbirkeke weha an jî legerîne kê ji AKPyê re nîne.

Hevdem di rastîya gelekî weha de, ku xwe nêzî serkeftinê dibîne û heger serkeftinê bi dest nexe, xwedî hêz e ku dîsa dest pê bike, heger yek li qada cûn de, di navbera qadên reş û spî de mabe, û nasnameya wî ya kurdîtîyê li pêş be, siyaseta li cem raqîba tenê AKPyê ne hêsan e, herçend di rewşeke weha de, ku tê de daxwazên neteweyî berz bûne.

Bi ya min AKP ji delva wê yekê ku digel tevgera neteweyî ya kurd bikeve nav pêşbirkekê û ji bo wê jî siyasetmedarên munasib bibîne (ku heger lê bigerin jî bawer nakim peyda bikin) dixwaze bawerîya xwe bi têkilîyên siyasî û civakî bîne, ku wê digel civaka kurd danîye, û beramberîya vê bawerîyê bibîne.

## Namzedên kurd yên AKPyê

Helbet nikare were gotin ku ev yek li hemû bajaran pêk hatîye û lîste ji têkilîyên kevneşop hatiye paqij kirin, lê belê aşkere ye ku gavên girîng hatine avêtin. Ne ku hin ecêbî jî nînin. Li Mêrdînê Süleyman Çelebî nîne, ku ji malbatekê ye, ku nûnertîya cerdevanîyê û alîgirîya dewletê dike, lê belê Muammer Güler heye, ku nûnertîya sektora ewlekarîya dewletê dike. Li Şirnexê, yê ku di pêş-hilbijartinan de herî zêde deng wergirtibûn, malbata hêzdar cerdevanan mala Tataran bûn. Lê belê Dr. Emin Dindar, ku dengên herî hindik girtibûn, di rêza yekem de cih girt. Emin Dîndar, kekê Selim Dindar ê merhûm e. Selim Dindar li girtîgeha Diyarbekirê girtî bû û par jî di êrişeke bêbext de jîyana xwe ji dest da. Li Ruhayê nûnerên Îzolan û eşîrên din neketin lîsteyan. Vê yekê jî li Ruhayê hejmara serbixweyan ji nişka ve bilind kir. Ji alîyê din de jî, Doç. Dr. Zeynep Karahan ket lîsteyê; ji malbatekê tê ku li Ruhayê jê tê hez kirin.

Li vê derê divê em serpêhatîya wan kesan, ku di warê pirsgirêka kurdî de ne xwedî tu fikran bûn û yên ku bi nasnameyên xwe yên kurdî dihatin nas kirin, piştî ku di 2007ê de ji AKPyê hatin hilbijartin ka çawa bû. Li van kesayetîyan rexne hat girtin ku di pêvajoya pêşîlêvekirinê de bêdeng man. AKPyê jî him li hember dijminan û him jî li cem dostan her tim bi hejmaran wan kesan pêsnê xwe da, lê ji alîyê din de jî ji wan xwest ku bêdeng bimînin. Ji bilî du sê kesan hemûyan jî bi ya partîyê kir û bêdeng man.

## Gelo hevdîtinên digel Öcalan rehetîyê dide AKPyê?

Bi rastî wan kesan fêm nakim ku dibêjin 'Niha ji ber ku ev wekîl di lîsteyan de ne vê yekê hêz da AKPyê.' Partîyek ku jêrkî komar hat damezirandin di warê pirgirêka kurdî de devê bendavan vekiriye, ku li jêr desthilatdarîya artêşê de bûn; û kêm zêde rehetîyek daye xelk, çawa dibe hewlê didin ku bikişînin nav sînorên neteweperestîyê, divê em li ser wê nîqaşê bikin. Gelo hevdîtinên digel Öcalan rehetîyê dide wê partîyê? Gelo hesabekî weha dike û dibêje ez nûnerê wan kurdan im, ku piştgirîya BDPyê nakin, û ji min û pêve şanşekî wan nîne? An jî ji ber ku çav berdaye dengên MHPyê yên li Anatolyaya Navîn û yên CHPyê yên beravên Deryayên Reş û Spî û ji ber vê yekê fren kir? Ev pirs hemû mumkin e ku bên bîra me. Lê belê raqîbên sîyasî yên AKPyê jî vala nasekinin. Nemaze xuya dike ku di warê hevdîtinên digel Öcalan handikapên cidî derdikevin holê. Ev du hefte ne ku Öcalan nikare digel parêzerên xwe hevdîtinê pêk bîne. Selahattin Demirtaş hikûmet tewanbar kir; hewlê dide ku dîyaloga Öcalan a digel dewletê bigihîje asta muzakereyê. Lê belê herkes pê dizane ku heger îro hevdîtin digel Öcalan pêk tên ev yek encama îradeyeke sîyasî ye, ku hikûmetê nîşan daye û hewce nedîtîye ku veşêre. Hevdem, weha xuya dike ku AKP li du wî tiştî nîne ku 5-10 wekîlên ji Kurdistanê ku wenda bike û bide BDPyê. AKP hewlê dide li Deryaya Reş û Spî de pêşîya CHPyê bigire û li Anatolyaya Navîn jî dilê neteweperestan xweş bike. CHP bi bernameyeke safî li têkoşîna li dij xizanî û bêkarîyê derdikeve pêşîya me û hewlê dide ku xwe ji pirsgirêkên giştî yên demokrasîyê û mijarên azadîyê yên pirsgirêka kurdî dûr bixe. Di vê wateyê de statukoya xwe muhafaza dike û AKP jî, ku di nav partîyên siyasî de peyvdarîya yekane ya van azadîyan dike, wekî ku xwe jê dûr dixe û nêzî CHPyê dike.

## Kuçe li hev diketin, xwîn dirijîya û serokwezîr digot êdî pirsgirêka kurd nemaye

Piştî biryara vetokirina BDPyîyan a YSKyê dema ku kuçe li hev diketin, xwîn dirijîya serokwezîr digot êdî pirsgirêka kurd nemaye. Hevdem, siyaseta CHPyê ji bo hêzdarkirina bandora Ergenekonê ya li ser partîyê, dibe sedem ku CHP di warê pirgirêkên giştî yên demokrasîyê û bi giranî jî di warê pirsgirêka kurd de li hember AKPyê hîna jî qels bimîne. Herçend CHP dengên xwe hinekî zêde bike jî, heger îhtîmala Ergenekonê ya ji bo bûna partîyeke girseyî were fikirîn, vekirî tê dîtin ku CHP dê li jêr daxwazên BDPyê de, ku piştî hilbijartinan hê jî bilind bike, biperçiqe.

Heger BDP ji hilbijartinan bi hêztir derkeve, ev yek tê wê wateyê ku di warê siyasî nebûna PKKyê, girtîgeheke malxaneyî ji bo Öcalan, Xweserîya Demokratîk, perwerdehîya bi zimanê dayîkê, destûreke bê nasnameyên etnîkî de, daxwazên BDPyê hîn jî berztir bibin. Anku projeyên ku birçîtîyê li nav civaka kurdî jî holê rake na, lê belê hestên neteweyî bilind bike, dê piştî hilbijartinan rojeva siyasî dîyar bike. Lê belê pirsgirêk ev e. Gelo CHP, ku parêzarîya Ergenekonê bernade û ergenokîyan dixe lîsteyên xwe, dê bikaribe bigihîje asta van daxwazan? Niha li cem CHPyê bersiva vê pirsê nîne. 'Kurdperwer', 'oldar', 'kemalîst', 'parêzerên mafên mirovan', 'ergenekonî' ji lîsteyên vê partîyê dê bikevin meclisê. Sezgin Tanrıkulu digel Mehmet Haberal, ku ji ber Ergenekonê tê darizandin di heman partîyê de ye. Sezgin Tanrıkulu ji ber li tu bajarên kurdan, Diyarbekir jî tê de, nikaribû têra xwe deng bistendana, li Stenbolê bû namzet. Dema ku wî xwest vê rewşê îzah bike, ket nav nakokîyan. Wî got ji ber ku Stenbol mezintirîn bajarê kurdan e lewma li vê derê bûye namzet, lê belê ji ber ku parêzerê mafên mirovan e lewma jî her tim di riyan de ye. Tenya pêngava nû ya CHPyê di warê pirsgirêka kurdde ew bû ku Sezgin Tanrıkulu xist partîya xwe. Lê belê wî xwest ne li bajarê navendî yê Kurdistanê, li Diyarbekirê, lê belê li Stenbolê bibe namzed. Tê gotin ku ji ber vê meseleya Tanrıkulu CHP ji niha de dest bi ponijînê kiriye.

## Pêşnîyara namzetîyê ji hevkarîyeke hilbijartinê zêdetir, jesteke sembolîk e

Heger em werin ser mijara BDPyê, BDP wekî hilbijartinên berê, îsal jî bi namzedên serbixwe dikeve hilbijartinan. Siyaseta BDPyê digel bloka çepgir di vê hilbijartinê de jî nehat guhertin. Siyaseta kevneşop a hevgirtina digel partî û komên çepgir hat sepandin. Lê belê ji hêla din de jî ji raya giştî ya kurdan re jî peyama yekîtîya neteweyî hat dayîn. Ev hevgirtina çepgir a ku BDP ava dike, xuya dike ku di warê armanca tirkîyeyîbûnê de û herweha di warê hêzdartirkirina rûyê partîyê bo raya giştî ya tirk de îhtîmaleke gelek qels e ku bi kêr were. Mirov dikare bibêje ku pêşekîdana BDPyê ji armanceke weha zêdetir nêzîkbûna îdeolojîk e. Tercîhên ji bo Stenbol û Mêrsînê vê yekê piştrast dike. Heger mebesta wan ew bûya ku bikaribin bi berfirehî xîtabî Tirkan bikin li Stenbolê ji delêva Süreyya Önder û Ertuğrul Kürkçü dê Baskın Oran û Gencay Gürsoyê serokê Yekîtîya Bijîşkan TTB bibûna tercîhên baştir. Diyar e ku namzetên çepgir ên BDPyê ne xwedî temsîliyetê ne û şik û guman jê dikim ku bikaribin tiştekî bidin dengên kurdan.

Di van hilbijartinan de tiştekî nû jî qewimî û BDPyê teklîf bir du partîyn din ên kurdan HAK-PAR û KADEPê daku ji her yekê namzedekî/ê nîşan bide, lê belê bi tenê KADEPê got erê. Mirov dikare bibêje ku ev teklîfa namzetîyê ji hevkarîyeke hilbijartinê zêdetir, jesteke sembolîk e. Lê belê belkî KADEP û HAK-PAR li benda tiştekî bûn ku ji vê jestê mezintir bû. Weha xuya dike ku nemaze HAK-PAR dixwest ku vê teklîfa ji BDPyê wekî hevkarîya hilbijartinê ya navbera alîyên yeksan û heta wekî riya ber bi yekîtîya neteweyî bibîne û ji ber ku ev yek pêk nehat, red kiriye.

## Neteweperwerên kurd îro herî zêde ji ber nebûna siyaseteke wan a neteweyî rexne li PKKyê digirin

Ji Ehmedê Xanî û vir ve ev bi sedan sal in ku derdê yekîtîya neteweyî her tim li cem kurdan hebû. Îro jî heger siyasetmedarên kurd werin cem hev û pênc deqîqeyan li ser siyasetê biaxivin, sê deqîqeyên vê axaftinê dê li ser vê meseleya kevnar a yekîtîya neteweyî be, ku tu caran nehatiye ava kirin. Neteweperestên kurd îro herî zêde ji ber nebûna siyaseteke wan a neteweyî rexne li PKKyê digirin. Nîqaşên li ser 'Yekîtîya Demokratîk a Neteweyî' her tim wekî nîqaşên pûç tên rojevê û meraqeke dîrokî tîne hişê mirovan. Di şert û mercên îroyîn de yekîtîya neteweyî tê çi wateyê, û divê li dij kê û çawa were damezirandin? Di vê serdema gerdûnî de gelo burjuvazîyeke kurd heye, ku şerê bazara neteweyî dike û dixwaze netewe-dewletekê ava bike? An jî daxwazên neteweyî yên kurdan kêm zêde ji alîyê BDP-PKKyê ve tê parastin û heger ev partî nebin yek, têkoşîneke neteweyî, ya wekî li Filistînê, heye ku dê têk biçe? Di nîqaşên rewşenbîrên kurdan ên sebaret bi yekîtîya neteweyî de, ku li ser farzkirinan tê meşandin, bersivên van pirsan nayên dîtin. Lê belê bi ya min, jixwe him di wateya dîrokî û him jî ya civakî de gelê kurd ne di wê astê de ye, ku em van pirsan bikin û bersivên wan peyda bikin.

Li Tirkiyeyê pirsgirêkeke kurd heye, tevgereke sîyasî ya kurd jî heye, ku dixwaze ev pirsgirêk were çareser kirin û rastîya BDP-PKKyê heye, ku dînamîkên bingehîn ên sîyasî yên vê tevgerê di destê wan de ne. Enîya PKK-BDPyê wekî çînî û neteweyî xwedî hêza temsîliyetekê ye. Mirov dikare vê enîyê rexne bike -ne ku nayên rexne kirin- û dibe ku hin fikrên we yên cuda yên derbarê rabihurîyê, îro û siberojê hebin, ku kêfa we enîyê ji wan re nayê û dikare serê we bixe belayê. Lê belê heger BDP, herçend gelek dereng be jî, teklîfa wekîlîyê dibe navên wekî Şerefattin Elçi, wê demê ew yek nabe ku wekî helwêsteke mafdar were dîtin ku vê teklîfê wekî îxaneta li dij berjewendîyên neteweyî yên kurdan bibînin û wekî nakokîya siyasî binirxînin. Mirov dikare him birêz Elçî û kesên ku jê re teklîf biriye rexne bike ku wekî ku di rabihurîyê de tiştekî neqewimî be, tevdigerin. Dê baş bibûya ku di vî warî de ji raya giştî ya kurd re daxuyanîyek hatibaya dayîn.



MÎRÊ HÊKAN: **Bablîsoka şabûnê**, (1993) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê, 120 x 60 x 8 cm

## Bi ya min birêz Elçî ji xwe pêvetir tiştekî din temsîl nake

Jixwe, bi ya min birêz Elçî ji xwe pêvetir tiştekî din temsîl nake. Ne mumkin e ku ji ser Şerefattin Elçî re xwe bigihînin burjuvayên kurd, muhafazakarên kurd yan jî neteweperestên kurd. Bawer nakim ku ev kes di nav bêbiryardarîyekê de bin, yan jî li benda BDPyê ne, ku here wan bi rêk xe.

Birêz Elçî helbet di têkoşîna nasnameyî ya kurdan de xwedî rabihurîyekê ye, ku divê were bi bîr anîn û divê mirov jê şik û gumanê neke ku ev rabihurî li cem civaka kurd nirxeke sembolîk-moral derdibire. Her çend birêz Şerafettin ev bîst sal in ku hewl dida; partî ava dikirin û ji teklîfan re vekirî bû jî, BDP niha nîşan dide ku ew xwedî li van nirxên sembolîk-moral derdikeve. Divê mirov pê kêfxweş be. Ez jî vê pêşveçûnê girîng dibînim. Hevdem, ez ne di wê bawerîyê de me ku ne iyaseta kurd heger xwedî helwesteke weha ye ku piranîyê qebûl dike û rêz li yên cuda digre, divê 'pêşîlêvekirina kurd' ya BDPyê wekî destpêkekê were dîtin û mirov xwe ji nirxandinên bi mubalexe bi dûr bixe.

* Rojnamevan û Nivîskar

Wergera ji tirkî: Celîl Kaya

## LI LÎBYA Û PERAVÊN ÎVORÎYÊ MUDAXALEYÊN LEŞKERÎ

# Jêder û rêzebûyerên "hiqûqa desttêwerdanê"

ANNE-CÉCILE ROBERT

**Di nav kêmî mehekê de Rêxistina Neteweyên Yekbûyî du caran biryar da ku li hember Lîbya û Peravên Îvorîyê zorê bi kar bîne. Ev îstîsna bû ji ber ku li gor qanûna NY divê ku problem bi rêyeke aştîyane werin çareserkirin. Ev biryar li ser bingeha "wezîfeya dewletan ku xelkê sivîl biparêzin" hatiye stendin. Gelo NY "mafê mudaxeleyê" li gor kêfa dilê xwe bi kar tîne.**

Sekreterê giştî yê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY), Ban Kî-Moon, 4ê nîsanê vê daxuyanîyê dide: *"Ji bo pêşîgirtina li bikaranîna çekên giran li dijî gelê sivîl, min fermana wergirtina tedbîrên pêwist da"*. Piştî çend saetên din, li Abîdjanê, helikopterên şer ên RNYê û hêza fransî Lincorne li dijî hêzên serokê berê Laurent Gbagbo, xwe digihînin hêzên Alassan Draman Ouattara.

Li tengenavbirên biryargeha RNYê ya li New Yorkê, ev biryar hinek dibe sedemê tengezarîyê. Eger biryara (hejmar 1975) Konseya Ewlekarîyê di 30ê adara 2001ê de bi yekdengîyê jî hatibe wergirtin, karmendên rêxistinê têkildarî karîna sekreterê giştî ji bo bicihanîna "fermaneke" wisa (ya ku wê were ber destê Konseya Ewlekarîyê) gumanên xwe tînin ziman û balê dikşînin ser nezelalîya îfadeya *"tedbîrên pêwist"*. Ev îfadeya ku azadîyeke mezin dide aktorên li ser navê rêxistinê tevdigerin, dikare di heman demê de bibe çavkanîya wateyên pir dijwar û xeter jî. Karmendekî ku naxwaze navê xwe eşkere bike (1) wiha dibêje: *"Pêkanîna operasyonên xurt ên eskerî, an jî terefgirîya di şerekî sîvîl de ya rastî ne ji adet û çandeke Neweyên Yekbûyî ye. Lîbya, di pey re jî Perava Îvorîyê: Edî ev yek dest pê dike, zêde dibe"*. Karmendekî din jî van gotinan li hevokên jor zêde dike: *"Divê dandestpêkirina şerekî nebûya karûbarekî jirêzê."*

Di 1945ê de, li nav xirbeyên ku hê jî bi dûmanên şerê duyemîn ê cîhanê, avakarên RNYyê nirxekî zêde didan aştîyê. Ji ber vê yekê Peymana rêxistinê, weke prensîp, di têkilîyên navneteweyî de *"bikaranîn an jî tehdîda"* hêza eskerî qedexe dike (xal 2§4). (2) Peyman li alîyê din rêzika têkilnebûna nav karûbarên navxweyî yên dewletên serbixwe piştrast dike. (xal 7§1). Ev xal di destpêkê de ji bo ragirtina aramîya navneteweyî bû. Bi rastî jî, hêzên mezin bêdudilî bi awayekî eskerî bi bahaneyên curbecur (parastina berjewendîyên xwe yên neteweyî,tehsîla deynan, têkoşîna li dijî hegemonyaya reel an jî ya welatekî cîran, berjewendîyên bazirganî …) dest werdidan welatên bîyanî, û dema di wan re dibihurîn her cure sûc dikirin. Weke ku hiqûqzanê belçîkî Olivier Coren jî bi bîr dixe: *"Prensîpa desttêwernedanê fêkîyê têkoşîna dîrokî ye û ev têkoşîn ji alîyê dewletên herî lawaz ve hatiye meşandin. Tevahîya sedsala XIXemîn, ev welat ketine bin pençeyên dagîrkerî û emperyalîzmeke ku hewl didan bi parastina nirxên "şaristanîyê" wê rewşê îzah bikin. Bi taybetî jî, ji bo rewanîşandana operasyonên eskerî yên dewletên rojavayî li himberî Împaratorîya Osmanî, li Afrîkayê an jî li Rojhilata Dûr, argumana 'armanca însanî' gelek caran hatiye bi bîr xistin"*. (3) Têkildarî qedexeya giştî ya bi xala 2§4 hat ferz kirin, tenê du awarte hatin qebûl kirin: Xweparastina rewa (xal 51) û tedbîrên wergirtî ji alîyê Konseya Ewlekarîyê ve *"dema aştî di tehlukê de ye, û di dema livûtevgerên êrişkar de, aştî namîne "* (beş VII).

### Dadgeha Ceza ya Navneteweyî (CPI) dikare bi boneya sûcên giran (sûcên şer, sûcên li dijî mirovahîyê û sûcên tacîzkarîyê) muafiyeta dîplomatîk ya serokên dewletan ji bo demekê rake.

Di hemû rewşan de, hiqûqa RNYê berî her cure hewldana bikaranîna hêza eskerî, lêgerîna ji bo "çareserîyeke aştîyane ji bo pirsgirêkan" xwe ferz dike (beş VI) daku rê li belaya şer were girtin: Navbeynkarî, wezîfa lihevanînê, komîsyona lêkolînê, koma danûstandinê, wezîfedarkirina Dadgeha Navneteweyî ya Dadê (CIJ)… Bi vî awayî berîya Şerê Iraqê, di 1990ê de, gelek xebat û danûstandinên dîplomatîk pêk hatin. Heman rewş di sala 2011ê de ji bo Perava Îvorîyê jî rû da, lê belê ji bo Lîbyayê rewş wisa nebû. Biryara ambargoyên ne eskerî jî, dikare ji alîyê Konseya Ewlekarîyê ve bê dan, lê belê bêyî destûra navneteweyî, nabe ku biryareke wisa ti caran ji alîyê dewletekê ve were dayîn: Ambargo (Iraq), cemidandina hebûnên madî û qedexekirina gerûgeşta rêveberan (Lîbya, Peravên Îvorî …), ji alîyê rêxistina navneteweyî ve dûrxistina ji bo demekê (Lîbya ji alîyê Konseya Mafên Mirovan a RNYê ve, Perava Îvorî ji alîyê Yekîtîya Afrîkî ve di 2010an de)…

Li alîyê din, Dadgeha Ceza ya Navneteweyî (CPI), ya di 2002yê de hat saz kirin, dikare, ji bo cara pêşî, lêpirsîna serokên dewletan bike, û bi wesîleya sûcên giran (sûcên şer, sûcên li dijî mirovahîyê û sûcên tacîzkarîyê) muafiyeta wan a dîplomatîk ji bo demekê rake. Li gor parlementera ewropî û di heman demê de komîser, Emma Bonino CPI dikare risteke pêşîlêgir bilîze, bi şkandina xewnên zirxê muafiyetê, ya gunehkarên şer. (4) Eger ji pênc endamên herdemî sisêyan jê (Dewletên Yekbûyî, Çîn, Rûsya) CPI nas nekiribe jî, Konseyê dîsa jî karî Dadgehê li dijî serokê sûdanî Omer El Beşîr deyne. Tzvetan Todorov vê rewşê wiha şîrove dike: *"Pir kêm caran tê dîtin ku jîyana siyasî dakeve rewşên wisa erjeng, û ne rast e ku di navbera bêrûmetîya xemsarîyê û tofana bombebaranan de tercîhek were kirin. Tenê eger hê jî serî ve mirov bi niyeta eskerî bikeve nav livûtevgerê, mirov rêyeke wisa dide ber xwe. Nexwe ji bilî êrişên eskerî awayên din ên desttêwerdanê jî hene"*. (5)



MÎRÊ HÊKAN: **Pişkojên qada şewitandî**, (1994) Teknîkâ şexsî ya li ser tabloyê, 120 x 60 x 7 cm

### Lezûbezîya fransî

Prensîbên destnîşankirî û ecibandî di 1945ê de, aştî li cîhanê berbelav nekir, û duyemîn nîvê sedsala XXemîn bû şahida gelek şerûpevçûnên kujer. Ew prensîp li gel vê yekê jî hişmendîya ji xeterên di her cure bikaranîna hêza eskerî de hene, nîşan didin. Ji bo Corten, *"*Dadgeha Ceza ya Navneteweyî (CPI), ya di 2002yê de hat saz kirin, dikare, ji bo cara pêşî, lêpirsîna serokên dewletan bike, û bi wesîleya sûcên giran (sûcên şer, sûcên li dijî mirovahîyê û sûcên tacîzkarîyê) muafiyeta wan a dîplomatîk ji bo demekê rake.*"*. Tevî vê yekê jî ji bo rewanîşandana şer, xwedî hêz gelek caran zanîn bahaneyeke afirîner didin pêş: Îsraîlê pala xwe da îdîaya xwedêgiravî "rewabûna xweparastina pêşîlêgir" li dijî Misirê di sala 1967ê de, eynî weke wê, Amerîkayê jî heman tişt di sala 2003yê de li dijî Iraqê xist dewrê.

### Sedemên bikaranîna hêza eskerî divê pir xurt bin, û bi tenê Konseya Ewlekarîyê dikare destûrê bide tiştekî wisa

Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ji dema ava bûye heta niha, bîst û yek caran destûr daye bikaranîna tedbîrên pêşîlêgir ên eskerî –di beşa VII. de–, desttêwerdana li Koreyê ya di sala 1950yê de ji operasyoneke nimûne pêk hatiye. *(Nivîsa çarçovekirî bixwînin).* Li vir tiştê tê xwestin, bi navgînên din tamîrkirina rewşa têkçûyî ya hedefa sereke û pêkanîna rewşa aştîyê ye. Sedemên bikaranîna hêza eskerî divê pir xurt bin û bi tenê Konseya Ewlekarîyê dikare destûrê bide tiştekî wisa. Di 1990ê de ji alîyê Iraqê ve îlhaqkirina Kuweytê dibû binpêkirineke li gor tarîfa hiqûqa navneteweyî ya ku berfirehkirina xakê ya bi zora eskerî li her dewletê qedexe dike. Û tiştekî wisa weke êrişbirina berbiçav a li dijî dewleteke endama Neteweyên Yekbûyî tê hesibandin. Li gel vê yekê jî pir baş tê zanîn ku hêzên mezin yên hez dikin dest tê werdin bixwe jî ne bêpar bûn ji motîvasyona firehkirina berê xwe yê jeopolîtîk.

Ji dawîya şerê sar û vir ve, derfetên legal ên bikaranîna hêzên eskerî weke ku zêde bûbin. Herçendî prensîba "wezîfeya destwerdanê", ya hiqûqzanê îtalî Mario Bettati an jî siyasetvanê fransî Bernard Kouchner alîgirên wê bûn, ji alîyê hiqûqa navneteweyî ve nehat nasîn jî (6), desttêwerdana bi armanca însanî jî îro bi awayekî vekirî êdî bûye parçeyek ji palpiştên ku dikarin rê bidin desttêwerdanên eskerî. Berê, Konseya Ewlekarîyê pir hesas tevdigerîya ji bo ku biryara xwe ya li dijî "tehdîda li ser aştîya" navneteweyî, bide qebûl kirin. Dûre pêwistîya çûna hawara gelên bûne mexdûrên dewleta xwe (ji ber kêmasîyên wan ên li Somalîyê di 1993 û yên li Perava Îvorîyê di sala 2011ê de, an jî ji ber operasyona tund a li Lîbyayê dîsa di sala 2011ê de) bi awayekî eşkere ket nav tedbîrên hiqûqî yên dadgeha Neteweyên Yekbûyî. Di sala 1988ê de Civata Giştî ya RNYê ji bo rêxistinên derî-hikûmetan (NGO) rê vekiribû. (7) Di sala 2005ê de, Civata Giştî "wezîfeya dewletê ya parastina şênîyên sîvîl" qebûl kir; dûre, di 2006ê de, Konseya Ewlekarîyê mecbûriyetên hikûmetan ên beramberî sîvîlan di serdemên pevçûnên çekdarî de zêde kirin. (8) Bi berkinarkirina qebûlkirina wezîfeyeke giştî ya desttêwerdana ewçend şîlo û ewçend jî xeter –bilançoya herî mutewazî ya operasyonên li Bosnayê (1992) û li Somalîyê (1993) dîsa jî pêdivîya îhtiyatê dest nîşan dike–, Rêxistina Neteweyên Yekbûyî hewl dide pîvanên hê jî têra xwe nezelal yên destûrê didin livûtevgera eskerî zelal bike.

Bi xuyabûna xwe ya sade, mentiqî û rewakirî, desttêwerdana eskerî ya ji bo parastina mafên mirovan di eslê xwe de deverên tarî jî dihewîne û hertim dibe sedemê gengeşeyan. Rûsya, Çîn û Hindistan di dema dengdayîna li ser desttêwerdana li Lîbyayê de bêalî man, Almanya jî li dij derket. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bê dilê xwe di nav de cih girt. Li nav Rêxistina Peymana Atlantîk a Bakur (NATO ) a ku bi birêvebirina operasyonan hat wezîfedar kirin jî, tengezarîyê xwe da xuya kirin.. Lezûbeza serokkomarê fransî Nicolas Sarkozy bû sedem ku bi George W. Bush re pir jî ne bi pesindanî were muqeyese kirin, nexasim jî di çapemenîya brîtanî û amerîkî de. Nûnerên Hindistanê yên li cem RNYê xwestin ku *"zêdetir wext were dan, daku bikaribin projeyên biryarê* [yên destûrê didin bikaranîna darê zorê] *di ber çavan re derbas bikin, vê yekê jî wê derfet bida welatên beşdar ji bo ku nêrîna xwe ya têkildarî bikaranîna eskerên xwe eşkere bikin"*. (9)

### Bikaranîna makîneyên kujer, sedem çi dibe bila bibe, hertim ji bo mafên mirovan tê wateya têkçûnê

Dema operasyonên eskerî yên dibin sedemên mirin û birîndarbûnan rû didin, bivênevê di qada navneteweyî de jî pirsgirêk rû didin. Bikaranîna makîneyên kujer, sedem çi dibe bila bibe, hertim ji bo mafên mirovan tê wateya têkçûnê: Ji bo parastina hin sîvîlan, mirov jîyana hin sivîlên din dixe xeterê. Ji ber vê yekê gelek hiqûqnas têgeha "şerê dadwer" (ji nivîsarên Saint Augustin (10) derbasî gotara George W. Bush bû) an jî têgeha "şerê mirovî" red dikin. Komîsyona Navneteweyî dîsa herwisa, ku di sala 2000ê de tê saz kirin, têgeha *"desttêwerdana eskerî li gel armanca parastina mirovî"* tercîh dike. (11) Ev formula hinek dirêj dîsa jî bi kêr tê ji bo ku heqîqeta ku bi du rewşan re têkildar (azadîyên bingehîn û şideta çekdarî) di nav bîrbirineke reşanspî de neyê nixumandin. Li gel vê yekê jî alîkarê serokê Komîteya Navneteweyî ya Xaça-Sor, Jacques Forster tirsên xwe wiha tîne ziman: *"Tecrube nîşan dide ku dema alîkarîya mirovî bi tevgera siyasî an jî eskerî re tê tevlîhevkirin, ew ji dawîanîna li şeran bêhtir bi kêrî dirêjkirina wan tê"* (12) Tiştekî din ê ku mirov pê nerihet dibe ew e ku siyasetvan û medya vegotinên edebî sûîstîmal dikin: Ew "bombebaran" nakin, lêxistina derban bi cî tînin; ew "şer" nakin, "operasyonên eskerî" didin dest pê kirin. Dîmenên pevçûnên li Lîbyayê û li Perava Îvorîyê bi awayekî ecêb pir jî ne zêde ne li cîhaneke ku hertim bi dîmenên wisa dagîrtî ye.

## Operasyonên şêst salan

Di 1950yê de, Konseya Ewlekarîyê li Koreyê û di 1961ê de jî li Kongoyê, desteserdaneke eskerî dixe dewrê. Di 1965ê de, Konsey destûrê dide Qraliyeta-Yekbûyî li dijî Rodhesiyayê hêza eskerî bi kar bîne.

Salên 1990ê weke "dehsala cezabirînan" hatin bi nav kirin. Konseya Ewlekariyê ji alîyê dewletên ku weke dilxwaz xwe didin pêş, rê dide bikaranîna hêza eskerî: Iraq (1991), Somalî (1992), Bosna (1992), Haîtî (1994), Rwanda (1994), Albanya (1997), Zaîre-Kongo (1996), Sierra Leone (1999), Tîmora Rojhilat (1999), Kosovo (1999, muraceata îtîrazkirî), Afganistan erêkirina paşê bidestxistî ya li ser navê mafê xweparastinê), Komara Demokratîk ya Kongoyê (2005), Peravên Îvorîyê (2011), (Lîbya, 2011).



Mîrê Hêkan: **Pevçûna çandan**, (2006) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê, 60 x 97 x 9 cm

### Di operasyonên leşkerî de hertim piçek neewlehî heye

Di operasyonên leşkerî de hertim piçek neewlehî heye, qada tevgerê ya ji alîyê Konseya Ewlekarîyê ve destûra wê tê dayîn jî, dibe sedemê rûdana nakokîyan. Tirsa ji berbelavbûna bûyeran (Perava Îvorîyê) an jî tirsa ji xitimînekê (Lîbya) vê yekê piştrast dike. Damezirênerê Bijîjkên Sînornenas, Rony Brauman, der barê ya duyemîn de (13) bi awayekî gumanbar vê pirsê dike: *"Gelo di kîjan kêlîyê de ev şer wê weke şerekî serketî were hesibandin?* Moskova û Pekîn êdî wisa difikirin ku operasyonên tên meşandin, çarçoveya wezîfeya RNYê jî bin pê dikin, ew wezîfeya ku tevî ku karîbûn li ber rabin jî, li ber ranebûbûn. Operasyona li Lîbyayê ji rewşa pêkanîna şerîdeke li firîna balafiran qedexekirî, dibe ku derbasî qonaxeke din bibe û di vê qonaxê de hilweşandina rejîma Lîbyayê wê bibe hedefa operasyonê. Serokên DYA û Fransayê Barack Obama û Nicolas Sarkozy, û li gel wan serokwezîrê brîtanî David Cameron, jixwe êdî vê niyeta xwe venaşêrin jî. (14) Hal bû ku hedefeke wisa ligel Peymana Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ya ku ji bo xatirê prensîbên destwernedan û huqûqa gelan nagunce, vê opsîyonê dihêle ji biryara wan gelan bi xwe re. Herçendî Mûammer Qedafî xwedî hemû xuy û karakterên zordarekî ye, di şertûmercên kêm zelaltir de, ji bo filan an jî bêvan rêveberî herkes dikare van xuy û karakteran li ser kêfa xwe şirove bike. Hindistanê, tevî ku deng da biryara hejmar 1975, dîsa jî dest nîşan kir ku *"divê eskerên ji bo pêkanîna aştîyê bi ti awayî li Perava Diranê Fîl veneguherin amûrên guherandina rejîmê"*. "Wezîfeya parastina gelên sîvîl" gelo wê ne rûpoş û bahaneyek be ji bo "wezîfeya desttêwerdanê"?

Bi liberrabûna desttêwerdana eskerî ya li Lîbyayê, Almanyayê bal kişand ser hindikbûna agahîyên li ber destên Konseya Ewlekarîyê yên têkildarî rewşa serhildana çekdarî: Ev raperîna eşîrî ye, an jî îfadekirina têkoşîna gel a li dijî rejîmeke zordar e? Hin li himberî rewşa bi navê "sêhra çekên"dudil bûn, ku wê karîbûna bi tena serê xwe bi kêrî çareserîya pirsgirêkên siyasî bihatana. Brauman vê yekê jî wiha şîrove dike: *"Mafên mirovan ne siyasetek e û dijberîyeke pir hişk ya navbera mafên mirovan û siyaseta reel korerêyek e. Siyaseteke pir kurt heye ku ew huner e, mirov encamên daxwazên xwe jî bixwaze"*. Li gor Brauman, serhildêrên lîbyayî *"li ser karîna me ya sererastkirina rewşê li gor dilê wan, ji xwe re xeyalan çê dikin"*. Û *"serhildêr bi xwe, wê berdêla vî awayê bîrbirinê bidin"*.

### Hetta, hin "mirovhez", ên weke Kouchner jî, bê xem û tirs destekê didin livûtevgerên eskerî

Rêxistinên derî-hikûmetan (NGO) û hin kesayetî li ser "du giranî, du tedbîrên" navneteweyî dîsa bi rexnegirî diaxivin. Lîga Ereb jî ji alîyê xwe ve dixwaze ji bo Xezzeyê ku lê ji ber bombebaranên îsraîlî yên birêkûpêk kesên sîvîl tên kuştin, şerîda ji firînan re qedexekirî were îlan kirin. Bi îhtîmaleke mezin ew ê nikaribe vê daxwazê bide qebûl kirin. Konseya ewlekarîyê di eslê xwe de dadgeheke siyasî ye û bi vê pergala xwe bi awayekî kêfî destekê dide rewşên wergirtin, qebûlkirin û pêkanîna [biryaran]. Biryarên vê "kargerîya cîhanî" dibin wezîfeyên [xweferzker?] (berevajîya yên Civata Giştî) û qet nakevin ber kontroleke cidî ya hiqûqî. Bi tenê zexta medya û komeleyan dikare bibe dijgiranîyek, lê belê ev yek ji tesadufan re dimîne. Bi vî awayî gelek caran tê dîtin, eynî weke li Dewletên Yekbûyî di 2003yê de û li Fransayê jî di sala 2002yê de, ku çapemenî li ser şiverêyên şer û cengê hikûmeta xwe dişopîne, bi taybetî jî di warê pêkanîna rayeke giştî de. Di nimûneya Lîbyayê de, medya hema hema berîya reaksîyona siyasî tevgeriya. Hetta, hin "mirovhez", ên weke Kouchner jî, bê xem û tirs destekê didin livûtevgerên eskerî. Divê li vir were dest nîşan kirin ku dabeşbûna endamên berdewam dikare carna pêşî li destûrdayîna bikaranîna hêza eskerî bigire: Di 2003yê de rewşeke wisa rû da, dema ku Fransa bi desteka veşartî ya Rûsya û Çînê li dijî şerê Iraqê derket. Ji ber vê yekê, herçendî Konsey îro ketibe nav hewldana firehkirina livûtevgera xwe jî, biryarên wê dikarin bên guhertin, û Peymana Neteweyên Yekbûyî, teksta pîroz nehatibû sererast kirin, têkildarî bikaranîna hêza eskerî. Ango, desttêwerdanên eskerî yên îro di çarçoveya hiqûqeke guhêrbar de pêk tên.

### Gava pirsgirêkek xwe bide der, wê hawar ji kê were xwestin?

Gumana hiqûqeke kêfî bivênevê berbelav dibe. Di sala 1990ê de, dewletên ku bi xwespartina biryareke navneteweyî li Iraqê zor bi kar anîn, ya rastî li herêmeke stratejîk ji ramanên paşperdeyî ne bêpar bûn. Hetta, desteka eskerî ya Parîsê, ku berê deshilatdareke mêtinger bû li deverê, ji bo Hêzên Komarxwaz ên Peravên Îvorîyê (FRCI) ên Ouattara qetiyen ne dûrî pêşramanên şeşkoşeyî (fransayî) ye, ji ber ku Peravên Îvorîyê xakeke sereke ye li qada berjewendîyên fransî yên Afrîkaya Rojava. Û jixwe tê zanîn ku "fermana" ji alîyê Ban Ki-moon ve, li pey axaftineke wî ya li gel Sarkozi, hat dan. RNY eşkere dike ku ew meqamekî pir bikêrhatî ye dema ku dewletekê ji mêj ve biryara desttêwerdanê dabe û ew yekane dewleta xwedî hêza pêkanîna vê desttêwerdanê be: *"Gava pirsgirêkek xwe bide der, wê hawar ji kê were xwestin? Ji me, bêguman"*, giregirekî eskerî yê fransî wisa şirove dikir, bi şêweyekî hinekî rûşûştî û hinekî jî bi endîşe. (15) Ji zanîngeha Seville, profesor David Sanchez Rubio jî israr dike ku *"ti caran, di pêvajoya dîroka mirovahîyê ya berê û niha de, kes li livûtevgereke bi nave "destwerdana eskerî ya bi armanca mirovî" rast nehatiye, ji bo bi temamî an jî bi giranî pêşîgirtina li rewşeke binpêkirina girseyî û sîstematîk a mafên mirovan"*. (16) Pirsgirêk ji ber vê yekê wiha dikare were rave kirin: Gelo mirov dikare pergaleke hiqûqî bispêre prensîpên ku mirov pêşînen dizane ku wê li gor rewşan biguherin?

### Fikra pasîfîzmeke çalak

Hin kes wisa difikirin ku nûnerîtîyeke herî baş, bi taybetî ya erdnîgarî, ya Konseya ewlekarîyê, wê zemînên keyfiyetê berteref bike –Afrîkaya Başûr an jî Brezîlya dikarin tê de cih bigrin– (17); li gor hinên din jî, çavkanîyên van şaşîyan pala xwe didin pozîsyona dezgehî ya Konseyê. Mirov herwiha gelek caran pê diêşe ku rêveberîyeke esasî ya herdemî ku Peymana RNYê îşaret pê kiriye, ti caran pêk nehatiye, bi serûber nebûye. Li pişt van jixwepirsînan pirseke hê kûrtir bigewde dibe: Gelo nûnerîtiyeke navneteweyî ya bêlamûcîm a ku hikûmeteke cîhanî rewa bike bi rastî jî heye? Rêxistina Neteweyên Yekbûyî gelo ji bilî cîyekî pevçûnên çêker û aştîyane ku tê de nêrînên cihêreng nêzî hev bibin, dikare bibe tiştekî dîtir, û tê de bere bere normatîvîyeke nav neteweyî ya herkes jê razî, pêk bê?

### Mirov bi ti awayî nikare bibêje "rewa"ye ku dewletek gelê xwe qir bike, bi bahaneya ku her tiştê li nav sînorên wê rû dide, "karûbarên wê yên navxweyî" ne

Gelek hiqûqzan jî bawer dikin ku pêşengên wezîfeya desttêwerdanê şaşîyan dikin: Hiqûqa navneteweyî ya hemdem ti cara serwerîyeke ku kes nikaribe desteser bike, saz nekiriye. Corten bi girîngî dest nîşan dike ku *"mirov bi ti awayî nikare bibêje "rewa"ye ku dewletek gelê xwe qir bike, bi bahaneya ku her tiştê li nav sînorên wê rû dide, "karûbarên wê yên navxweyî" ne. Hemû dewletan bi awayekî fermî venasî ku ew divê rêzê li prensîbên bingehîn ên weke mafê jîyanê bigrin, rêzlêgirtina li rûmeta bedenî an jî qedexekirina qirkirinê, li himberî welatîyên wan ên li ser axa xwe dijîn. Bi "serwerî"wan biryar da li ser sozê xwe rawestin, û ji ber vê yekê bi "serwerî"divê ew rêzê ji sozên xwe re bigirin"*. (18) Pirsgirêk jî di vê rewşê de ji hiqûqî bêhtir siyasî ye.

Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, herçendî ne kafî be jî, hîmê xwe daye ser ramana pasîfizmeke çalak. Li vir eger tişta li ser tê peyivîn, were rêz kirin: Pêşvebirina çandeke hevkarîyê, dîyalogê, danûstandinê, "neçarîya civakî", ango berevajîya bîrbirina xwe dispêre hîyerarşîya hêzan, bîrbirênên ku aktoran neçarî rêzgirîya normên hevpar û " ufqîbûnê" dikin. Lê belê çiqas dilpak û saf jî xuya bikin, ev hedef rewşekê ferz dikin: Lêgerîna berdewam ya li çareserîyên ji bo pêwendîyên hêzên ku wê hê demeke dirêj ne weke "civateke " navneteweyî, lê weke "şirketekê" bimînin. Ev yek rêzgirîya serwerîya gel jî dixe dewrê, gava ku ew xwe îfade dike (hikûmeta fransî desteka xwe berdewam dike ji bo rejîmên ku bi awayekî eşkere hilbijartinên li Afrîkayê manîpule dikin) û vebûna qadeke guftugoyên hê jî piranîya caran ji alîyê hêzên mezin ên rojavayî ve tên monopolîze kirin, li rewşê zêde dibe. Bi gumana ku nêrîna wî bi qasî pêwist li ber çavan nehatibû girtin, serokê Komîsyona Yekîtîya Afrîkî, Jean Pîng, ji ber vê yekê bi redkirina çûna zîrweya Parîsê ya 19ê Adara 2011ê a der barê Lîbyayê de nerazîbûna xwe da xuya kirin. Mîna ku serkeftina WikiLeaksê jî îşaret pê dike, bêlebatîya çalak herwiha pirdengîyeke medyatîk a derfetê dide derbirîna nêrînên dijber, weke daxwazeke xurt datîne ber xwe. Ev yek herwiha awireke dîrokî ya ku rêveberên îro belkî jî dest dabin, ferz dike.

### Bikaranîna zorê bûye mode

Her çende gava bikaranîna zorê vediguheremodeyekê, divêrêziknameya RNYê bê xurt kirin jî, pêşîgirtina li pevçûnan bi rêziknameyeke aştîyane ya ji bo nakokîyan ne sînordar e (beşa VI). Çawa peyde dibin, bo nimûne, mentiqên şidetwarî yên xweber ên nîzama aborî ya cîhanê ku ji ber vê yekê welatên Başûr –erdnîgarîya ku piranîya desttêwerdanên navneteweyî li ser pêk tê– bi taybetî şeperze dibin? Aborîzan û îlahiyatvanê rizgarîyê Franz Hinkelammert li ser vê diyardeyê wiha dinivîse: *"Desttêwerdana însanî ya ku bi niyeta xwe ya rastîn hewl dide pêşî li binpêkirinên mafên mirovan bigire, ji ber rûbirûmayîna rewşên li ber sînorê elîmînekirina rasterast, xedar, girseyî û jinişkave ya jîyanên mirovî, bi tevgereke rasterast û eskerî re tê pêk anîn. Di jîyana rojane ya "asayî"de, em jixwe li nav şertûmercên elîmînasyona nerasterast, xedar, girseyî dijîn. Tenê êrişkarîya rasterast li dijî jîyana wan kesan weke rewşeke neasayî tê hesibandin, lê belê li himberî encamên nerasterast ên livûtevgerên ku bi şeklûşemalê xwe qet ne xwedî niyeta jiholêrakirina mirovan in, kes dengê xwe yê dijber bilind nake".* (19) Em bînin bîra xwe ku, li gor Rêxistina ji bo Qût û Çandinîyê ya Neteweyên Yekbûyî (FAO), di sala 2010ê de mîlyarek kes ji ber birçîbûnê şeperze bûn. Di eslê xwe de kesên xwedî hêza meşandina operasyonên eskerî li ser navê RNYê herwiha ew kes in ku pêşî li her cure reforma berfirehkirina rêzikên bazirganîya navneteweyî, an jî li venasîna jidil a mafên civakî ji bo gelên xizan ên welatên Başûr. Êdî azadî jî berhema têkilîyên aborî ye, yên ku ji serekî heta serê din ê dinyayê hatine girêdan. Li gor Rubio, *"Gava nirxê mirovan tinebe, hewldana rizgarkirina wan bi bombebaranê û/an jî bi çekên xwedî armanca însanî, dibe karûbarekî sosret"*. (20)

1 Radio France internationale, dîrokçeya saet bi saet a buhrana Perava Diranê Fîl, www.rfi.fr

2 Di sala 1928an de, peymana Briand-Kellog (Fransa – Qralîyeta Yekbûyî) şerê ku weke navgîna siyaseta neteweyî tên bikaranîn qedexe kiribû

3 Olivier Corten, "Les ambiguïtés du droit d'ingérence humanitaire [Xalên şîlo yên hiqûqa destwerdana bi armanca însanî]", *Le Courrier de l'Unesco*, juin 1999, www.aidh.org

4 Emma Bonino, "La distintas formas de intervencion", *Revista de Occidente*, Madrid, çile 2001, n° 236-237

5 Tzvetan Todorov, *Memoria del mal y tentacion del bien. Idagacion sobre el siglo 20,* Peninsula/HCS, Barcelone, 2002. *[Bîranîna xirabîyê, ceribandina qencîyê. Lêkolîn li ser sedsalê, Robert Laffont, Parîs, 2000.]*

6 Mario Bettati, *Le droit d'ingérence. Mutation de l'ordre international [Mafê desttêwerdanê. Veguherîna nîzama navneteweyî]*, Odile Jacob, Paris, 1996

7 Biryara 43/131, "Alîkarîya bi armanca însanî ji bo şeperzeyên felaketên xwezayî û rewşên lezgîn ên heman nîzamê", qebûlkirî bêyî dengdana Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî, 8 Kanûn 1988

8 Biryara 2006/267, Parastina sîvîlan di pevçûnên çekdarî de, 28 nîsan 2006

9 Konseya Ewlekarîyê, CS/10215, 30 Adar 2011

10 Saint Augustin û Thomas d'Aquin, du zanyarên katolîk ên teorîya "doza mafdar" in, a ku şer rewa nîşan dide, û cureyekî manîşeîzmê bigewde dike

11 Komîsyona navneteweyî li ser desttêwerdana û serwerîya dewletan, "Berpirsiyarîya parastinê", 2001, iciss.gc.ca/report-e.asp

12 Worldwide Faith News archives, 2000

13 *Libération*, Parîs, 21 adar 2011

14 "Divê Qedafî biçe", nivîsa li kursîyê azad ê ji alîyê *Le Figaro, Times, International Herald Tribune*, *Washington Post û Al-Hayat ve di* 15ê sibata sala 2011ê de hat weşandin

15 *Le Monde*, Parîs, 13 nîsan 2011

16 David Sanchez Rubio, "Interventions humanitaires Principes, concepts et réalités [Desttêwerdanên bi armanca însanî. Prensîb, têgeh û heqîqet]", *in Interventions humanitaires?, Alternatives Sud,* berg 11, n° 3, Louvain-la-Neuve, 2004

17 Binêrin li nivîsa François Danglin, "Pacte démocratique entre puissances du Sud [Peymana demokratîk ya navbera deshilatdarîyên Başûr]", *Le Monde diplomatique*, adar 2011

18 Olivier Corten, *çavkanîya li jor navbihurî*

19 Franz Hinkelammert, *Leben ist mehr als Kapital. Alternativen zur globalen Diktatur des Eigentums [Jîyan ji sermayeyê bêhtir e. Alternatîvên dîktatorîya global a milkiyetê]*, Publik-Forum Verlags GmbH, Oberursel, 2002

20 David Sanchez Rubio, *çavkanîya li jor navbihurî*

Wergera ji fransî: Baran Nebar

### SÎNORÊN HELWÊSTA ANTÎ-EMPERYALÎSTÎYÊ

# Çavkorîya qedera malbata Esed li Sûriyeyê

PATRICK SEALE *

**Tûnis hê divê rêzek pirsgirêkên xwe yên piştî ji textê desthilatdarîyê ketina dîktator Zeynel Abidîn Bin Elî çareser bike (li nivîsa Jean-Pierre Séréni binêre), ji destpêka nîsanê ve li gelek bajarên Sûriyê dengê qêrîneke azadîyê ya pir xurt, bilind dibe û pê re jî bangên bi biryardartir, dibin ên têkbirina desthilatdarîyê. Serokdewlet Beşar el-Esed ji bo felata xwe ya siyasî û ya rejîma bavê wî sala 1970yê damezrandî, şer dike. Gelo saeta hilweşîna xanedanîya el-Esed hat? Destwerdana eskerî ya li Deraa û bajarên din ya li dijî muxalifan îşaret pê dike ku rejîmê şidet tercîh kiriye.**

Serokdewletê Sûriyê Beşar el-Esad berê xwe dabû têkoşîna li dijî tehlûkeyên ji derve û krîzên herêmî. Wî wisa hizir dikir ku welatê wî nakeve ber wê pêla dayî ser welatên din. Di hevpeyvînekê de ya ku di *Wall Street Journalê* de 31ê çileyê hat weşandin, weke bersiva pirseke li ser liberhevgirtina Misr û Sûriyê, wî ev yek weha dida zanîn: "*Divê hûn awirê xwe yê li meselê biguherin û ji xwe bipirsin: Tevî ku şertûmercên em tê de zehmettir in, ji bo çi Sûrî bi îstîqrar e? Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê desteka malî dida Misrê, ê me bi xwe, piranîya welatên dinyayê ambargo danîne ser me (...) tevî van hemûyan jî miletê me serî hilnade. Mesele ne bi tenê pêdivî yan jî reform in. Mesele îdeolojî ye, bawerîyên we ne, doza hûn diparêzin e. Di navbera heqîqeta parastina dozekê û îdeolojîyeke pûç de cudatîyeke mezin heye*". Êdî em hew dikarin xwe bixapînin û xelkê Sûrî jî li alîyê xwe ve xwest dawîyê li girtinên keyfî, û şiddet û hovîtîya polêsan were anîn, girtîyên siyasî werin berdan, çapemenî daketin bibe, xala 8ê ya Destûra Bingehîn a ku dibêje Partîya Baasê *"dewlet û civakê"* bi rê ve dibe, were betal kirin û rewşa awarte were rakirin. Ev rewşa awarte ji dema ku Baas bûye desthilatdar û vir ve ango ji 1963ê ve di meriyetê de bû.

Hertiştî li Deraayê dest pê kir, li vî bajarê başûrê welêt ê li ser sînorê bi Urdunê re. Dema ku duzîneyek zarok bi behaneya grafîtîyên li dijî rejîmê li ser dîwaran çêkirine, meha adarê hatin girtin, alozîyê jî da der. Şênîyên bajêr ên nerazî û hêrsrabûyî daketin kolanan. Çawa ku yek ji çavdêrên herî baş ê bîyanî yê vî welatî Joshua Landis nivîsand: "*Deraa pir xizan û misilman* (sunnî) *e. Ew her tişta li Sûriyê pirsgirêkan çêdike di xwe de dihewîne: Aborîyeke îflas dike, nufûseke pir zêde dibe, walîyekî xirab û hêzên ewlekarîyê yên otorîter.*" (1) Şaşîya –ku ewqasî xirab e, dibe ku çarenûsê diyar bike– hêzên ewlekarîyê ew bû ku guleyên rastî li girseyê reşandin.

Berîya ku krîz dest pê bike, Beşar el-Esed ne xwedîyê helwêstên dîktatorekî ereb yê ji rêûresmê bû. Bi 45 salên xwe mutewazî xuya dikir û pozbilindîya wan kesên ku ji bo desthilatdarîyê ji dayik bûne jî nîşan nedida. Sala 1994ê dema ku ew li Londonê xwendekarê beşa doktorîya çavan bû, birayê wî yê jê mezintir ku ji alîyê bavê xwe Hafiz el-Esed ve weke waris hatibû dest nîşan kirin, di qezayekê de mir. Vê yekê kir ku Beşarekî bêdeng û dixwede bikeve qada siyasetê. Heta bi pêla dawî ya kuştinan, gelek welatîyên Sûriyê desteka xwe ya didan wî, dewam dikir. Wan di wî de zilamek didît ku xwende, modern bû, birêvebirekî meyildarî reforman bû, li gor yên din jî bo pêkanîna guhertinên pêwîst rewşa wî guncawtir bû.

Sala 2000ê dema ku ew kete şûna bavê xwe, Sûrî dereng mabû, ji dinyayeke her diçû bêhtir global dibû û di warê teknolojîk de bi pêş diket, qutbûyî bû. Reformên wî yên pêşî hingê malî û ticarî bûn. Li welêt sala 2004ê destûra banke û şirketên sîgortayê yên taybet hat dayîn û pênc salan paşê jî adara 2009ê me dît ku borsa jî vebû. Halê hazir, ew der barê endametîya Rêxistina Bazirganîyê ya Cîhanê (WTO) de hevdîtinan bi rê ve dibe. Desthilatdarîyê telefonên destan û Înternet xistin welêt. Wê gelek projeyên binesazîyê dan dest pê kirin; dibistan û zanîngehên taybet qat bi qat zêde bûn.

### Em ê behsa asta pir bilind a bertîlxwarinê ku ji ya Tûnisê yan jî Misrê zêdetir e jî nekin

Van reforman herweha rê li ber xirabtirbûna newekhevîyan û zêdebûna bêkarîyê jî vekir (2), jixwe em ê behsa asta pir bilind a bertîlxwarinê ku ji ya Tûnisê yan jî Misrê zêdetir e jî nekin. Ji sê paran pareke serjimara welêt di bin sînorê xizanîyê de dijî. Di heman demê de dahata ji petrolê yên jixwe kêm, êdî neman û di encama gelek hişkesalîyên li ser hev de welat ji nû ve bû îthalkerê genim.

Serokdewlet bi Tirkiyê re peymaneke siyasî û aborî girêda –vîzeya di navbera herdu welatan de rabû– ev yek bêguman bi kêrî bazirganîya herêmên li ser sînor hat û nexasim li Helebê kar anî. Navenda bajarê kevin ê Şamê hat zindî kirin, xanîyên kevin hatin restore kirin, gelek restoran û otel hatin vekirin daku pêla tûrîstan a mezin dibe, bihewînin.

Bibîranîna komkujîya li Hamayê ya sala 1982yê dema ku Hafiz el-Esed serhildaneke Birayên Misilman di nav xwînê de fetisand, weke ewrekî reş û tarî di ser vî dîmenî de li ba dikeve. Vê koma îslamî sala 1977ê dest bi rêzek êrişên terorîstî yên li dijî rejîmê kir, partîzanên wê kuştin. Kontrola bajarê Hamayê yê li navenda welêt, bi dest xist, endamên Partîya Baasê û karmendên hikûmetê kuştin. El-Esed li wan hîç nehat rehmê û destûra wan da. Weke bersivdayînê, artêşê bajar bombe kir û gelek şênîyên bajêr hatin kuştin. Em bi hejmara tam a kuştîyan nizanin, lê belê di navbera dehhezar û bîsthezaran de ye. Sih salan piştî vê bûyerê, hin îslamîst xeyal dikin ku tolê hilînin, li alîyê din alewîyên hindikayî lê belê stûnên desthilatdarîyê kontrol dikin, ditirsin heke rejîm hilweşe ew ê werin qetil kirin. Ev tansîyonên mezhebî dibe ku bangên ji bo azadîyê di nav rengê xwînê dabike.

### Xwepêşander ne bi rêk xistî ne û hê lîderek derneketiye

Xwepêşandêr di warê siyasî de xwedî dezgeh nînin û hê tu lîder derneketiye holê. Weke li welatên din ên ereb, zehmet e mirov zanibe ka muxalif kî ne, zordarîya van dehsalên dawîyê li cihê cih pir kêm struktûrên siyasî hiştin, civaka sivîl jî bi tenê çend ferd in. Ya rastî, dabeşbûna vî welatî li piranîya ereb misilman ku di nav de hindikahîyeke mezin a alewî heye (3) (qederê % 12 heta % 15ê), xirîstîyan (% 10) û em qet behsa durzî û kurdan jî nakin (4), naskirina koman hêsan nake. Bêguman tevgerên îslamî xurt in û serokdewlet bixwe bi awayê xwe ev yek qebûl kir: Di nav reformên pêşî de yên ku piştî hevdîtineke bi fîgurên dînî yên welêt re hatin kirin, destûra vegera kar a 1000 mamosteyên jin ên ku ji ber berûkê ji kar hatibûn dûrxistin û ... girtina yekana gazînoya welêt hebûn. Tevî ku lawaz bûne, Birayên Misilman dîsa jî xwedî hêzeke mezin in û me di xwepêşandanan de gelek sloganên li dijî alewîyan û hin hindikahîyan, bi taybetî jî xirîstîyanan bihîstin. Rejîm qet dudilîyê nake, û van tirs û fikaran manîpule dike.

Serokdewlet El-Esed di du axaftinên xwe yên 30ê adarê û 16ê nîsanê de rêzek reform ragihandin (qanûneke nû ya der barê partîyan, çapemenîyê û hwd. de) û di nav wan de rakirina rewşa awarte ya cihê şermê ye jî hebû. Lê belê, dema ku diyar bû hêzên ewlekarîyê hê jî guleyan li sîvîlan direşînin, tesîra van tedbîran heliya û nema. Artêş kete Deraayê û agahdarîyên qismî yên li ser komkujîyên li vî bajarî pêk hatî, xuya ye rûpelek zîvirandin û şiddet ji bo rejîmê kirin yekane çareserî.

### Têkoşîna li dijî Îsraîlê

Salên desthilatdarîyê serokdewlet Beşar el-Esed hişk kir; ew bêhtir otorîter bû. Ew bi pêşxistina kontrolê li ser tevahîya civakê tamijkî bû. Ev kontrol hem li ser çapemenîyê ye, hem li ser zanîngehan û hem jî li ser aborîyê. Kontrola li ser aborîyê bi rêya malbata xwe pêk tînê, nexasim bi ya pismamê xwe Ramî Mexlûf ê ku tevî gelek kar û şirketan herweha şirketeke telefonên destan yan jî hevkarên wê kontrol dike. Li şûna ku bibe sîstemeke beşdarîya gel a ku fikrê ji jêr digihîne birêveberîyê, Partîya Baas veguherî amûreke besît a seferberkirinê, navgîneke xelatkirina dilsozîyê û cezakirina muxalifîyê. Xweîfadekirina azad bi tevahî ne mumkin e; biryarên siyasî malê hêzên ewlekarîyê û komeke piçûk dimînin, ên ku li dora serokdewlet dibin perwane û digerin. (5) Wekî din el-Esad weke bavê xwe, hîletê wî jê diçe ku ecele lê were kirin û naxwaze weke ku li hemberî zextê paşde gav avêtibe, xuya bike.

Ji bo reformkirina rejîma xwe -bi şertê ku ew vê tercîhê bike-, divê ew xiyanetê bi berjewendîyên malbata xwe ya mezin re bike, bi yên şefên xizmetên dewletê û yên artêşê re –bi taybetî bi yên birayê xwe Mahir re ku fermandarê muhafizên serokdewlet e û yek ji hêmanên herî hişk ê rejîmê ye-, bi berjewendîyên zilamên xurt ên civaka alewî re û bi yên bazirganên dewlemend ên Şamê yên sunnî û nêzî desthilatdarîyê re jî. Burjûwazîya nû ku weke hejmar kêm e, lê belê hêzdar e, li ser rêya derbasbûna ji aborîya dewletê ber bi aborîya bazarê ve dewlemend bû; lê belê ew jî bawerîya xwe bi wî tîne. Gelo daxwaza wî heye ku dawîyê li rêbazên bi şiddet ên hovane bîne ku ew bixwe ji polês û hêzên ewlekarîyê fêr bûye? Lewra vî xuyî û vî tebîetî jî nîv sedsalê û vir ve, heta bêhtir jî –lewma otokrasîya li herêmê weke ya Sûriyê xwedî reh û rîşên pir kûr e– şaxên xwe berdane.

Lê belê rejîm divê di heman demê de dijminên xwe yên li Libnan, Urdun, Iraq, Erebîstan Suûdî û Îsraîlê jî li ber çavan bigire. Di nav dijminan de tevn û rêxistinên welatîyên Sûrî yên mişext ên li London, Parîs û Waşîntonê jî hene. Dewletên Yekbûyî alîkarîyê dide hin ji wan. Li gor raporên dîplomatîk ên ku Wîkîlîksê ew eşkere kirin û 17 nîsana 2011ê ji alîyê *Washington Postê* ve hatin weşandin, wezareta karê derve bi dizî muxalefeta Sûriyê fînans kiriye –bi taybetî jî tevnên li Londonê– mîqdara pereyên gihiştine vê muxalefetê di navbera 2005 û 2010ê de 12 mîlyon dolar e.

Rejîma Surî dewama ya bêv e. Dema Hafiz el-Esed –li şûna ku alîkarê serokdewlet Abdul Helîm Xeddam an jî rayedarekî din ê payebilind ê ku bi awayekî dilsoz xizmet kirî– Beşar hilbijart, wî sîstemeke otokratîk a navendîkirî jî jê re mîras hişt. Vê sîstemê xwe disipart serokdewletekî xwedîyê hêza mutleq û herweha rêzeke hevgir û dijminên li qada herêmî û navneteweyî yên ku bi hev re siyaseta demdirêj a Sûrî diyar dikirin. Çawa ku rewşa niha jî ferz dike, fêmkirin û pêkanîna reformên girîng ên hundir wê guhertineke ji binî ve ya peşikîyan hewce bike. Ji bo el-Esedan siyaseta derve di van dehsalên dawîyê de pirgirêkeke heyatî bû ku piranîya enerjîya wan lê diçû.

Karîyera Hafiz û paşê yê kurê wî jî bi alozîya bi Îsraîlê re dirûv girt. Sûrî diviyabû bifilite û di derdoreke Rojhilata Navîn a dijminane de şer bike. Serketina mezin a Tel-Avîvê ya di şerê hezîrana 1967ê de, dagîrkirina erdên Sûrî ku di nav wan de platoya Golanê jî heye û hevgirtina fireh a Îsraîlê bi Dewletên Yekbûyî re ev derdor bi gewde kirin. Bi vî awayî hegemonîyeke îsraîlî-amerîkî xwe ferz kir ku Sûrî ji hingê ve hewl dide xwe jê xilas bike. Şerê ku Qahîre û Şamê bi armanca gihiştina aştîyeke gerdûnî sala 1973yê dabû dest pê kirin di destpêkê de hin serketin bi dest xistin. Lê belê di encamê de Misrê xwe ji şer vekişand û bi serê xwe bi Îsraîlê re peymana aştîyê mohr kir û herêm hê bêhtir ji serdestîya îsraîlî re hişt.

### Bi vî rengî hevkarîya Şam-Tehran-Hizbullah-Hamasê xurt bû

Li hemberî van tehlûkeyan Sûriyê bi komara nû ya îslamî ya Îranê re hevkarîyek pêk anî. Û piştî ku bi armanca tinekirina Rêxistina Rizgarîya Filistînê (RRF) û welatê sedaran bi xwe ve girê bide, Îsraîlê sala 1982yê Libnan dagîr kir, Şamê hevgirtinek bi berxwedana şîî ya li başûr re çêkir. Hizbullaha Libnanê bi alîkarîya lojîstîk û eskerî ya Îran û Sûriyê şerekî gerîlayî meşand, piştî hijdeh salên dagîrkerîyê, wê hêzên Îsraîlê di Gulana 2000ê de kirin der û welat rizgar kir. Bi vî rengî tewereya Şam-Tehran-Hizbullah-Hamasê xurt bû, ev tewere hevrika sereke ya herêmî ya Dewletên Yekbûyî û Îsraîlê ye.

### Ewlekarî yan azadî ?

Hem Dewletên Yekbûyî û hem jî Îsraîlê ji bo şikandin û xirakirina vê tewereyê hêza xwe bi kar anî û ji bo ku asteng bikin ew bigihîje kapasîteyeke tirsandinê. Îran mecbûr bû, ji ber bernameya xwe ya nukleer bi mueyîdeyên cezayî û gefxwarinên eskerî re rûbirû bimîne. Şerê hezîran-tebaxa 2006ê ji di nav de, Hizbullah neçar ma li dijî gefên Îsraîlê li ber xwe bide. Çavên Sûriyê hatin tirsandin, welat hat tecrîd kirin, amerîkîyan mueyîdeyên cezayî danîn serê û îlona 2007ê Îsraîlê êrişek bire ser cihekî ku li gor îdîayê tê de ekîpmanên nukleer hebûn.

### Xelkê tepisandî di bin zordarîyê de nikare erdên dagîrkirî rizgar bike û artêşên dîktatoran nikarin şerekî serketî bi rê ve bibin.

Ev ji bo serokdewlet el-Esed şagirdîyeke zehmet bû. Wî diviyabû weke ku bavê wî berîya wî kirî, rêzek krîzên muhtemelen kujer çareser bike. Ji wî hat ku pê serbilind be ku wî awayekî îstîqrar û ewlekarîyê anî welêt. Dema ku mirov dide ber yên li Libnan û Iraqê yên ku bi qadera xwe ya şerên hilweşîner re rûbirû bûn, ma ne welatîyên Sûriyê diviyabû qîma xwe bi çarenûsa xwe bianiya? Rojnameya fermî *Tişrîn* 25ê nîsanê weha dinivîsî "*awayê herî bilind ê azadîyê ewlekarîya welat e.*"

Lê belê ev daxuyanî êdî têrê nakin. Çawa ku serredaktorê rojnameya bi erebî El-Qudsê (London) –rojnameyeke bi rastgoyîya xwe, desteka xwe ya ji bo filistînîyan û dijberîya xwe ya li desttêwerdanên Dewletên Yekbûyî navdar e– Abdulbarî Etwan di nivîsa xwe ya edîtorîyê ya 27ê adarê de jî vê yekê dest nîşan dike: "*piştgirîya berxwedana libnanî (Hizbullah), di demekê de ku tevahîya paytextên ereban derîyê xwe li rûyê wan girtibû, hewandina sekreterên giştî yên rêxistinên filistînî (bi taybetî Hamas) helwêstên hêja ne ku ji bo wan em malavahîya rejîma Sûriyê dikin û wê bixwe jî ji ber van helwestan berdêlên giran dan. Lê belê di navbera van helwestan û razîkirina daxwazên gelê Sûriyê de em tu nakokîyan nabînin, û heke nakokîyek hebe, hingê em tercîh dikin ku rejîm dev ji alîkarîya dide gelê Filistînê û doza wî berde, û bersivê bide daxwazên gelê xwe yên weke azadîyan û têkoşîna li dijî bertîlxwarinê.* (...) *Lewra xelkê tepisandî di bin zordarîyê de nikare erdên dagîrkirî rizgar bike û artêşên dîktatoran nikarin şerekî serketî bi rê ve bibin.*"

* Rojnamevan. Nivîskarê berhemên The Struggle for Syria [Têkoşîna ji bo Sûriyê] Oxford University Press, 1965; Asad: The struggle for the Middle East [Esed: Têkoşîna ji bo Rojhilata Navîn], University of California Press, Berkeley, 1989, û The Struggle for Arab Independence: Riad el-Solh and the Makers of the Modern Middle East [Têkoşîna ji bo Serxwebûna Ereb: Riad el-Sulh û Çêkerên Rojhilata Navîn a Modern], Cambridge University Press, 2010 (Fransîya wê: La lutte pour l'indépendance arabe, Fayard, Parîs, 2010.)

1 Li ser bloga xwe ya bi navê Syria Comment "Deraa: The Government Takes off its Gloves : 15 Killed [Deraa: hikûmetê lepikên xwe ji destê xwe kirin: 15 kes hatin kuştin]", 23ê adara 2011ê

2 Samir Aita, *Les travailleurs arabes hors-la-loi [karkerên ereb yên li derveyî qanûnê],* L'Harmattan, Parîs, 2011

3 Mezhebeke muslumanî, pirî caran wek şîî tê bi nav kirin

4 Hemwelatîbûna bi sed hezaran kurdan ji dest wan hatibû girtin. Sala 2004ê serokdewlet Esed soz da ku hemwelatîbûna wan li wan vegerîne, ev soz nehat bi cih anîn. Ev soz di dema krîza niha de hat dugêsinî kirin

5 Berhema Judith Cahen bixwîne, "Les déboires du "printemps de Damas" [mirad di berde mana 'bihara Şamê']", *Le Monde diplomatique,* novembre 2002

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

## JI NÛ VE AVAKIRINA WELATEKÎ

# Li Tûnisê hilpekîna şoreşê

JEAN-PIERRE SÉRÉNI *

Ji hema hema çar mehan û vir ve tûnisî di navbera şoreş û hilbijartinan de diçin û tên. Di biharê de libendêmaneke bi tirs û fikar kete şûna ta û kelecana çileyê. Hin jê tinekirina encam û zilamên rejîma kevin li pêş digirin da ku bi awayekî nîhayî totalîtarîzma ji serxwebûna sala 1956ê ve dewam dike, bi dawî bînin. Yên din bi kelecan daxwaz dikin ku di 24ê tîrmeha bê de -ev dem ji alîyê gelek derdoran ve weke pirr zû tê nirxandin- mecliseke neteweyî ya destûrçêker were hilbijartin daku bi lez serdemeke derbasbûnê ya li gor wan tijî tehlûke kurt bikin.

Ev muphemî û nediyarî bihevrebûna du sazîyên yekane yên siyasî yên heyî tevlîhev û zehmet dike. Sazîya pêşî hikûmeta demî ye, ya diduyê komîteyeke aştîya civakî ya tunisî ye ku nû pêk hatiye û navê wê bi serê xwe bernameyeke jê re: Merciya/Meqamê Bilind ji bo Pêkanîna Armancên Şoreşê, Reformên Siyasî û Derbasbûna Demokratîk tê gotin. Ev mercî ji duwanzdeh partîyên siyasî, nozdeh komele yan jî sendîke û 72 "kesayetîyên neteweyî" pêk tê. Hejmara endamên wê yên ku em baş nizanin kî wan dineqîne, di nav sê hefteyan de ji 71ê gihişte 155ê (ji 14ê adarê heta 7ê nîsanê) û ew li cihê senatoya kevin a bê merasîm dawî li wezîfeya wê hat anîn, ango li Bardoyê bicihbûyî ne. Ev mercî misêwa hewl dide xwe weke hêza qanûnçêker li ser hikûmetê ferz bike. Ev hikûmeteke ji teknokratan pêkhatî ye ku raya giştî wan nas nake û para bêhtir ji alîyê Muhemmed Xenûcî ango kevne-serokwezîrê serokdewletê ji textê desthilatdarîyê hatî xistin, Zeynel Abidîn Bin Elî ve hatine hilbijartin. Li alîyekî birêvebirina reforma siyasî; li alîyê din parastina nîzamê û birêveberîyê di nav aborîyeke bi tevahî xira bûye -ji ber nemana tûrîstan û muteşebisan pirsgirêka aborîyê girantir dibe- û hem jî di heman demê de şerê welatê cîran Lîbyaya dewlemend daye ber xwe û diçe.

Bêcî Seîd Essebsî yê ku ji 27ê sibatê ve serokwezîr e, yekane kesê xwedî giranî ye di desteya wezîran de. Sedema vegera wî ya bi 84 salîya xwe ya kes ne li bendê bû, valahîya di çînê siyasî de hatî hiştin bû. Egera vê valahîyê jî mîlîtarîzma 23 salan a Bin Elî-parêz bû ku bi kêrî zêdebûna wan kesan hat ku ji her tiştî re dibêjin erê. Ew herweha ji hevkarîyeke kevin a bi yekane rêxistina neteweyî ya tûnisî ya ku çi baş û çi xirab ji diktatorîyê sax filitî, îstîfade dike: Yekîtîya Giştî ya Kar a Tûnisî (YGKT), profesorê ekonomîyê û sekreterê neteweyî yê ji qada perwerdeyê berpirsiyar, Ebdulcelîl Bedûwî dibêje "*ji damezirandina xwe ango sala 1946ê û vir ve ev di cîhana ereb de rêxistineke bê emsal e. Ji hingê ve ew di tevahîya bûyerên dîrokî yên ku li welêt qewimîn, bi roleke navendî rabû.*" Sala 1952ê Essebsî li baroya Tûnisê parêzerekî ciwan e; wî hingê sekreterê xwe yê giştî Ehmed Tlîlî bi awayekî serketî parastibû. Wê demê Tlîlî li ber dadgeheke kolonyal bi cezayê îdamê dihate mahkeme kirin. Vê yekê girêdan çêkirin -yên ku bi kêrhatîtir in ji ber ku sendîka ango yekane tevgera girseyî ya li welêt rêxistinkirî (pêncsed hezar endam), tevî baroya parêzeran, yek ji du stûnên Merciya Bilind û bi giştî yên jîyana siyasî ye.

***Berpirsiyarîya me ew e ku em nehêlin weke ku Bin Elî sala 1987ê anî serê me, em werin xapandin. Em dixwazin bibin parêzvanên şoreşê û demokrasîyê biparêzin, ne ku li erk û meqamên siyasî bigerin***

Li Tunisê heşt hezar parêzer û ewqas jî stajer hene ku pirî caran ji bo wan nan li enîya hirçê ye. Di navbera wan û ciwanên mexdûr ên bajarê Sîdî Bûzîd de hêmaneke girêdanê ya xwezayî heye. Wan hewara bêhêvîtîyê ya van ciwanan bi gewde kir dema wan maneyeke siyasî dayê ku pê nifşê ciwanan hemûyî xwe nas kir. Rejîma kevin zordarî li wan dikir, hejmara wan pir zêde ne ji bo ku karibin dozan li sedûpêncîhûpênc dadgehên welêt bigirin dest, ji ber vê jî rovanşeke wan a civakî heye ku divê bistînin. Hem li kolanan û hem jî li ser ekranên televizyonê bi axaftina xwe ya bi şewq û kelecan bi awayekî çalak mîlîtanîyê dikin; ev yek dike ku reqîbên wan muameleya "demagogan" bi wan re bikin. Li serê wan mirovekî dînamîk û xwedî bandor heye: Ebdurrezaq Kîlanî. Kîlanî ji malbateke mezin a ji başûr e û kesê pêşî bû ku serokwezîrê nû ew hewand. Li buroya xwe ya li Qesra Dadgerîyê ya Tunisê ku bûye mekanê parsekan, wî ji me re got "*berpirsiyarîya me ew e ku em nehêlin weke ku Bin Elî sala 1987ê anî serê me, em werin xapandin. Em dixwazin bibin parêzvanên şoreşê û demokrasîyê biparêzin, ne ku li erk û meqamên siyasî bigerin*".

11ê nîsanê Merciya Bilind li gor teqwîma xwe ya destpêkê bi tenê bi yanzdeh rojan derengmayî qanûna hilbijartinê -yek ji yên herî demokratîk ên cîhanê: Komîsyona Hilbijartinê ya Serbixwe, wekhevîya jin û mêran, hilbijartinên bi tevahî binîsbet...- derxist. Ev qanûn encama konsensuseke di navbera wan hêzên siyasî de ye ku di Bardoyê de tên temsîl kirin -îslamî, sosyalîst, navendparêz, baasî, marksîst, troçkîst, maoîst, yekîtîparêzên ereb-, hemû jî pê bawer in heke ne berhemeke hevpar be, destûra bingehîn a siberojê wê bi kêr neyê û nemeşe. Herkes ji ya xwe hat xwar û tawîz dan. Tevî ku hindikahîyeke selefîst a tundrew Ettahrîr misêwa zextê li alîgirê wê dike û wan tehrîq dike jî, tevgera Ennadha ku di nav îslamîyan de piranî ye, ji bo wekhevîya jin û mêran destê xwe hilda û ev xal erê kir. Serokwezîr partîzanê hilbijartinên navçeyî ye ku mumkin e piranîyeke kesayetîyên herêmî bişîne meclisê. Ev hilbijartin weke yên Komara Sêyemîn a fransî yên berîya 1914ê ne. Dîsa jî wî tawîz da û hilbijartinên binisbet "yên bi rêbaza yên herî xurt dimînin" qebûl kir, ev rêbaz ji bo partîyên piçûk avantaj e -li Tûnisê ji niha ve bi awayekî fermî pêncîh û yek partîyên siyasî hene- û ev yek îhtîmalê nahêle ji bo pêkhatina piranîyeke hikûmeta nerm a ku tundrewan li derve dihêle.

Bi tenê yek îstisnaya vê yekdengîyê heye: Partîya hilweşiyayî ya Bin Elî, Civaka Destûrî ya Demokratîk (CDD), kevneyên wê dê nikaribin ji bo Meclisa Destûrçêker werin hilbijartin, lê belê em baş pê nizanin ka ev qedexe wê heta bi kîjan astê biçe. Ev karekî zehmet e: CDD herweha dewama Neo-Destûrê ye, ya ku piştî 1934ê şerê ji bo serxwebûnê bi pêşengîya Hebîb Bûrgîba bi rê ve bir. Yanzdehemîn salvegera mirina Bûrgîba 6ê nîsana 2011ê li bajarê lê ji dayik bûyî; Monastirê û li seranserê welêt bû sedema seferberîyên gel ên muhteşem. Halê hazir kes li vê hestiyarîyê xwedî dernakeve, herçend serokwezîrê ku yek ji kevne-hevkarên Bûrgîba ye, her cara derdikeve pêşberî gel mantoyê rêberê xwe li xwe dipêçe û sozê dide ku ew ê "prestîja dewletê" lê vegerîne.

### Makezagona ku ji alî meclîsa hilbijartî ve hatiye nivisandin

Yek tiştî ji niha ve hatiye bi dest xistin: Destûra Bingehîn a Komarê ya siberojê, wê ne bi awayekî nepenî ji alîyê komîsyoneke bisporan ve ya ji alîyê desthilatdarîyê ve hatiye wezîfedar kirin, were nivîsîn -li Misr, Fas û Cezayîrê wisa bû- belê ji alîyê mecliseke destûrçêker ve ya ku bi awayekî demokratîk wê bê hilbijartin. Ev daxwazeke ji berê ve ya gelek nifşên muxalif ên cîhana ereb e. Serokê Merciya Bilind û mîmarê vê qonaxa destpêkê, profesor Yadh Bin Aşûr e. Aşûr der barê berfirehî û mezinahîya vê wezîfeyê de xwe naxapîne: "*Guhertineke çandî divê. Demokrasî mentalîteyek e û berîya her tiştî prensîpên nenivîsandî ne: Rêzgirtina ji muxalefetê re, zanîna kontrola serketina xwe, qebûlkirina destguhertina desthilatdarîyê û tehlûkeya dibe ku mirov di her hilbijartinê de bi bin keve...*"

Du sozên din hene ku wê bicihanîna wan zehmettir be. Ew der barê newekhevîya herêmî û îstîhdamê de ne, ango her du sedemên sereke yên nerazîbûna gel. Yek ji dilsozên Bûrgîba û kevnewezîr Tahar Belxoce bêsebrîya xwe weha îfade dike: "*Pirsgirêka aborî, ev pirsgirêka herêmên xizan e, ew jî hê tiştekî diqewime nabînin!*" Pakêteke lezgîn a destpêkê ya 200 mîlyon dînaran (105 mîlyon euro) ji çardeh herêmên herî hewce re (ji nav bîstûçaran) hatin veqetandin, ev çardeh herêm hemû jî li nav welêt in û li pêşîya hemûyan Kasserîn, Sîsî Bûzîd û Gafsa tên ku sêgoşeya sor a serhildana di nîsanê de ne. Serokwezîr hez dike berîya hilbijartinan, encamên destpêkê bi dest bixe, yên ku mirov karibin li Sirta Tûnisê bi wan bihesin; Ev sirt xetek e di rengê zerê erdê de ye, bilind û rût e û welêt dike du parçe. Ew hê jî hêvî dike ku berîya 24ê tîrmehê bernameyeke hewasdar ya bipêşketina herêmî ya "*ji Cendûba heta bi Mêdenînê*" bide dest pê kirin ku navê wê û heta fînansmana wê hemû hatine peydakirin: Plana Bûezîzî, navê firoşvanê ciwan Muhemmed Bûezîzî, ciwanê ku li Sîdî Bûzîdê bedena xwe 17ê kanûna 2010ê da ber êgir û kir ku serhildan dest pê bike. Ev ê bibe nîşana hewldaneke girîng ji bo pêşdebirina rojavayê welêt, bilindkirina asta perwerdeyê, modernkirina pergala tenduristîyê, nirxandina çavkanîyên herêmî...

Pirsgirêkeke din ya îstîhdamê ye û ev pirsgirêk neteweyî ye: pêncsed hezar bêkar ên ku çaryekê wan xwedî dîploma ne, ji 1ê çile ve bîst hezar kesên din ji ber bûyeran û encamên wan (bi awayekî giştî derxistina ji kar, talan, xirakirina fabrîkeyan, vandalîzm...) bêkar man, pêncîh hezar karkerên ji Lîbyayê vegeriyayî welatê xwe, li wan zêde bûn, û tîrmeha bê li bazara kar zêdebûna heftêhezar dîplomagirên nû. Ango di nav şeş mehan de sedûçil hezar kesên din ên li kar digerin, li bêkaran zêde dibin. Hikûmet xweşbîn e, hêvî dike bi awayekî wekhev di navbera îdare, hêzên nîzamê û qada taybet de dabeşkirî şêst hezar cihên îstîhdamê biafirîne. Nîşana tansîyona timî li herderî heyî; weşandina encamên îmtîhanên pêşî yên ji bo mamostetîya dibistanên navîn (lîseyê), diviyabû gelek hefteyan were paş xistin. Ji bo sê hezar karên mamostetîyê sedhezar kes bûn namzed û tirs hebû pevçûn derkevin...

Tevî ku bi hezaran ciwan dikevin ser rêya zehmet a ber bi Lampedusa [bajarê Îtalyayê yê ku penaber bi keştîyan bi qaçaxî diçinê] ve, gelekên din jî li ser peyarêyan dikevin nav karê firotina bêqaîde a malên qaçax, û hindikahîyek ji lawazbûna dewletê sûdê werdigire daku bikeve nav sûc û îllegalîteyê -ev yek bi taybetî li taxên xizan ên gel li lez û bez belav dibe-, dîsa jî em şahidîyê li venûbûneke şêwazên seferberîyên civakî û siyasî jî dikin. Êdî karekî jirêzê ye ku sîh kes otobûsekê kirê bikin, biçin paytext Tûnisê daku, li buroya wezîr bixwe, karekî çareser bikin yê ku burokrasîya navendî ji mêj ve serê digire. Çalakîyên rûniştinê yên dewamî, li cihekî sembolîk, li ser otobanekê, rêyeke hesinî, li oteleke mezin, li sazîyeke îdarî, li ber xeteke lûleyên gazê, êdî bûne adet. Paşveşandina şef, walî û midûrên şirketan êdî bûye karekî jirêzê û gelek herêmên serhildêr ên Sirta Tûnisî ji niha ve didu yan jî sê caran berdan karmendên payebilind ên bextreş ên ku ji alîyê paytext Tûnisê ve hatibûn wezîfedar kirin. "Sans-culottesên ji Sirtê" li paytextê daketin meydana hikûmetê Kasbahê û ber bi dawîya çileyê ve kirin ku heşt wezîrên CDDyê îstîfa bikin; ber bi dawîya meha sibatê ve dîsa vegeriyan û berdan serokwezîrê ku hê hingî jî kevne-CDDyî bû. Gelo wê kî bibe hedefa wan a bê?

* Nûçevanê taybet

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



MÎRÊ HÊKAN: **Azadîya daliqandî**, (1994) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê, 120 x 60 x 19 cm



MÎRÊ HÊKAN: **Rêya Mîr**, (1992) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê, 90 cm x 190 cm x 18 cm

www.lemonde-kurdi.org

## Destana kanala qatarî

# El-Cezîre, meydaneke alternatîf a siyasetê

MOHAMMED EL OIFI *

**Çend sed xwepêşandêr li ber navenda televîzyona El Cezîreyê li Şamê civiyan û ew bi "alîgirîyê" gunehbar kir. Di heman demê de, desthilata lîbyayî rojnamevanên kanalê bi piştgirîdayîna serîhildêran tawanbar kir û ketina Trîpolîyê jî li wan qedexe kir. Di nav çend salan de, El Cezîreyê bergeha medyayên herêmê guherand û qadeke giştî ya transneteweyî afirand. Bi xêra vê, di van guherandinan de ku ji dawîya sala 2010ê ve cîhana ereb hejand, kanal bi roleke girîng rabû.**

Li 2ê adara 2011ê, li hember endamên komîsyona karên derve yên Senatoya Amerîkî, Hillary Clînton gotinên weha anî ser zimên ku mîrê Qatarê û rayedarên El Cezîreyê ji 2001ê ve li bendê bûn. Wezîra derve weha rave kir ku Dewletên Yekbûyî *"di şerê agahîyan* [ê li cîhanê] *de têk diçin"*, ji ber kanalên televîzyonê yên mezin ên ferdî yên amerîkî, *"ku bi milyonan reklaman û nîqaşên bisporan diweşînin"*, û di heman demê de *"hejmara temaşevanên El Cezîreyê bilind dibe, lewre ew agahîyên rasteqîn dide"*. Clînton jî, ji senatoran re weha lê zêde kir: *"Bivê nevê, ew* [El Cezîre] *bi rastî pir xurt e"*. Ew dike *"hişmendî û helwêstan biguherîne"*. (1)

Digel ku Clîntona ji bo budceya wezareta xwe diaxivî, berjewendîyên xwe diparastin, di paşxana şoreşên cîhana ereb de,qebûlkirina bi vî rengî ya rol û bandora navneteweyî ya El Cezîreyê dengekî taybet vedide. Di herêmê de, kanalê aheng û rêbazên xwe yên xebatê li ser tevahîya zemîna medyayî ferz kir, çend reqîbên xwe yên erebîaxiv daye alî û hemûyên din jî xistin bêistiqrarîyê. Li ser vê, Hafez Al Mîrazî, pêşkêşvanê navdar ê kanala suûdî El Erebiya, reqîba sereke ya El Cezîreyê (2), kardêrên xwe bi awayekê pir watedar bêminet kir. Wî li hember ji desthilatê ketina Husnî Muberek nerazîbûn nîşan da û di bernameyeke zindî de, xembarîya xwe anî zimên ku medyaya ku wî dixebitîne *"newêre li ser key Evdila an jî desthilata suûdî tiştekî bibêje"*. Wî di gel ultêmatomekê dawî li gunehbarîyên xwe anî: *"Ku em nikaribin fikirên xwe bibêjin, bila em dev ji her tiştî berdin. Di bernameya bê de, em ê tiştekî biceribînin: Em ê behsa bandora* [şoreşa li Misrê] *li ser Erebistana Suûdîyê bikin. Eger çêdibe, El Erebîya kanaleke serbixwe ye; eger çênebe, ez silav û sipasdarîya xwe pêşkêşî we dikim"*. (3) Bi dû re wî careke din li ser ekranên kanala di destê berjewendîyên suûdî de xuya nekir. Îtiraza wî diyar dike ka stratejîya medyayî ya Riyadê çawa têk çûye û rayedarên wê jî nikarin li gor rastîyên siyasî yên nû xwe biguherînin. Hareketeke bi vî rengî jî, vegera li ser sahneya medyayî ya ereb a Misrê, ji bin destê giran ê serokkomar Husnî Muberek rizgarkirî, dide xuyan. Ihtîmal e ku ev yek di nav salên bê de, bandoreke girîng li herêmê jî bike.

### El Cezîreyê pergala medyayên herêmê bi temamî da guherandin

Ji avabûna wê ve, li mijdara 1996ê, kanala agahîyên bê navber El Cezîreyê pergala medyayên herêmê bi temamî da guherandin, tevn û rêbazên xebata wê jî, her weke hevsengîya hêzên siyasî yên li binê wan jî, nûjen kirine. (4) Hinek jî kanalê weha girîng dihesibînin û idîa dikin ku ji toreyên civakî bêhtir, ew di destpêkirina şoreşên ereb de bi roleke mezin rabûye. Julian Assange yê hevdamezrînerê WikiLeaksê jî vê fikirê diparêze; li gor wî, Twitter û Facebook *bi rolên xwe rabûn, lê ne bi qasî El Cezîreyê"*. (5)

### Dawîya serdestîya suûdîyan

Taybetmendîya medyayên ereb -bi xêra hebûna zimanekî hevbeş- ji heyînîya qadeke hevpar tê, ya ku ji dewlet û rayên giştî yên neteweyî berfirehtir e û li dawîya sedsala 19ê derket holê. Reqabetên navereb jî, di kontrola vî zemînê giştî re derbas dibin. Li vî warî, welatên Kendavê, nemase Erebistana Suûdî û Qatarê, serî kişand. Li dû vekişandina Misrê, ji ber mirina serokkomar Gamal Abdal Nasser a li 1970ê, û ya Iraqê, bi pey îşgalkirina Kuwetê ya 1990ê re, Erebistana Suûdî piranîya medyayên panereb bi dest xist. Li nav salên 1990ê mîrê Qatarê, şêx Hamad bin Xelîfe al-Thanî, El Cezîre da saz kirin û dawî li monopola suûdî aniye.

### Miameleya mîlîtanî ya şoreşan

Bi riya neqandina cihê dezgehên xwe, nûçegihanên xwe û meylên xwe yên îdeolojîk, El Cezîre ji awayê suûdî bi sê alîyan veqetiya. Berî wê, bawerîya ku bi tenê medyayên ereb ên li derveyî welêt bicihbûyî dikarin bi dereceyeke azadîyê tev bigerin, serdest bû. Koçberbûna beşeke ji çapemenîya libnanî ber bi Ewropayê ve bi pey destpêkirina şerê navxweyî li 1975ê re, ev bîrdozî jî xurt kiribû. Împaratorîya medyayî ya suûdî li Londonê an li Îtalyayê bi cih bû û ji peydabûna girseyeke rojnamevanên ereb, nemaze libnanî, ên ku bûne hevkar -an jî, li gor hinan mersener- ên mîrên suûdî, sûd werdigirt. Lê El Cezîreyê ev pêşnihêrîn derew derxist û şanî da ku medyayeke panereb, ya li welatekî ereb bicihbûyî dişê bi azadîyeke berfireh jî tev bigere. Gav bi gav, medyayên suûdî jî vegeriyan herêmê, bi taybetî li Mîrîtîyên ereb ên yekgirtî -lê ne li Erebîstana Suûdîyê.

Ji bo ku kanalê bi temaşevanan bidin hez kirin û qebûl kirin, sazkerên El Cezîreyê xwest ku nûçegihanên kanalê pirengîya neteweyên ereb temsîl jî bikin û weha dawî li pirhejmarîya rojnamegerên libnanî û binesazîyên suûdî anî.

Helbet, nakokîyên li navkomên rojnamegeran pir caran çêdibin, mînak li 25ê gulana 2010ê, pênc pêşkêşvanên jin li gel hev ji kanalê îstîfa kir. Hin medyayên ereb û çapemenîya navneteweyî li pey wan, şiroveyên mîna zext û pêkutîyan, her weke daxwaza kanalê ya ferzkirina qaydeyên lixwekirinê yên hişk, derxistin pêş. (6) Lê belê, Joumana Namnour, yek ji rojnamegerên îstîfaker, diyar kir ku sedemên rastîn ên îtîraza wan ne ji ber kinc lixwekirinê, bêhtir eleqedarî sebebên pîşeyî bûn (7), wek kêmbûna hêza wan di nav kanalê de. Wek mînak, hemû bernameyên siyasî yên pirhejmar ên kanalê ji hêla mêran ve tên pêşkêş kirin.

### Panereb, îslamperest û lîberal

Analîzeke hûrgilî ya nasnameya îdeolojîk û xeta redaktorî ya El Cezîreyê, bi tehlîlkirina bernameyên nîqaşê û mijarên bijartî, her weke bîrdozîyên siyasî yên pêşkêşvanên sereke, diyar dike ku hevsengîyeke zirav li nav sê meylan heye: Panereb, îslamperest û lîberal.

Serfirazîya El Cezîreyê, hezkirin û heta heyranîya temaşevanên erebîaxiv ji bo wê, bi awayê wê ya nûker a derbirina nûçeyên rojevê, her weke lîberalbûna rêbazên wê tê îzah kirin. Li her welatekî ereb, El Cezîre mafê axaftinê jî dide muxalefetê, daku fikirên xwe li ser rastîyên fermî bibêje, û kanalê bi vî rengî nîqaşên dijberî hev ên rasteqîn pêşkêşî temaşevanan kirine. Pirrengîya mêvanan, çi ji alîyê neteweyê, fikirên îdeolojîk û siyasî û cihê ku ew lê dimînin, rê li ber çûn û hatina bîr û bawerîyan vekir, sînorên neteweyî rakirin û hemî sansûr pûç kirin. Bi vî awayî ji bo sazkirina zemîneke ereb ê transneteweyî, kanal bûye xwedîya roleke esasî. (8) Kanalên televîzyona satelît, rojnameyên panereb, her weke Înternet, blog û toreyên civakî jî, tevna vî zemînê înşakirina fikir û bijarteyên siyasî li ser hemû meseleyên têkildarî herêmê, hunand.

Vê piralîbûna eleqedarî zêdebûna awayên agahîdayînê yên transsînorî ku dewletên reqîb ên weke Erebîstana Suûdîyê (El Erebiya), DYA (El Hurra) an Îranê (El Alem) da dest pê kirin, konfîgurasyoneke siyasî-medyayî ya nû derxist holê, ku derdoreke medyayî ya piralî û kêm zêde azad, û desthilatên siyasî û neteweyî yên zordar dike ser hev. Wêrekî û bandordarîya El Cezîreyê, vê hevdijberîyê xurt dike û zexteke domdar li îqtîdarên ji ber ger û dewra agahîyan matmayî hiştî dike. Gihîştîbûna pêvajoyên şoreşger ên li cîhana ereb ji vê tansyona navbera rêça siyasî û rêça medyayî feydeyeke mezin wergirtiye.

### El Cezîre gav bi gav ji kanaleke televîzyonê ya jirêzê veguherî sahneyeke siyasî ya şûngir


Ji ber qelpbûn an jî tunebûna dezgehên nûner, sazîyên partîzan û sendîkayî yên ku wê bikarîbûna nîqaşa giştî bi rêk xin, El Cezîre gav bi gav ji kanaleke televîzyonê ya jirêzê veguherî sahneyeke siyasî ya şûngir. Ev nêzî deh salan e ku pirsên mezin ên gelên herêmê li ser ekranên wê tên guftûgo kirin. Ew di hemû şeran de bûye mijareke nelihevkirinê, çi li Efganîstanê an jî li Filistînê, nemaze ji ber dînamîzma dîplomasîya qatarî, ku pir caran erf û adetên herêmî jî dihejîne.

Rexneyên li ser meylên kanalê, çi ji hundir (9), çi ji derveyî cîhana ereb (10) werin, bûne beşeke lîstika siyasî ya Rojhilata Nêzîk. Armanca van rexneyan pirî caran ev e ku hikûmeta qatarî bixe tengezarîyê, ji ber ku xeta redaksîyona kanalê weke wergera medyayî ya meylên dîplomatîk ên dewleta Qatarê tê hesibandin. Lê belê, di serî de rengê nûçegihandina şoreşên van mehên dawî, hemû tişt El Cezîreyê weke diyardeyeke ereb nîşan didin, neynikeke pêşketina herêmî ku ji vîna Dohayê pir meztir e.

Tevî ku tê hez kirin jî, El Cezîre hê jî kanaleke mijara nîqaşan e, ji ber sedemên ku pir caran dijberî hev in. Hin vekirina wê ya li îsraîlîyan mehkûm dikin (ew yekemîn kanala satelît bûye ku di gel rayedarên dewleta ibranî hevdîtin pêk anîn), hinên din jî tropîzma wê ya "îslamperest" şermezar dikin. Ku "dijamerîkî" jî bibe, fermandarîya pêncemîn fîloya amerîkî hê jî li Qatarê bicihbûyî ye û mîrîtî bi vî awayî amûreke nufûza/bandora Dewletên Yekbûyî li Rojhilata Nêzîk e.

Nêzîkatîya wê ya mîlîtan li hemberî şoreşên ereb, nemaze li Lîbya û Yemenê, her weke piştgirîya wê ya ji bo desttêwerdana leşkerî ya NATOyê, weke desttêwerdana karên hundir ên welatên ereb mehkûm bû. Derneketina muxalefeta suûdî an qatarî li ser ekranên wê, newêrekîya wê li hemberî bûyerên li Bahreynê (11) û kêmbûna rexneyên wê li ser êrîşa hêzên suûdî û hevkar a di vê keyatîyê de, weke îradeyeke statukoparêz a li Kendavê tê nirxandin.

Nûçegihandina El Cezîreyê li ser şoreşên mexrebî û Rojhilata Nêzîk, yên ku di wan de îslamîst hema bêje qet xuya nakin, teza rexnelêgirên kanalê, ku wê weke "dezgeheke îslamperest" dida xuyan, pûç kir. Avakirina El Cezîreya bi ingilîzî jî, li 2006ê, îmaja medyayeke dijrojavayî, heta dijcihûyî jî, ku The Middle East Media Research Institute (Memri) xwest bidiyê, bi temamî pûç kiriye. (12)



MÎRÊ HÊKAN: **Gula perçekirî**, (1994) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê, 120 x 60 x 5 cm

* Polîtolog

1 *Bnr.* "Hillary Clinton: "Viewership Of Al Jazeera Is Going Up In The United States Because It's Real News"" ["Hillary Clînton: "Rêjeya temaşevanên El Cezîreyê li Dewletên Yekbûyî bilind dibe, ji ber ku nûçeyên rastîn pêşkêş dikin""], YouTube.com, 2ê adara 2011ê

2 Mohammed El Oifi, "Le face-à-face Al-Arabiya/Al-Jazeera: un duel diplomatico-médiatique" ["Dijberîya El Erebiya/ El Cezîre: Reqabeteke dîplomatîkî-medyayî"], *Revue Moyen-Orient*, hjm. 6, Parîs, hezîrana 2010ê

3 Bernameya "Studio Al Qahîra", El Erebiya, 12ê sibata 2011ê

4 Yves Gonzalez-Quijano û Tourya Guaaybess (brv.), *Les Arabes parlent aux Arabes : La révolution de l'information dans le monde arabe [Ereb ji Ereban re diaxivin: Şoreşa agahîyan li cîhana ereb]*, Actes Sud, Arles, 2009

5 *Le Monde*, 11ê adara 2011ê

6 Nivîsara rojnameya suûdî al-Hayat a 30ê gulana 2010ê, http://international.daralhayat.com/internationalarticle/146817

7 Bnr.: http://wn.com/Talk_of_the_Town_Joumana_Nammour (nivîskar 21ê nîsana 2011ê ev gotar xwendiye)

8 Mohammed El Oifi, "Influence without Power: Al-Jazeera and the Arab Public Sphere" ["Bandora bê îqtîdar: El Cezîre û qada giştî ya ereb"], di Mohamed Zayani, *The Al-Jazeera Phenomenon. Critical Perspectives on New Arab Media [Diyardeya El Cezîreyê. Perspektîvên nirxîner li ser medyayên ereb ên nû]*, Pluto Press, London, 2005

9 Mamoun Fandy, (*Un) Civil war of words: media and politics in the arab world [Şerê navxweyî yê peyvên (ne kûbar): Medya û siyaset li cîhana ereb]*, Praeger Security International, 2007

10 Zvi Mazel, "Al Jazeera et le Qatar : le sombre empire des Frères musulmans?" ["El Cezîre û Qatar: Împaratorîya tarî ya Birayên Misilman?"], *Controverse*, www.controverses.fr, Parîs, hjm. 13, adara 2010ê

11 Bixwînin "Al Jazeera a perdu sa fièvre révolutionnaire au Bahreïn" [El Cezîreyê li Bahreynê sergermîya xwe ya şoreşgerî winda kir"], 13ê nîsana 2011ê

12 Bixwînin "Désinformation à l'israélienne" ["Dezînformasyona bi awayê îsraîlî"], *Le Monde diplomatique*, îlona 2005ê

Wergera ji fransî: Simko Destan

www.arsivakurd.org

Dijîtîyên hidûdan, îşareta li dijî rojavayê

# Hindistan-Çîn; lihevnekirin, dubendî û cudayetî

Christophe Jaffrelot *

## Reqabeta asyayî

Di qada herêmî de Hindistan û Çîn sala 1995ê bûn hevkarên diyalogê yên Yekîtîya Neteweyên Başûrrojhilatê Asyayê (ASEAN) ku deh welat endamên wê ne : Bîrmanya, Bruney, Kamboçya, Îndonezya, Laos, Malezya, Filîpîn, Sîngapûr, Tayland û Vîetnam. Deh salan paşê Hindistan bû xwediyastatuya çavdêr li Rêxistina Hevkar ya Şangayê (Çîn, Rûsya, Kazakistan, Kirgizistan, Tacikistan û Ozbekistan). Dîsa sala 2005ê, Çîn bû xwediya heman statuyê li Yekîtiya Asyaya Başûrî ji bo Hevkariya Herêmî (SAARC); Bangladeş, Bhûtan, Hindistan, Komara Maldîv, Nepal, Pakistan, Srî Lanka û Efganistan endamên vê rêxistinê ne.
Ji bo pêşîgirtina li pêngava Hindistanê ber bi rojhilat ve, Çîn hê jî li hember ketina wê ya nav Asia-Pacific Economic Cooperationê (APEC) radibe. Di APECyê de ji niha ve bîstûyek endam hene. Lê belê, Civîna Bilind a Rojhilatê ya Asyewî jî di navê de, li gelek civînên asyewî berpirsiyarên her du welatan tên cem hev –ev yek jî piştrast dike ku Çîn herweha hewl nade berdêla wê çi dibe bila bibe Hindistanê li Asyaya Başûr jî asê bike.

Nîsana çûyî, cara yekem, grûba ku Brezilya, Rusya, Hindistan,Çîn û ji nuha pêve jî Afrîka Başûr jî têde -BRICS- enîyeke yekitîyê ava kirin û mudaxela li hember Libyayê û dolarê rexne kirin. Di hevdîtinên navnetewî de, bi hev ve girêdayî, Hindistan û Çîn, dema herdû bi hevre ne, dengê wan bilind û cengawerane dibe.

Bi navbereke şeş mehan Hindistan û Çînê hem sar û hem germ vexwarin.Kanûna 2010ê serokkomarê Çînê Wen Jiaobo çû serdana Delhiya Nû û di vê serdanê de sarbûneke diyar xwe dida der: Di danezana encamê de behsa "Çîna bi tenê (one China)" nedihat kirin; ev peyv li gor adetê tê bi kar anîn daku îşaret bi qebûlkirina serwerîya Çînê li ser Tîbet û Taywanê were kirin. Çîn red dike ku Arûnaçal Pradeş, û Jammu û Kaşmîr di nav yekparetîya Hindistanê de ne û ev behsnekirina "Çîna bi tenê" bersivdayîneke vê reda Çînê bû. (1) Di nîsana 2011ê de li hemberî vê di sêyemîn civîna bilind a BRICSyê (2) ya li Sanyayê (Çîn) de, Pekîn û Delhiya Nû li ser parastina berjewendîyên welatên aborîya wan bi pêş dikeve û rûreşkirina desttêwerdana Lîbyayê –ya ku weke desttêwerdaneke rojavayî hatiye bi nav kirin– hemfikir bûn. Di vê navberê de alîkarîya Çînê di mijara çekdarîkirina bi taybetî jî serhildêrên li Bakurrojavayê Hindistanê û eşîrên bi dehsalan e di nav şerekî cihêxwaz de dane, di çapemenîya hindistanî de deng veda. (3)

Di nîvê dehsala yekem a salên 2000ê de endamê bijarte yê hikûmeta Hindistanê yê ji pirsgirêkên hawîrdorê berpirsiyar, Jairam Rameş konsepta "Çîndistanê (4)" derxist holê. Bi vî rengî em şahidîya germbûneke têkilîyên di navbera herdu welatan de dikin. Ji serdana Pekînê ya dîrokî ya serokwezîrê Hindistanê Rajiv Gandî ya sala 1988ê ve bibîranîna şerê sala 1962yê yê ku herdu welat anîn dijberî hev, êdî bêtêsîr bû û rîtma hevdîtinên fermî jî kêm nebû. Peymanên girîng ên weke India-China Strategic and Cooperative Partnership for Peace and Prosperity (2005), hatin mohrkirin. Di warê dîplomatîk de Hindistanê ji nû ve îdîa kir ku Tîbet parçeyekî Çînê ye –çawa ku wê sala 1954ê jî gotibû– û Pekînê jî qebûl kir ku Sîkkîma Hindistanê sala 1974ê îlheq kiribû, parçeyek ji erdê Hindistanê ye. Di warê aborî de sala 2010ê pevguherînên di qada bazirganîyê de bi carekê zêde bûn û gihiştin 61.7 mîlyar dolaran, ev mîqdar sala 20003ê mîlyar dolar bû. Di bazirganîyê de Çîn veguherî hevkara sereke ya Hindistanê.

Bi her halî, pirsgirêkên sînor ji sala 1988ê ve mijara hevdîtinan in, heta hevdîtinên pir zehmet in jî, van salên dawîyê dîsa derketin holê. Sala 2009ê Pekînê hewl da kredîyeke 2.9 mîlyar dolaran a ji Bankeya Asyewî ya Pêşketinê (BAP) asteng bike, lewra beşeke vê kredîyê (60 mîlyon dolar) ji bo projeyeke li Arunaçal Pradeşê bû. Çîn serwerîya Hindistanê li ser vê herêmê qebûl nake. Çîna ku berevajî Hindistanê xeta *Mac Mahonê* –sala 1913ê ji alîyê brîtanîyan û hikûmeta hingê li Lhassayê ve di encama hevdîtinan de hatibû diyarkirin– hîç qebûl nekiriye, vê herêmê weke "Başûrê Tîbetê" dibîne û weke erdê xwe qebûl dike. Heman salê Pekînê hewl da bike ku serokwezîrê Hindistanê Manmohan Singh ji serdana xwe ya Arunaçal Pradeşê bigere. Bi îhtîmaleke mezin sedema van fikarên ku bi carekê xwe dan der, hebûna manastireke bûdîst a tîbetî li Tawangê ye. Dalay Lamayê şeşan li vî bajarî ji dayik bûye û weha xuya ye ku çînî ditirsin ku xelîfê Dalay Lamayê niha ji wir were.

### Desteka xurt a Çîn dide Îslamabadê fikaran bi Hindistanê re çêdike

Bi ser de jî rayedarên Çînê sala 2009-2010ê biryar da ku vîzeyên xwe ne li ser pasaportên Hindistanî, belê li ser pelên jêkirî bidin şênîyên ji Jammu û Keşmîrê –awayek e ku pê serwerîya Delhiya Nû li ser vê herêmê red dike. (5) Dema ku tîrmeha 2010ê rayedarên çînî heman muamele bi korgeneralekî fermandarê herêma eskerî ya bakur re kir, Delhiya Nû serdana fermî ya Çînê ya ku ev korgeneral wê tevlî bibûya, betal kir.

Ev lihevnekirin di çarçoveya ji nû ve derketina holê ya tansîyonên hindo-pakîstanî de ne. Piştî êrişên cîhadistan çirîya paşî ya sala 2008ê birin ser Bombeyê, ev yek qewimî. Desteka xurt a Çîn dide Îslamabadê fikaran bi Hindistanê re çêdike, nexasim avakirina bendera Gwadar li Belûcistanê (6) yan jî hevkarîya wan a eskerî, bi hev re hilberîna balafirên şer ên nêçîrê JF-17 di çirîya paşî ya sala 2009ê de tesîrê li Hindistanê dikin, fikaran pê re çêdikin. Firkateynên Sword (F-22P), panzerek jî û herweha santralên nukleer wê paşê bi hev re werin hilberîn. Hindistan gumanan dike ku ev santral wê ji bo armancên eskerî werin bi kar anîn. Dibe ku pirsgirêkeke li ser ava derdora çemê Brahmapûtrê jî li van zêde bibe. Çîn li ser çemê ber bi Hindistanê ve diherike santraleke hîdroelektrîkê ava dike, ev santral dibe ku tesîrê li mîqdara ava diherike Hindistanê bike.

Herdu reqîbên li ser erdê ango Hindistan û Çîn, di Okyanûsa Hindê de bêhtir reqîbên hev in. Delhiya Nû tevgav e, ji ber dorlêgirtina tevlîhev a ji ber pêşketina "gerdenîya ji durran" a Çînê (avakirina benderan heta bi tengava Hurmuzê) û bicihkirina fuzeyên li platoya tîbetî. Li alîyê xwe Çîn pê bawer e ku ji Hindistanê têgihiştina *mare nostruma* wê (Derya Çînê) asteng bike, nexasim bi riya dîwarê ku koma giravan a Andamans wî pêk tîne. (7) Fikar li her du alîyan zêdetir dibin, lewra pêdivîya petrolê ya her duyan ji Rojhilata Nêzîk tê temîn kirin û di Okyanûsa Hindê re derbas dibe. Ji ber vê yekê tu kes matmayî namîne ku her du dewlet berîya her tiştî artêşa xwe ya deryayî bi hêz dikin –bêyî ku dev ji sîlehên din berdin, çawa ku em ji budceyên eskerî yên her mezin dibin jî fêm dikin. (8)

Ev berberî dibe sedema avakirina koalîsyon û hevgirtinên herêmî. Çîna nêzî Pakistan, Bîrmanya û Srî Lankayê bi dor wan hevkaran jî ketiye ku Hindistan wê hez bike têkilîyên xwe yên baş bi wan re dewam bike, yan jî bi pêş bixe, yên weke Îran, Nepal û Bangladeşê. Delhiya Nû li alîyê xwe hewl dide sûdê ji tirsa ji hêza Çînê ya welatên cihê bigire, welatên weke Vîetnam, Sîngapûr û Japonyayê – Hindistanê bi van welatan re sala 2006ê peymaneke girîng a hevkarîya stratejîk mohr kir. Ew li alîyê din xwe nêzî Dewletên Yekbûyî dike û Pekîn bi xwe bi tenê dikare hêrs bibe li dijî hevkarîyeke ku li mîhwera japon-amerîkî zêde dibe û rola hêza asyewî ya Dewletên Yekbûyî xurt dike.

### Têkilîyên dualî yên tevlihev li pêşîya hevkarîyan ne asteng e

Ev têkilîyên dualî yên tevlihev li pêşîyê ne asteng e ku her du welat her diçe bêhtir di merciyên piralî de werin cem hev –û berê xwe bidin heman alîyî. Pirhejmarîya dezgehên ku welatên asyewî yan jî bi awayekî giştîtir welatên bi pêş dikevin tînin cem hev, gurayî û têrûtijîbûna van danûstendinan jî zêde dike: Hindistan û Çîn îro di qada herêmî (*li nivîsa di çarçoveyê de binêre*) yan jî navneteweyî de endamên nîv duzîneyeke rêxistinên bi vî rengî ne.

Ji bilî Sêgoşeya Stratejîk a ku Rûsya, Çîn û Hindistanê tîne cem hev, bêguman koma herî derdikeve pêş koma jê re "BRICS" (Brezîlya, Rûsya, Hindistan, Çîn, Afrîkaya Başûr) tê gotin e. Danezana encamê ya yekemîn civîna bilind a hezîrana sala 2009ê li Ekaterînbûrgê (Rûsya) ji nav daxwazên wan, peydabûna dinyayeke pirqutbî bi nav kir. Civîna bilind a diduyê ya nîsana 2010ê li Brasíliayê bi awayekî zelaltir behsa mijarên jeostratejîk ên weke Îranê kir: BRIC –hingê Afrîkaya Başûr hê ne endama vê "klub"ê bû– wan li ser wê nêrînê li hev kir ku mueyîdeyên cezayî yên ku rojavayî pêşniyaz dikin, çareserî nînin. Di dawîyê de bi rasthatina civîna xwe ya bilind a sisiyê li Sanyayê (Çîn) ku nîsana bihurî pêk hat, bi kirina nav xwe ya Afrîkaya Başûr, ev klûba hêzên nû veguherî merciyeke tam a siyasî. Lewra Afrîkaya Başûr di warê performansa xwe ya aborî de ne xwedîya wan wesfan bû ku bibe endama vê klûbê, Çîn û Hindistan hem fikir in li ser parastina berjewendîyên welatên bi pêş dikevin, çawa ku wan li Rêxistina Bazirganîyê ya Cîhanê (WTO) di tevahîya dewra ji Doha heta bi Kopenhagê de jî kiribû. BRICSyê ne bi tenê rexne li desttêwerdana Lîbyayê girtin, wê herweha doza cihekî bilindtir di nav sîstema Rêxistina Neteweyên Yekbûyî de jî kir. Di nav vê daxwazê de her yekê kursiyekî endametîya daîmî di Konseya Ewlekarîyê de ji bo Brezîlya û Hindistanê hebû û eşkere doza meqamên berpirsîyarên Fona Pereyan a Navneteweyî û Bankeya Cîhanî jî kirin; amerîkî û ewropî weke ku bûbe adet van meqaman di nav xwe de parve dikin. Ev hişkbûn û tahlbûna nisbî ya têkilîyên dualî yên di navbera Çîn û Hindistanê de bi gurayîya danûstendinên wan ên di çarçoveyên piralî de telafî dibe. Di van çarçoveyên piralî de her du dêwên asyewî kêfxweş in derkevin hemberî Rojavayê. Ev dijminahî li alîyê Çînê pir matmayî nehêle jî, li alîyê din nediyarî û şîlobûna hin helwestên Hindistanê dibin sedema şaşmayîn û metelmayînê. Weha xuya ye ku welat ji ber tansîyoneke xurt a di navbera "rojavayîparêz" û "rojhilatparêz"an de êşiyaye. "Rojavayîparêz" Hindistanê weke welatekî-pir (*bridge power*) dibînin ku jê tê xeteke yekîtîyê di navbera Bakur û Başûr de çêke; "rojhilatparêz" amade ne bi dilê xwe "Konsensuseke asyewî" – heta Konsensusa Pekînê ya navdar a ku lîberalîzma aborî û otorîtarîzma siyasî tîne cem hev- deynin şûna Konsensusa Waşîngtonê. (9) Mezinbûna aborî ya Çînê elîtên Hindistanê heyranî xwe dihêle û ev yek wan ber bi vî alî ve daf dide. Birêveberê Federasyona Odeyên Bazirganî û Pîşesazîya Hindistanî Rajiv Kumar ji civîna li Sanyayê bi rengekî efsûnkirî vegeriya: "*Tişta herî balkêş a di kapîtalîzma Çînê de bi tevahî ji holêrabûna cihêtîya di navbera qada dewletê û ya taybet de ye. Her du jî bi awayekî şefaf û zelal di bin serwerîya Partîya Komunîst de kar dikin.*" (10)



Wêne: LMD

### Weha xuya ye ku Hindistan bi curekî nexweşîya şîzofrenîyê ketiye

Ji bo hin berpirsiyarên hindistanî demokrasî di siyaseta derve de êdî îdealek nîne, bi tenê amûreke siyasî ye: Bi vî şêwazî desttêwerdana Efganistanê li ser navê demokrasîyê –ya ku dike Pakistan lawaz bibe– rewa xuya dike; lê belê tevlîbûna protestoyên rojavayî yên li dijî dagîrkirina Gurcistanê ji alîyê Rûsyayê ve yan jî biryara Neteweyên Yekbûyî ya hejmara 1973yê –destûrê dide desttêwerdana Lîbyayê– hewce xuya nakin.

Weha xuya ye ku Hindistan bi curekî nexweşîya şîzofrenîyê ketiye. Pêşdeçûna cîrana wê a mezin bi rastî jî ji bo berpirsiyarên mijarên ewlekarîyê bûye fikrekesabit, lê belê li dijî Rojavayê ew li alîyê wê ne, derdorên wê yên kar û pîşesazîyê amade ne li ber heyranmayîna "Konsensusa Pekînê serê xwe bitewînin".

Li kevîya Civîna Bilind a Sanyayê, Delhiya Nû û Pekînê biryar da ku hevkarîya xwe ya qada parastinê ji nû ve dewam bikin –di encama bûyerên tîrmeha 2010ê de ev hevkarî hatibû cemidandin–, lihevderneketinên xwe yên bazirganîyê kêm bikin (di vî warî de lihevderneketina budceya Hindistanê 25 mîlyar dolar bûn), û bipêşvebirina mekanîzmayeke nû ya karkirina ahengdar a der barê pirsgirêkên sînor de. Ev germbûn nîşana daxwaza konjonkturî ya Hindistanê ye ku dixwaze zextê li Dewletên Yekbûyî bike ku li gor wê hê jî zêde nêzî pakistanîyan e; gelo ev germbûna têkilîyan wê hê çiqasî dewam bike? Tu kes pê nizane. Ya strukturel ew e ku hindistanî û çînî dikarin ji hev cuda bikin, têkilîyên xwe yên bi pirsgirêk ên dualî û yekbûna xwe ya li dijî Rojavayê ya di merciyên piralî de.

* Birêveberê lêkolînan li Navenda Lêkolînên Navneteweyî (CERI) – Zanistên siyasî/Navenda Neteweyî ya Lêkolîna Zanistî (CNRS), wî ev lêkolîn bi rê ve bir: *New Delhi et le monde. Une puissance émergente entre realpolitik et soft power [Delhiya Nû û Dinya. di navbera siyaseta reel û soft power de hêzek peyda dibe]*, Autrement, Parîs, 2008.

1 *Binêre li* Sujit Dutta, "Managing and engaging rising China: India's evolving posture (Birêvebirin û teşwîqkirina Çîna bilind dibe: Helwêsta diguhere ya Hindistanê ye)", *The Washington Quarterly*, berg 34, hejmar 2, bihara 2011ê, r. 133

2 Kurteya bi îngilîzî ji bo Brezîlya, Rûsya, Hindistan, Çîn û Afrîkaya Başûr

3 *Binêre li* Saikat Datta, "The great claw of China (Lepê mezin ê Çînê)", *Outlook*, Delhiya Nû, 7ê sibata 2011

4 Jairam Ramesh, *Making Sense of Chindia : Reflections on China and India (Manedarkirina Çîndistanê: Hizrên der barê Çîn û Hindistanê de)*, India Research Press, Delhiya Nû, 2005

5 Hindistan û Pakistan ji sala 1947ê ve li ser Kaşmîrê ne li hev in

6 *Binêre li* Christophe Jaffrelot "A Tale of Two Ports. Gwadar and Chabahar display Chinese-Indian rivalry in the Arabian Sea (Çîroka du benderan. Gwadar û Çabahar hevrikîya Çîn û Hindistanê ya di Deryaya Erebî de nîşan didin )", *Yale Global*, 7ê çileyê 2011ê, http://yaleglobal.yale.edu

7 *Binêre li* Mathieu Duchâtel, "The PLA Navy in the Indian Ocean (Artêşa deryayî ya PLAyê di Okyanûsa Hindistanê de)", di "China's sea power, reaching out to the blue waters (Hêza deryayî ya Çînê digihîje deryayên dûrî peravan)", *China's Analysis*, adara 2011ê, r. 3-5

8 Budceya eskerî ya Çînê ji 30 salan û vir ve salê % 10 zêde dibe û sala 2011ê bi awayekî fermî gihîşte 91 mîlyar dolaran (International institute for security studies, *The Military Balance, 2010*, London, 2011). Ya Hindistanê li gor sala derbas bûyî ji sê paran yekê zêde bû û di 2009/2010ê de gihîşte 32 mîlyar dolaran. Lê belê rastî ne hertim weke van hejmarên fermî ye

9 Tevahîya tedbîrên lîberal yên ku li ser welatên deyndar di navbera salên 1980 û 1990ê de hatin ferz kirin

10 Rajiv Kumar, "Chinese capitalism: some lessons for us (Kapîtalîzma Çînê: Çend dersên ji bo me)", Businessline, 16ê nîsana 2011ê

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



Kanûn 1983

# Kurdistan: Piştî sê salên dîktatorîyê

Huseyin Yildirim

Ji derbeya eskerî ya 12ê îlona 1980yê û vir ve, li zêdetirî du sed hezar kesên pêşverû, demokrat û welatparêz ên kurd û tirk îşkencê hat kirin. Bîst û sê kes ji şervan û kadroyên rêxistina ku xwe weke pêşenga tevgera rizgarîya neteweyî dibîne, Partîya Karkerên Kurdistanê PKKê, bi tevahî sed û pêncî kesan di îşkencê de jîyana xwe ji dest da. Wekî din, ji sed û heftê û sê cezayên mirinê, pêncî û pênc jê dîsa li endamên PKKê hatin birîn. Cuntaya eskerî hê jî "mehkemeya" nêzî şeş hezar "terorîstan" didomîne û li dijî wan ji niha ve cezayên mirinê hatine amade kirin. Herwiha divê neyê ji bîr kirin ku pênc sed û nod û sê kes hatin gulebaran kirin û qurban tenê yên ku bi awayekî fermî eşkerekirî ne, lewre hejmara zilam û jinên li gund û warên Kurdistanê hatine qetil kirin, ne mumkin e bê zanîn.

> Ji ber ku cunta siyaseta bicihkirina nîzama xwe bi taybetî li Kurdistanê pêk tîne ji çend nifşan û vir ve ye ku dagîrkerên tirk, erdên kurdan geh bi darê zorê, geh bi kirîna bi fiyeteke pêkenokî dixe bin destên xwe. Berhemên erdê an jî yên sewalvanîya kurdan jî dîsa bi heman awayî hatin desteser kirin. Ev awayê desteserkirinê îro êdî gihiştiye asteke sînornenas ku ji ber vê yekê xelk nema dikare zikê xwe têr bike.

Ji ber rola ku di çarçoveya stratejîya amerîkî de para Tirkiyeyê dikeve, divê cunta li derve, ber bi Rojhilata Navîn, wezîfa ku kirêdarên wê yên çek û fonan danê, bi cih bîne. Û va careke din Kurdistan raguherî navendeke berfireh ji bo "hêzên desttêwerdana bilez" ên malûm... Li başûrê Kurdistanê û bi taybetî jî li herêma Hekarîyê operasyonên berfireh hatin dest pê kirin. Cotarmanca cuntayê, ji alîyekî ve perçiqandina tevgera rizgarîya neteweyî û ji alîyê din ve jî dana destekeke vekirî ji bo hêzên jihalketî yên rejîma Iraqê ya **Sedam Husên** (1) bû.

> Yek ji sedemên desteserkirina desthilatê ji alîyê generelan ve, pêşketina têkoşîna rizgarîya neteweyî ya Kurdistanê bû û medyayên rojava bi piranî cih nedida nûçeyên girêdayî vê têkoşîna ku hîmê hebûna dewleta tirk dihejand.

Li vir ya behsa wê tê kirin ne tenê şikandina berxwedana çend rêxistinên şoreşger an jî pêşengên wan e, lê belê dîsa weke berê, qirkirin û jiholêrakirina bi tevahî ya gelê kurd e. Bi vê armancê, ji îlona 1980yê ve artêşa tirk berê Kurdistan dagîr kir.

> Beşê herî mezin ê artêşa tirk, ku ji heft sed hezar eskeran pêk tê, tevî amûr û teknîkên herî modern, li Kurdistanê hat bi cih kirin; tankên wê û kamyonên wê yên bizirx seranserî Kurdistanê vegirtin û xwe gihandin heta deverên herî dûr û gundek bi tenê jî li derveyî vê sefera dagîrker nema.

Di van operasyonên hûr û kûr de, artêş, emniyet û ***MÎT*** (Rêxistina Îstixbarata Neteweyî) her sê dezgehên tirk bi hevkarîyeke temam tevdigeriyan. Wan mirov li meydanan an jî li ser rêyên sereke yên gundan kom dikirin û bêyî ku li temen û cinsê wan binêrin, li ser hin ji wan -ên ku gelek caran bi tesadufî dihatin hilbijartin- awayên ecêb ên îşkenceyên fizîkî û psîkolojîk diceribandin.

"Pasîfkirin" ji hingaftina ketûber a gundîyên li meydanê komkirî pêk tê: Bi dar û çoyan, li wan dixin; piştî ku wan li ber çavê alemê tazî dikin, jinan û kalan dibezînin; elektrîkê didin hin deverên bedenên wan; li ber çavên bav û mêrên wan, dest davêjin keç û jinan; mil û lingên wan dişkênin, devên wan tije xwê dikin û carna bi vê yekê jî têr nabin; li meydanê wan didin ber guleyan.

Li alîyê din, îşkenceyên ku li zindanan, li girtîyan dikin hene. Ji ber wan îşkenceyan hê jî nayê zanîn ka çend kes mirine û çend kes ji bo hetahetayî seqet hatine hiştin. Çawa dest danîn ser deshilatê, generalan fermana girtina bi hezaran kurdan da. Hemû, bêîstîsna, di çerxa îşkenceyê re hatin derbas kirin -ji bo ku sûcên ecêb bi wan bidin îtîraf kirin û dûre jî dema çavên wan girtî, "îtîrafnameyên li wir îcatkirî " bi wan bidin îmze kirin. Mirovên ku ji welatparêzîya wan guman tê kirin, bi riya îtîrafkarên veşarî tên girtin û li kampên eskerî, îşkenceyên herî hovane li wan tên kirin. Deverên herî kambax kampên ***Diyarbekir, Elezîz û Erzeromê*** ne.

Ev kirinên ku qet jî ne kêmî yên rejîma **Hîtler** in, bûn sedema mirina hejmareke mezin a muxalîfên rejîmê û sempatîzanên Partîya Karkerên Kurdistanê. Endamên komîteya navendî yên vê partîyê, yên weke **Mazlum Dogan, Ferhat Kurtay** û hin mîlîtanên karker ên weke **Eşref Anyik** di adara 1982yê de xwe daleqandin an jî bedenên xwe dan ber agir. Du endamên din ên komîteya navendî **Hayri Durmuş** û **Kemal Pir**, tevî **Akif Yilmaz** li zindana Amedê ketin rojîya mirinê û tê de jîyana xwe ji dest dan. Bi dehan mîlîtanên din û welatparêzên kurd ku li vir em nikarin navên wan hemûyan binivîsin, dîsa bi îşkenceyê an jî di greva birçîbûnê de hatine kuştin.

Di vê navberê de li himberî vê "pasîfkirin"a ku bêhtir nêzî hewldaneke qirkirinê ye, tevahîya gelê kurd biryardarîya xwe ya berxwedana bi awayên cur be cur, li hemû warên jîyanê, li serê çîyayan, li gundan û hetta li zindanan, tîne ziman. Bi gewdekirina tevahîya berxwedan û têkoşînên xwe, çi yên pasîf çi jî yên aktîv, bi dirûşmeya "hebûn, serxwebûn", gelê me ketiye nav hewldana misogerkirina jîyaneke azad û bi rûmet û amade ye berdêla vê yekê bide.

Dewletên Yekbûyî destekeke diyarker da zemîna amadekirina cuntaya tirk, a ku tê zanîn bêyî haya Waşîngtonê jê çêbe, bi çend saetan zûtir hat îlan kirin. Ji alîyê generalên Enqerê ve bidestxistina deshilatê dibe encameke rasterast a stratejîya amerîkî li Rojhilata Navîn. Ji bo bersivdana rewşa nebaş a li Efxanistan û Îranê, Dewletên Yekbûyî neçar man li ser derfetên din bifikirin ji bo hebûna xwe li herêmê zexim bikin û bikaribin riyên deverên ji alîyê rezervên petrolê ve dewlemend di bin destê xwe de bigirin. Cendirmeyê tirk ji bo vê yekê muasît bû û hat bi kar anîn.

Ya ku berî hertiştî Amerîkayê dixwest bike, bicihkirina "Hêza desttêwerdana bilez" bû. Ji bo pêkanîna palpiştekê li ser axa kurd, balefirgehên nû û depoyên cebilxaneyên eskerî li her derî, li çîyayan, li **Wan** û **Batman**ê saz kirin û weke baregehên sereke bi kar anîn.

Ji tirsa ku tevgera berdewam a neteweyî ya kurd wê pêşî li van projeyên wan bigire, cuntayê di 25ê



Mîrê Hêkan: **6 û 6 lûfikên fedîbûne**, (1993) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê, 120 x 60 x 19 cm

arsivakurd.org



## Arşîva bîra Kurdan

**Huseyin Yildirim**, parêzerê kurd, li Amedê di dozeke girseyî de, sê hezar ji endamên Partîya Karkerên Kurdistanê, parastina pênc hezar welatîyên xwe kir. Piştî ku wî gelek caran pêkanîna sîstematîk a îşkenceyê û gerandina kêfî ya vê dozê şermezar kir, di cotmeha 1981ê de ew jî hat girtin û îşkence lê hat kirin. Protestoyên girseyî, çi yên li Tirkiyeyê (Baroya Parêzerên Tirk) çi jî yên li derve, cuntaya eskerî neçar hişt ku di tîrmeha 1982yê de wî berde. Lê belê êdî nehiştin ew karûbarên xwe yên parastina muwekîlên xwe bidomîne û piştî ku çend hewldanên kuştina wî neçûn serî, wî xwe gihand Swêdê û li vî welatî mafê penaberîya siyasî bi dest xist. Îro navê wî ji bo serlêdana gilîyê li dijî Tirkiyeyê ya ji alîyê pênc dewletên ewropî ve li cem *Komîsyona Mafên Mirovan a Konseya Ewropayê* hatiye kirin, weke şahidê bingehîn derbas dibe. Di nivîsara jêr de, **Huseyin Yildirim**, behsa şahidîya xwe ya zordarîyê dike û bi taybetî balê dikşîne ser çavdêrîyên xwe yên têkildarî çarenûsa Kurdistanê li vê Tirkiyeya eskeran ku hevalbenda NATOyê ye. Û ev parêzer bi awayekî dibe berdevkê kesên ku, di bereya xwe bixwe de, bêrîya têkûzbûna yekîtîya neteweya kurd dikin.

LM*d*kurdî

gulana 1983yê de êriş bir ser başûrê Kurdistanê. Artêşa tirk pêşî gund û gundik bi balafirên şer û topan dan ber bombe û mîtralyozan, dûre bi qasî çil hezar esker şandin ji bo ku herêmê dagîr bikin. Armanca vê operasyonê ne tenê perçiqandina tevgera çekdarî, lê herwiha bi taybetî jiholêrakirin an jî, qet nebe, tehcîrkirina girseyî ya xelkên çîyayî bû. Wêdetirî van tesbîtan, mirov dikare di vê seferê de bibe şahidê yekemîn gava ber bi bicihanîna paş-ramaneke kevnare ya zordarên Enqerê: Ji bo xwe gihandina petrolê îlhaqkirina herêmên Iraqê yên weke Kerkûk û Musilê

Vê êrişkarîyê serkeftina ku dihat hêvî kirin bi xwe re neanî. Artêşên cuntayê li berxwedaneke mezin a gel qelibîn. Wekî din, vê operasyonê radeyeke mezin hestên neteweyî yên kurdên li du alîyên sînor sor kirin û hetta tesîr li kurdên Îranê jî kir. Ji bo hemûyan, bi giranî pirsgirêka sereke yekîtîya neteweyî ye.

### Ji Şerê Birakujîyê ber bi Yekîtîya Neteweyî

Dîroka gelê Kurdistanê berî hertiştî tê wateya li ser hev dagîrkirina Kurdistanê ji alîyê hêzên bîyanî ve û di heman demê de tê wateya berxwedana bi israr a gelê kurd ji bo xwe rizgarkirina ji dagirkerîyê. Serdemên ku kurdan serî li ber bîyanîyan tewand, teslîmîyeta bi şert tercîh kirin, di heman demê de bûn serdemên xetimîn û berdewamîya paşketina civakî.. Serdestên bîyanî jî ji ber vê hilweşîna nasnameya kurd hêza xwe mezintir dikir. Diyardeyeke wisa di dema deshilatên ereb, ecem, osmanî û herî dawîyê jî di dema şah de pir zelal tê dîtin. Li himberî vê yekê, li her serdema ku li dijî dagirkerîyê berxwedana gel xurt dibe, nasnameya neteweyî jî bi biryardarî tê parastin, nirxên gelêrî gur û geş dibin û ji alîyê civakî û siyasî ve jî civak bi pêş dikeve.

Bo nimûne, ancax bi şerkirina li dijî hêzên muxtelîf ên dagîrker, kurdan karî pêşî xwe ji koletîya dema antîk dûre jî ji forma wê ya çaxa navîn rizgar bikin, ji ber ku diviyabû wan hem dagîrkerên bîyanî hem jî axayên xwecîhî yên bi dagîrkeran re hevkarî dikirin, têk bibin: Û eger heta îro jî gelek tevgerên rizgarîya neteweyî bi temamî bi ser neketine, ji ber ku pêşengên kurd nekarîne hêzên xwe bikin yek an jî ji ber ku hin "axayên şer" pir caran rêya teslîmbûna bişert tercîh kiriye. Ev siyaseta hevkarîya bi hêzên bîyanî re û ya perçekirina yekîtîya neteweyî di tevahîya dîroka wî de hertim bûye bela serê gelê kurd.

Pelişîna yekîtîyê û parçebûna Kurdistanê xwedî egerên dîrokî, civakî û siyasî ye ku têra xwe nayên nasîn. Ji ber dagîrkerîya tedrîcî ya di dîrokê de, parvekirî li ser çar parçeyan, neteweya kurd neçarî veguherîneke civakî û aborî ya pir cihêreng bû. Bo nimûne, tevî berdewamîya giştî ya tevnesazîyeke bi giranî eşîr û feodal, beşê ku di bin destê Tirkiyeyê de bi pêşketina sermayedarîya endustrîyel ji beşên din zêdetir dest tê hatiye werdan. Li vê Kurdistana "tirk", bi xuyabûna berberîyên nû yên ber bi gewdebûna "sinifan" û kategorîyên civakî "yên terza xerbî", civaka eşîrî ya kevneşop jî bi kûrahî hatiye veguhertin. Têkoşîna rizgarîyê bi şikandina çarçoveyên dijwar ên eşîrî û parastinî, bi pêş dikeve û di nav dînamîkeke xweser de rûyê xwe daye armancên ku mirov dikare weke tercîhê "demokratîk", "pêşverû" an jî "nûjen" bi nav bike.

Rewş li parçeyên din ên Kurdistanê cudatir e; li Iraqê û Îranê, feodalîzm pir xurt e û veguherîna ber bi çînên civakî di bin bandora kapîtalîzmê de hê pir nû dest pê kiriye. Pêşengên tevgeran bawer dikin ku divê xwe bispêrin hêzên bîyanî, yên bi dilekî pak, bibin rênîşandêr û ji pereyan bigirin heta çek û rextan bersivê bidin her cure pêdivîyên kurdan. Vê têgihîştinê tevgerên kurd daxistin asteke alîkarîwergirên ku li ser hesabê kesekî din şer dikin û her cure pêşniyarên lihevhatinê qebûl dikin, yên ku ti feydeya wan ji bo Kurdistanê tunene.

Di van demên dawîyê de şerên birakujîyê yên zirarên pir mezin didin doza neteweyî rû dan. Li Iraqê, bi taybetî, bi sedan şervanên kurd xwîna hev rijandin û bi dehan gund ji ber vê yekê wêran bûn. Gelo ev berdêlek e ku her neteweyek divê bide, dema ku hewl dide xwe ji ben û bendên xwe yên rojane û dîrokê rizgar bike? Lê belê dijminên sereke yên yekîtîya kurdan her yekî ji wan ji van pevçûnên navxweyî yên kurdan sûd wergirt. Bi vî awayî, havîna dawî, tevî dijberîyên xwe yên dijwar jî, rejîmên tirk û îraqî îmze danîn ser peymanekê ku destûrê dide tirkan ku li ser navê "mafê şopandinê" derkevin nêçîra serhildêrên kurd ên li ser xaka Iraqê.

Zehmetîyeke din a têkoşînê ji ber helwestên pir dişibin hev ên derdorên pêşverû yên tirk e. Ev derdor hê jî xwedî meyleke înkarkirina hebûna pirsgirêka kurd in û nakevin nav hewldana peydakirina hevgirtinekê li gel hêzeke çareserîyê. Li Kurdistanê ji ber vê yekê gelek tengezarîyên dikarin bên bi kar anîn, hene.

Li himberî ewçend giranîyên ji rabirdû ve mane, li hemberî ewçend şaşfêmkirinên ku wan neteweya me ji hev veqetandine, bi awayekî aktîf bûne sedem û wekî din li himberî her cure xwedîderketin û alîkarîya çekan a hêzên mezin ji bo van dewletan, bivê nevê lihevnêzîkbûneke neteweyî ya kurdan pêk tê. Çawa dibe bila bibe, ev forma "lihevkirina" neteweyî, bi her halî wê veguhere yekîtîya kurdan. Û dewletên ku sînorên wan xwe dispêrin dagîrkerîyê û herwiha hin stratejîyên mezin ên cîhanê, qet jî ne kêfxweş in bi vê rewşa ku ji navê yekîtîyeke kurdan bi gewde dibe.

Gelek kes têgihîştine, ku ji dema pelişîna tevgera filistînî- ya ku bêyî ku heq bike, li vê herêma Rojhilata Navîn xwe weke nûnereke hêzên pêşverû û dijfeodal nîşan dida- warê şerûcengê ber bi bakur, ber bi xaka kurd vediguheze. Vê cengê ji niha ve dest pê kiriye. Herçendî cîhan bi xemsarî lê mêze bike jî.

Yekane bersiva me wê ev "kongra neteweyî" ya navdar be ku welatparêzên kurd ên Îran, Iraq û Tirkiyeyê pê dadikevin. Danûstandin û muzakereyên ji bo vê yekê niha dest pê kirine, hem jî di navbera fraksîyonên dijber de ku heta doh jî li dijî hev şer dikirin. Eger hê jî "axayên şer" bi dudilî xwe nêzî vê lihevkirina neteweyî bikin jî, piranîya kurdan êdî pir baş fêm kiriye ku, kongreyeke neteweyî wê bibe vejîna giştî ya neteweya kurd û ev yek hêja ye ku rêxistinên kurd li himberî hev dev ji quretîyan berdin, li hev bibûrin û bigihîjin lihevhatineke neteweyî.

1 Bi awayekî fermî, hatibe red kirin jî, beşdarîya şewirmendên eskerî yên amerîkî di nav van opersyonên "paqijkirinê" de ji alîyê gelek şahidên li cihê bûyerê, hate piştrast kirin

Wergera ji fransî: Baran Nebar



MÎRÊ HÊKAN: **Kurdistan, min bêrîya te kiriye!** (1992) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê, 90 x 190 x 8 cm

## LABORATUWAREKE LÎBERAL KU KETIYE BER XEZEBA KRÎZÊ

# Dema ku gelê îslandî li hember bankeran deng didin

OBERT WADE & SILLA SIGURGEIRSDOTTIR *

Sêyemîn peymana ***Icesave***yê, ku di navbera hikûmetên ***Îzlanda, Hollanda*** û ***Brîtanya***yê de hatibû muzakere kirin, di 9ê nîsana 2011ê de di referandûmeke neteweyî de bi piranîyeke berbiçav hat red kirin. Sedema redkirinê ji naveroka peymanê zêdetir ji ber têkoşînên berfirehtir ên têkilîyên Îzlandayê yên digel Ewropayê bû. Koma ku serkêşîya "**Na**"yê dikir, piranî ji alîgirên rastgirên tund û herweha ji wan çepgirên tund pêk dihat, ku berîya her tiştî dixwest ku pêşî lê bigirin ku Îzlanda tev li Yekîtîya Ewropî bibe. Di nav wan de ew kes jî hebûn ku wan dixwest referandûmê ji bo derbirîna nerazîbûna xwe ya li dij bankeran bi kar bînin, ku ev banker bi deynên xwe yên kêmkirî li derveyî welêt di nav luksê de dijîn û weha xuya dike ku ji berpirsiyarîyên xwe yên ji ber xistina malbat û kargehan a bin deynên giran, rizgar bûne.

Îzlanda bi awayekî mînyatur yek ji pirsgirêkên herî mezin nîşan dide, ku îro hema hema hemû hikûmet rû bi rû ne: Nikarin sektora dezgehan kontrol bikin, ji ber ku di warê darayî de muhtacê wan in.

Di 2007ê de derameda (hatinî) naverastî ya li Îzlandayê di nav 5 deramedên herî bilind ên cîhanê de bû û % 60 ji yê Dewletên Yekgirtî zêdetir bû. Dikanên ***Reykjavik***ê tije bi zêrên luks bûn, li hember restorantên wan ***London*** erzan dima û makîneyên cîp kuçeyên wê yên teng difetisandin. Li gor lêkolîneke navneteweyî, ku di 2006ê de hatibû encam dan, îzlandî dilşadtirîn gelê cîhanê bûn. (1) Piranîya vê refahê ji ber sê bankayên îzlandî bû, ku pir bi lez mezin dibûn. Van bankayan di 1998ê de wekî karên piçûk dest pê kirin jî, 8 sal bi şûn de ketin nav sê sed bankayên herî mezin ên cîhanê û wan di 2000ê de hebûnên xwe yên malî ji parîteya hêza kirînê (GDP) %100 zêde kir û heta 2007ê gihand % 800ê GDP, ku ev rêje li dû ***Swîsre***yê rêjeya duyem bû.

Deynên wan jî ew qas bilind bûn. Krîzê di dawîya îlona 2008ê de lê xist, ku piştî ´helîna aborî ya ***Lehman*** pîyasayên diravî xitimîn û ev yek jî bû sedem ku ew nikaribin deynên xwe paş de bidin. (2) Di nav hefteyekê de, sê bankayên mezin ên Îzlandayê hilweşîyan û dewletê dest danî ser wan. Ew niha tev li komeke kêmtir îhtîşam bûn -***Lîsteya Moody*** (Ajansa derecekirinê ya kredîyan) ev yek di nav 11 hilweşînên herî mezin ên dîrokê de jimart.

### Îzlanda mînakeke 'xwerû' ya dînamîkên mezintir e ku kemînên qanûnî çêkir û di navbera 1990 û 2000ê de asta hesasîyetên darayî di nav cîhana pêşketî de bilind kir

Îzlanda mînakeke 'xwerû' ya dînamîkên mezintir e ku kemînên qanûnî çêkir û di navbera 1990 û 2000ê de asta hesasîyetên darayî di nav cîhana pêşketî de bilind kir. Di destpêka sedsala bîstemîn de, piştî desthilatdarîya bîyanîyan ya seş sed salî, Îzlanda di nav welatên nordîk de wekî civaka herî feodal ma. Masîgirî, çalakîya sereke ya aborîya welêt bû, ku piranîya çavkanîya welêt a bidestxistina pereyên bîyanî pêk dianî û dihişt ku sektoreke

> Li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, komarparêz ji bo ku budçeya federal kêm bikin têdikoşin. Li Portekîzê rayedarên siyasî li hember planên alîkarîya xelasîyê ji bo xweserî û rûmeta xwe bipa-rêzin peymanan çêdikin. Li Yûnanistanê, tedbîrên ji bo plankirina deynan dijminatîyê xurt dike. Îslandî bi referandûmê rêyeke din pêşkêşî rayedaran dikin: fatûreya krîzê bişînin ji bo kesên ku bûne sebebê vî karî.

bazirganîyê mezin bibe, ku xwe dispêre îthalatê. Vê yekê bi dorê re çalakîyên aborî yên bajarî afirandin: Avadanî, xizmetguzarî û endustrîya sivik.

Piştî Duyemîn Şerê Cîhanê aborîya îzlandî ket nav pêvajoyeke mezinbûneke hêzdar. Ev yek encama serhevdeya hin faktoran bû: Alîkarîya ***Plana Marshall***ê, ku piştî avabûna baregeheke leşkerî ya US-NATOyê li vî welatî hat; îxrackirina malên tîcarî bi mîqdarên zêde -masîyên ava sar- ku di nav taleban de xwedî deramedeke guherbar e; û civakeke piçûk, ku piranîya wan xwenda ne û xwedî nasnameyeke hêzdar a neteweyî ne.

Her ku Îzlanda dewlementir bû, bi awayekî paralel digel sîstema îskandînavyayî ji xwe re dewleteke refahê ava kir, ku debara wê li ser bacê ye û heta salên 1980yê Îzlanda gihîşt him ast û him jî belavkirina deramedê ya bi qasî asta naverast a welatên nordîk. Lê belê ew dîsa jî li gor cîranên xwe yên ewropî kontroldartir û mişterîperwertir ma; olîgopolîya herêmî him desthilatdarî û him jî aborî xist bin kontrola xwe -û ew sînordar kirin-.

### Ji deh salên pêşîn ên piştî Duyemîn Şerê Cîhanê û pê ve, komeke 14 malbatî, ku wekî axtapot tên nasîn, elîta desthilatdar a aborî û siyasetê pêk anîn

Sedemên vê berjêrçûnê dikare ji avabûnên hêzdarîyê yên nîv-feodal ên sedsala 19emîn heta kapîtalîzma modern a îzlandî ya nîvê duyemîn ê sedsala 20ê bê dîtin. Ji deh salên pêşîn ên piştî Duyemîn Şerê Cîhanê û pê ve, komeke 14 malbatî, ku wekî axtapot tên nasîn, elîta desthilatdar a aborî û siyasetê pêk anîn û dirûv da veguherîna aborî. Herweha sektora îthalatê, naqlîyatên bin kontrola axtapotê, bankasazî, sîgorta, masîgirî û pêdivîyên baregeha NATOyê jî. Zêdeyî pêncî salan, siyasetmedarên sereke yên îzlandî ji van malbatan derketin. Malbatên wan wekî saltanatekê jîyan.

Axtapotê, partîya rastgir a bi navê ***Partîya Serxwebûnê*** kontrol dikir, ku wan jî çapemenî kontrol dikir û karmend, polîs û dadger û dozgerên payebilind dest nîşan dikirin. (3) Bankayên herêmî (ku dewlet xwedîya wan bû) li jêr bandora partîyên mezin dihatin bi rê ve birin. Xelkê asayî diviyabû ku bi riya karmendan kredî bistînin daku pê mekîne, yan jî dovîzan bikirin ku ji bo tatîlê pê herin derveyî welêt. Torên hêzê digel zordestî, rûn şewitandinê û nebûna bawerîyê re tev li hev bûbûn û ketibûn nav çandeke zilamî, ku hêzdarbûna destê rast ê bi pirç a kesekî pîroz dikir. Ev rewş ji ***Sovyet***a berê pir cudatir nebû.

Di dawîya salên 1970yê û di destpêka salên 80yê de komeke *neolîberal* a bi navê ***Koma Lokomotîf*** li hember vê pergala keleporî derket. Ev kom cara pêşîn di destpêka salên 70yê de, dema ku hin xwendekarên zanîngehê yên beşên hiqûq û birêveberîya kargehî ya rojnameyeke bi navê ***Lokomotîf*** girtin ser xwe û hatin cem hev daku piştgirîya bazara serbest bikin -û ne tenê ew be jî wan herweha xwest ku ji xwe re derfeta kar vekin, di şûna ku li benda patronên ahtapotê bisekinin. Bi dawîlêhatina ***Şerê Sar***, ji ber ku komunîst û demokratên sosyal piştgirîyên xwe wenda kirin, wan rewşa xwe him ji hêla maddî û him jî ji hêla îdeolojîyê ve hêzdartir kir. **Davíð Oddsson**, ji *Partîya Serxwebûnê* ku dê paşê bibûya serokwezîr, yek ji endamên çalak ên vê komê bû.

**Oddsson** ku di sala 1948ê de ji dayîk bû, ji malbateke çîna naverast dihat û di sala 1974ê de ji ***Partîya Serxwebûnê*** wekî encumenê şaredarîya ***Reykjavik*** hat hilbijartin; ew heta 1982yê wekî şaredarê ***Reykjavik***ê ma, wî serkêşîya kampanyaya arizîkirinê dikir -ku keştîyên masîgirîyê yên şaredarîyê jî arizî kirin- û heval û hogirên wî yên ***Lokomotîf***ê ji vê arizîkirinê sûd wergirt. Di 1991ê de ***Partîya Serxwebûn***ê li jêr serokatîya ***Oddsson*** di hilbijartinên giştî de bi ser ket. Wî paşê wekî serokwezîr 14 salan hikum kir -peyva hikumdarîyê mubalaxa nîne- û wî mezinbûna sektora darayî ya îzlandî ji berê de dît û di 2004ê de xwe kir mudîrê *Bankaya Navendî*. Wî hemû jîyana xwe di siyaseta îzlandî de derbas kir, û der barê dinyaya derveyî Îzlandayê de, ne xwedî tecrube, ne jî xwedî baldarîyê bû. **Geir Haarde** hamîyê koma wî ya ***Lokotomotîf***, Wezîrê Darayî ji 1998 heta 2005ê, piştî wî bû serokwezîr.

### Landsbanki ji asîlzadeyên Partîya Serxwebûnê re, Kaupthing jî ji hevpayeyên wan ên Partîya Navendî re û hevparên wan ên koalîsyonê re hat terxan kirin

Lîberalkirina aborîya Îzlandayê di 1994ê de dest pê kir, piştî ku tev li *Herêma Aborî ya Ewropî* bû -bloka tîcareta serbest a welatên *Yekîtîya Ewropî* û *Îzlanda, Liechtenstein, Norwecê*- û astengên li pêş çûnûhatina pere, mal, xizmet û mirovan a ji sînoran re hatin rakirin. Hikûmeta ***Oddsson*** wê demê dest bi bernameya firotina hebûnên malî yên dewletê kir û kargerî jî ji kontrolê derxist.

Lê belê heta dawîya salên 1990ê sektora malî piçûk ma û piranî ji wan bankayan pêk dihat ku xwedîyên wan dewlet bû. Arizîkirin di 1998ê de dest pê kir û bi şêwaza pêşkêşkirina bi nas û dostan a ***Oddsson*** û ***Halldór Ásgrímsson***, yê serekê ***Partîya Navendî***, hat bi rê ve birin: *Landsbanki* ji asîlzadeyên *Partîya Serxwebûnê* re, **Kaupthing** jî ji hevpayeyên wan ên *Partîya Navendî* re û hevparên wan ên koalîsyonê re hat terxan kirin; lê belê teklîfên ji bîyanîyan li derve hatin hiştin. Paşê, **Glitnir**, bankayeke taybet, ku piştî firotinê ji çendîn bankayên din ên piçûk pêk dihat, tev li koma sê bankayên herî mezin ên Îzlandayê bû.

Di destpêka mîllennumê de, di fînansa navneteweyî de bi alîkarîya du şertên gerdûnî coşîya.-bi bolvirîya kredîya erzan û gera serbest a sermîyanê- û herweha ji ber sê şertên nav welêt: Piştgirîya hêzdar a sîyasî ji bo bankayan, bankagerîya perexistinê, ku digel bankagerîya bazirganî peyda bû û ya pêşîn ji wan garantîyên ku hikûmetê ji bo ya paşîn dabûn, sûd wergirt; û deynên hindik ên neteweyî, ku di hemû îthalatan de bi kêrî bankayan dihat, ku ji dezgehên navneteweyî ya derecekirina kredîyê puanên bilind bistînin. Vê yekê rewşa piranîya hîsedarên *Landsbanki*, **Kaupthing, Glitnir** û şirketên wan ên dîmenî guherandin û deshilatdarîya siyasî ya fînansê jî guherand: Siyaseta hikûmeta wê demê bi fînansê re girêdayî bû.

**Oddsson** û hevalên wî paşê rê û rêbazên mortgage, ku ji alîyê dewletê ve dihat dayîn, sist kirin û heta ji bo % 90ê buhayê xanîyan deyn dan. Bankayên nû arizîkirî jî ketin nav pêşbirkê daku bi şertên comerdtir kredî bidin. Li gor wê stratejîyê, ku armanca wê ew bû ku Îzlandayê bike navendeke fînansa navneteweyî ya bacên kêmkirî, baca deramedê û baca *nirxê-lê-zêdekirî* (**BNC**) hatin daxistin. Dînamîkên nepox zûka bandor kir.

### Piranîya vê yekê aborîya 'Ponzi' (Zîncîra Seadetê) bû, ku tê de deyn dikaribû bi deynkirinên din bê dayin

Elîta Bankagerên Îzlandayê li nepoxan siwar bûn daku mulkiyeta xwe ya li ser aborîya welêt berfirehtir bikin û him bi hev du re ketin nav reqabetê û him jî hevkarîya hev kirin. Wan hiseyên xwe wekî temînat nîşan dan û bi vî awayî ji bankayên xwe deynên mezin stendin û buhayên hiseyan nepixandin. Ji rêveberên xwe re gotin ku li gor vê yekê tev bigerin. Wan heman wezîfe sepand mişterîyên xwe jî, ku di nav wan de bankayên din jî hebûn. ***Bankaya A*** deyn da hisedarên ***Bankaya B,*** ku wan jî wekî temînata li hember hiseyan bêhtir hiseyên ***B*** kirîn û buhayên hiseyên ***B*** bilind kirin. Di dawîyê de ***Bankaya B*** qencîya hisedarên ***Bankaya A*** bê bersiv nehişt. Encama aşkere ew bû ku buhayê hiseyên her du bankayan zêde bûn, bêyî ku deramedeke nû bê nav dexîlê. Wan herweha deynên xwe yên li cem hev du ji bo (pereyê rastîn) deynên ji bankayên derveyî welêt wekî temînat nîşan dan.

Piranîya vê yekê aborîya '***Ponzi'*** (Zîncîra Seadetê) bû, ku tê de deyn dikaribû bi deynkirinên din bê dayin; piranîya wê jî xwe dispart sermîyana sexte, ku ev yek jî encama manîpulasyona îllegal a pîyaseyan bû. Lê belê bêîstîqrarîya pêvajoyê hat veşartin, ku bankayan li deverên wekî ***Luksemburg, Girava Manê, Giravên Virgin ên Brîtanyayê*** û hetta li ***Kuba***yê jî şirketên birqokî yên hevbeş ên wekî çerxîfelekê ava kirin, ku van şirketan hiseyên hev du kirîn û bîlançoyên hev du bilind kirin.

Bolvirîya kredîyan bû sedem ku xelk rizgarbûna xwe ya ji dehsalên berê, ku tê de dereceya kredîyan bi riya têkilîyên sîyasî diyar dikirin, bi şahîyên musrîf pîroz bikin. Vê yekê hişt ku xelk xwe dawîya dawî wekî *'mirovên serbixwe'* bibîne,-ku ev yek dikare dereceya wan a *'dilşadtirînên cîhanê'* rave bike.

Bi van riyan vê girava biçûçik Îzlanda karibû bikeve nav koma bankayên mezin. Xwedî û rêveberan xwe li ser tarîfeyeke fireh, ku heta wê demê ew qas fireh nehatibû dîtin, xelat kirin û bankayên xwe ji nav de şêlandin. Her ku ew dewlementir bûn, wan piştgirîya siyasî wergirt; gelek kesan bawer dikir ku li cem wan destê zêrîn ê ***Mîdas***ê heye. Jetên wan ên taybet, ku li balafirgeha ***Reykjavik***ê datanîn û jê radibûn, ji bo xelkê tebeqeya nizim, ku dilê wan dibijîya hiseyan û hesûd dibûn, delîlên dîtbar û bihîstbar bûn. Ji ber polîtîkayên hikûmetê, ku barê bacdayînê bir ser nîvê gelheyê, ku xizan bûn, neyeksanîya deramedê û dewlemendîyê zêde bû. Li ser vê jî bankeran piştgirîyên malî dan partîyên deshilatdar û deynên qirase jî dan siyasetmedarên sereke. ***Wall Street Journal*** jî şampîyona serkêş a pîyasaya serbest a Îzlandayê aşkere kir, '*ceribandinên **Oddsson** ên digel polîtîkayên lîberal çîroka herî serkeftî ya cîhanê ye.'* (4)

Lê belê, di destpêka 2006'ê de di çapemenîyê de sebaret bi îstîqrara bankayên mezin endîşe derketin ser rûyê avê, ku ev banka di pîyasayên diravî de, di warê peydakirina fonan de bi pirsgirêkan re rû bi rû diman (ku modela wan a karsazîyê xwe dispart vê pîyasayê.) Lihevderneketina budçeya Îzlandayê, ku di sala 2003ê de % 5ê ***GDP***yê bû, di sala 2006ê de firîya % 20ê û gihîşt yek ji astên herî bilind a cîhanê. Borsaya qiymetên menkul di navbera 2001 û 2007ê de neh caran zêde bû. Xebatên ***Landsbanki, Kaupthing*** û ***Glitnir*** bi ser kapasîteya *Bankaya Navendî* ya *Îzlanda*yê ketibûn, ku wan wekî denydarê herî dawî hewl didan ku xwe xelas bikin; lê belê jê girîngtir, berpirsiyarîya wan ya rasteqîn bû, piranîya hebûnên wan ên malî nediyar bûn û rêjeyeke bilind a her duyan jî ji ser pereyên bîyanî hatibûn girêdan. Di sibata 2006ê de **Fitch** rewşa Îzlandayê ji seqemgîrîyê ber bi nerênî ve kişand. Ev yek *'krîza piçûk'* a sala 2006ê da dest pê kirin: Buhayê ***Króna***yê (pereyê îzlandî) ji nişka ve ket, berpirsîyarîya qiymetên bankayan, ku ji ser pereyên bîyanî bûn, zêde bû, seqemgîrîya deynên ji ser pereyên bîyanî bûn pirsgirêkên *'dewletî',* borsa ket û temerrudên karsazan bilind bûn. ***Danske Bank*** a ***Kopenhagen***ê ev yek wekî *'çavkanîyeke germavê'* ku dike biteqe, bi nav kir. (5)


Di gulana 2006ê de ***IMF***ê raporeke gelek fikarbar şand hikûmetê, lê belê versîyona çapemenîyê gelek siviktir û nermtir bû. Di rapora xusûsî de lihevderneketinên budceya Îzlandayê wekî ***'hejînok'*** (fikarbar) dihat bi nav kirin, lê di versîyona çapemenîyê de ***'berbiçav'*** hatibû bi nav kirin. Banker û siyasetmedarên îzlandî ji ber nezanîya xwe pir guh nedan krîza piçûk ya 2006ê. *Bankaya Navendî* ya *Îzlanda*yê daku rezervên pevguhertinê yên bîyanî du qat bike deyn stend, û hevdem *Odeya Karsazan*, ku helbet ji alîyê heval û nûnerên ***Landsbanki***, ***Kaupthing, Glitnir*** û şirketên wan ên kêlekê ve dihat bi rê ve birin, dest bi kampanyaya ***Public Relations*** (Têkilîyên digel Gel) kir. *Odeya Karsazan* 135.000 dolar dan aborînasê diravî yê amerîkî **Frederic Mishkin** daku navê xwe bi deyn bide raporekê ku piranî ji alîyê aborînasên îzlandî ve hatibû nivîsandin û tê de radigihand ku bankayên îzlandî bi îstîqrar in. (6) Odeyê herweha 58,000£ dan aborînasê *Dibistana Aborîyê* ya *Londonê* ***Richard Portes*** daku li ser raporekê, ku piranî ji alîyê aborînasekî din ên îzlandî ve hatibû nivîsandin, heman tiştî bike. Ekonomîstê alîgirê arzê **Arthur Laffer** di dawîya 2007ê de garantî da koma karsazên îzlandî ku mezinbûna bi lez a aborîyê digel lihevderneketina budçeyê û nepixîna deynên derveyî welêt nîşaneya serkeftinê ne: *'Îzlanda divê ji dinyayê re bibe mînakek.'*(7) Buhayên hebûnên malî yên bankayan di vê qonaxê de dora 8 caran zedêyî GDPya Îzlandayê bûn. Di hilbijartinên gulana 2007ê de, ***Hevgirtina Sosyal Demokrat*** (SDA) (8) digel partîya domînant, ***Partîya Serxwebûn***ê, re ket koalîsyonê. Digel matmayîna alîgirên xwe, serekên SDAyê sozên xwe yên berîya hilbijartinan avêtin derekê û wan piştgirî da berfirehbûna sektora fînansê, ku berdewam dikir.

## Çareserî: Riyeke nêdîtî ji bo xwe gihandina pereyê neqt (lîkîdîte) bêyî ku hebûnên rastî (aktîfên reel) wekî temînat bên nîşan dan

Ew di krîza piçûk ya 2006ê de hilneweşîyan, lê belê ***Landsbanki, Kaupthing*** û ***Glitnir*** berdewam bi tengasîyan re rû bi rû man ku bikaribin pereyan peyda bikin daku ji bo kirîna hebûnên xwe yên malî fonê bibînin û deynên xwe bidin, ku piranîya wan ji ser pereyên bîyanî hatibûn hesab kirin. Bankayan daku pirsgirêkê çareser bikin, du rêbaz kifş kirin. A yekemîn, ku serkêşîya wê ***Lansbanki*** dikir, *Icesave* bû, xizmeteke li ser Înternetê ku mebesta wê ji bankayên din kêmtir bi pêşnîyarkirina rêjeyên cazibtir ên faîzê berhevkirina deposîtên firotina perakende bû. *Icesave*, ku di cotmeha 2006ê de li ***Brîtanya***yê hat dest pê kirin û 18 mehan bi şûn de jî li ***Holland***ayê, bala malperên fînansê yên Înternetê yên '*best buy'* (kirîna herî erzan) kişand û di demeke kurt de depozîto bi ser re çûn. Bi dehan mîlyon pound ji ***Zanîngeha Cambridge***, ji *Mudiriyeta Emnîyetê ya Londonê* û hetta ji Komîsyona *Venihêrtina Malî ya Brîtanyayê,* ku karê wan çavdêrîya fonên rêvebirîyên herêmî ye û herweha ji bi sed hezaran takekesan hatin (*Bi tenê li Brîtanyayê 300.000 depozîtorên Icesave hene*).

Dema ku hejmarên li ser ekranên komputurên wan weha bilind dibûn, xebatkarên ***Landsbanki*** bixwe jî bi talîha xwe ya baş bawer nedikir. Ev hatina pereyan hişt ku banka deynên xwe bide û bêhtir hebûnên malî bikire. Rastîyek hebû ku dezgehên *Icesave*yê ji hêla hiqûqî ve wekî *'şirketên têşik'* wekî *'şaxan'* hatibûn ava kirin û diviya li jêr çavdêrîya karbidestên îzlandî de bin, ne ya şirketên xwe. Lê belê tu kapasîteyên nebûbû ku ajansa aranjekirinê ya îzlandî, dergevanê avahîyê jî tê de, bi tenê xwedî 45 xebatkaran bû, ku piranîya wan li wê derê staj dikir ku tev li bankayekê bibin. Tu kesî ew qas fikar nekir -ji ber mukellefîyeta Îzlandayê yên wekî endameke *Hêrêma Aborî ya Ewropî* ji bo tarîfeya sîgortaya despozîtoyan- heger pirsgirêkek derketaya gelheya wê ya 320.000 kesan dê ji bo tazmînata depozîtorên derveyê welêt berpirsîyar bibûya, her çend hisedarên ***Landbaski*** sûdên waadeyên kurt bi dest xistibûn jî.

'Çareserîya' duyemîn ji bo tengezarîyên bankayên îzlandî, ku di peydakirina fonan de rû bi rû diman, wekî '*nameyên evînîyê*' derket pêş -rêyeke nêdîtî ji bo xwe gihandina pereyê neqt (lîkîdîte) bêyî ku hebûnên rastî (aktîfên reel) wekî temînat nîşan bidin. Her sê bankayên mezin ji ber ku kapasîteyên xwe yên deynstendinê ya ji *Bankaya Navendî ya Îzlandayê* tije kiribûn, senedên deynan, ku di destê wan de bûn, dê bifrotana bankayên herêmî yên piçûtir, ku wan jî ev sened bibirana *Bankaya Navendî* û bêyî ku temînateke din nîşan bidin, li dij wan ji *Bankaya Navendî* pere deyn bikirina; paşê jî bi deyn bidana bankayên mezin, ku sened jê derketibûn. Ev sened di bazirganîyê de pir bi lez wekî *'nameyên evînîyê'* hatin bi nav kirin -di wateya bi tenê soz dayînê de. Van bankeyan paşê ev pêvajo kir navneteweyî. Bi xêra budçeyên xwe yên *'hêzdar'* her sê bankayên mezin li ***Luksemburg***ê şirketên piçûktir ava kirin û ev *'nameyên evînîyê'* firotin wan. Van şirketên piçûk jî name firotin *Bankaya Navendî* ya ***Luksemburg***ê yan jî *Bankaya Navendî ya Ewropî* û beramberî wan pereyê neqt stendin, ku dikaribûn vî pereyî bişînin bankayên dayîk ên li Îzlandayê, yan jî bixwe bi kar bînin. Di navbera sibat û nîsana 2008ê de, deynê ***Kaupthing*** û ***Glitnir***, ku ji *Bankaya Navendî ya Luksemburgê* stendibûn, gihîşt 2.5 mîlyar €; heta dawîya hezîranê 2 mîlyar €yê din jî li ser miqdarê zêde bû. Helbet diviya bû ku tu bankayên navendî -ne ya ***Îzland***ayê, ne ya ***Luksemburg***ê ne jî ya Ewropî- ji ber girêdana van bankayan a bi hev



MÎRÊ HÊKAN: **Nûderîn**, (1993) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê, 120 x 60 x 8 cm

du re, deynên bankayeke îzlandî ji bo deynkirina bankayeke din wekî temînat qebûl nekirina. Bi awayekî berbiçav, herî kêm yek ji van bankayên mezin, ***Glitnir***, ji bo senedên xwe ji ajanseke derecekirinê ya kredîyan a li ***DY***ê dereceya ***AAA*** stendibû, ku ev derece ji ya Îzlandayê bixwe jî bilindtir bû.

### Paşê króna ket û wekî kevirekî noqî avê bû

Hilweşîna bankayên îzlandî du hefte piştî hilweşîna ***Birayên Lehman*** pêk hat. Roja 29ê îlonê, ***Glitnir*** muracaetî mudîrê *Bankaya Navendî Oddsson* kir û ji bo pirsgirêka xwe ya lîkîdîte, ku her ku diçû mezintir dibû, alîkarî xwest. Daku bi-xwe-ewlebûnê dubare peyda bibe, **Oddsson** ferman da *Bankaya Navendî* ku % 75ê hiseyên ***Glitnir***ê bikire. Vê yekê bandor li bilindbûna ***Glitnir*** nekir, lê belê li qelskirina pêewlebûnê ya li Îzlandayê kir. Dereceyên welêt ser û bino bûn û xetên qedemeyê yên kredîyê yên ***Landsbanki*** û ***Kaupthing*** hatin vekişandin. Reveke ber bi şaxên Icesaveyê ya li derveyî welêt dest pê kir. Piştî ku hilweşînê leza xwe zêde kir, di cotmeha 2008ê de ***Oddsson*** bi hemleyekê pereyê ***króna*** di nav pereyan de nêzî buhayê wê ya berîya krîzê sabît kir. Di rewşeke weha de, ku pereyê welêt ji zû de têk çûbû, rezervên pevguhertînê ya dovîzan qedîyan û êdî di kontrola wan de tu sermîyan nemabû. Sabîtkirina buhayê pere bi tenê çend saetên ticarî dom kir. Dibe ku ev yek di dîrokê de kurttirîn sabîtkirina buhayê pere bû, lê belê demeke bi têra xwe dîrej bû, ku heval û hogirên wî krónayên xwe bi buhayên baş bifiroşin. Çavkanîyên navxweyî diyar dikin ku bi mîlyaran pere di nav van saetan de ji króna revîyan. Paşê ***króna*** ket û wekî kevirekî noqî avê bû. Di 8ê cotmehê de **Gordon Brown** zor da ku hebûnên ***Landsbanki*** yên li Brîtanyayê li jêr qanûnên li dij terorê yên ***New Labour*** bên cemidandin. Borsa, bonoyên bankayan, buhayên xanîyan û deramedа naverast dest bi ketina serbest kir.

### Hikûmet ji hev bela dibe

Di Cotmeha 2008ê de ***IMF*** hat ***Reykjavik***ê daku programekê ji bo xilasbûna ji krîzê amade bike. Piştî *Brîtanya*yê ya sala 1976ê, ev cara pêşîn bû ku *IMF* ji bo rizgarkirinê bo welatekî pêşketî hatibû vexwendin. IMFyê bi şert deynekî 2.1 mîlyar dolaran pêşnîyar kir daku krona bigihîje îstîqrarê û daku piştgirî bide daxwazên hikûmetên *Brîtanya* û *Holland*ayê, ku divê *Îzlanda* mukellefîyetên xwe yên ji ber tarîfeya garantîya depozîtoyan bi cih bîne û ji ber ku wan depozîtoya Icesaveyê bi kefalet serbest berdane, tazmînatê bide wan. Gelheya sakîn ku bi xerîtanê re bi rê ve diçû, bi hêrseke mezin li hember vê yekê rabû û herçend wezîrê kar û barên derve yê ***SDA***ê ***Gisladóttir*** jî hat guman kirin ku lewîtîye jî, nemaze li dij ***Haarde, Oddsson*** û heval û hogirên wan ên *Partîya Serxwebûnê* xwepêşandanên protestoyî li dar xistin. Di rojên şemîyê yên sar û qerisî de piştî nîvroyan bi hezaran kes ên ji her temenî li mezintirîn qada *Reykjavik*ê hatin cem hev. Xwepêşandanan mil bi mil parlamento di nav daîreyekê de dorpêç kir û xwest ku hikûmet dest ji kar bikişîne û mast û fêkî avêtin avahîyê.

### Heta îro hikûmeta Îzlandayê tenha hikûmet e ku ji ber krîza malî îstîfa kiriye

Di dawîyê de, di sibata 2009ê de, koalîsyona ***IP-SDA*** ji hev ket. Heta îro, hikûmeta *Îzland*ayê tenha hikûmet e ku ji ber krîza malî îstîfa kiriye. *Îzlanda* herweha tenha welat e ku piştî îlona 2008ê bi tûjî ber bi çepgirîyê ve çû. Piştî ku *Partîya Serxwebûnê* bi giştî îtîbara xwe wenda kir û di hilbijartinan de gelek li dû *SDA* û *Tevgera Çepgir-Keskan* de ma, ku nû bûbû populer, di sibata 2009ê de hikûmeteke demkî ya *SDA-LGM* hat ava kirin daku heta hilbijartinên nîsanê welêt bi rê ve bibe. Herçend sîstema hilbijartinê bi awayekî aşkere di lehê wan de bû jî di hilbijartinan de hejmara kursîyên *Partîya Serxwebûnê* ket 16an, ku ev yek ji damezirandina wan a sala 1929ê ve xerabtirîn encam bû.

Hikûmeta *SDA- LGM* li jêr fişareke tund de bû ku deynên Icesaveya rûxandî bide, wekî ku hikûmetên *Brîtanya û Hollandayê* daxwaz dikir; piranîya deynê ku ji alîyê IMFyê ve hatibû dayîn heta ku ***Reykjavik*** şertên wan qebûl kir, nehat berdan. Hikûmeta nû herweha di warê muraceata endametîya giştî ya *Yekîtîya Ewropî* û *Eurozone*yê de di nav xwe de li hev nedikir, -*SDA* bi tundî piştgirîya endametîyê dikir. Piştî muzakereyên dûr û dirêj, hikûmetê di cotmeha 2009ê de şertên ku wan ji bo paş de dayîna deynê *Icesave*yê qebûl kirine, pêşkêşî parlamentoyê kir: 5.5 mîlyar Euro, an ku % 50yê GDPya Îzlandayê, di navbera 2016 û 2023ê de dê bidana xezîneyên *Brîtanya* û *Holland*ayê.

Di hundirê ***LGM***ê de hin problem hebûn, -Wezîrê Tenduristîyê yê Partîyê wekî prostesto dest ji kar kişand û 5 dijberan jî red kir ku digel hikûmetê deng bidin. Li hember nerazîbûnên bilind ên li welêt ev belge di 30 berfanbara 2009ê de ket merîyetê. Piştî hefteyekê, di 5ê rêbendana 2010ê de serok ***Grímsson*** ragihand ku ji ber rêzgirtina li hestiyarîya li welêt, ew dê qanûnê îmze neke. Dema ku di 20ê adara 2010ê de *Icesave* bi referandûmekê re ji dengdanê re hat danîn, % 93yê beşdaran got ***Na***, kêmtirî % 2yê got ***Erê***. Serekên *SDA- LGM* jî neçûn dengdanê. Di hilbijartinên şaredarîyê ya ***Reykjavik***ê ya gulana 2010ê de *SDA*yê bi % 19ê winda kir. Komedyenek wekî şaredarê bajêr hat hilbijartin.

Heta 2011ê paşxistina tedbîrên tasarrûfê yên giştî, bêhnvedanek da aborîya welêt. Heta niha di ***GDP*** û kardîtinê de li gor ***Îrlanda, Estonya*** û ***Letonya***yê, ku wekî patozê, çavkanîyên giştî dihêrin, ketinên piçûktir rû dan. Rêjeya bêkarîyê, ku di 2006ê de % 2 bû, ji destpêka 2009ê ve di navbera % 7 û 9ê de aliqî; lê belê rêjeya îzlandî û karkerên din ên ewropî (ku pranîya wan polonî ne), ku koçî derveyî welêt kiriye, ji sala 1889ê û vir ve di rêjeya herî bilind de ye. Lê belê, hikûmeta *SDA- LGM* ji bo sala 2011ê di lêçûnên giştî de tedbîrên tûj ên tasarrûfê ragihandin. Ji bo projeyên nû tu budçeya rêveberîyên herêmî nîne. Nexweşxane û dibistan heqdestan kêm dikin û dest bi ji kar derxistina xebatkaran dikin. Cemidandina li ser dubare bidestxistina xanîyan di dawîya 2010ê de qediya.

Cotmeha 2010ê parlamentoyê biryar da ku serokwezîr ***Haarde*** ji ber binpêkirina berpirsîyarên serokwezaretîyê tewanbar bike. Doza li dij wî li ***Landsdómur***ê, li cem *'Dadgeheke Bilind'*, ku berê tu caran nikaribû vehewe, derdest e. Sekreterê daîmî yê darayîyê (berê jî endamekî koma Lokomatîf bû) ji ber ku di îlona sala 2008ê de, bi tenê du rojan piştî hevdîtina li ser bankayê ya digel Wezîrê Darayîyê **Alistair Darling** a li ***London***ê, di firotina hiseyên xwe yên ***Landsbanki*** de agahîyên navxweyî ji bo berjewendîyên xwe bi kar anîne, ji bo du salan hat ceza kirin. Ji **Oddsson** hesab nehat pirsîn, lê **Bereks** di îlona 2009ê de bi gerînendetîya giştî ya *Morgunblaðið* rojnameyeke mezin a *Reykjavik*ê hat xelat kirin, ku berê jî li cem vê rojnameyê nûçeyên li ser krîzê kontrol dikirin -wekî ku şirovenivîsekê diyar kiribû ku, wekhevîyeke ne ji sedî sed be jî, wekî ku di dema ***Watergate***ê de **Nixon** bibûya edîtorê ***Washington Post***ê. (6)

### Dezgeha dewletî ya îstatîstîkan, nediwêrî balê bikişîne ser nelirêbûna parvekirina deramedê û serweta neteweyî

Dibe ku hatibe bawer kirin ku wezna piçûk a Îzlandayê wê yekê hêsantir bike ku li hember redkirina hikûmetê ji bo pêşîlêgirtina krîzê nerazîbûn bê nîşan dan, lê weha nebû, berevajîya wê bû. Hikûmeta **Oddsso**n agahî bi tûjî *'arizî'* kiribû, ku piranîya agahî jî beşên lêkolînê yên bankayan a li ser aborî û bendewarîyên wan bixwe dihatin. *Enstîtuya Aborîyê ya Neteweyî ya Îzlandayê* xwedî îmajeke fikir û ramana serbixwe bû û li hember serokwezaretîyê berpirsîyar bû, rapor wedişandin, ku hikûmet jê nerazî bû û sazgehê di raporan de hişyar dikir ku aborî ber bi xerabbûnê ve diçe. **Oddsson** di 2002ê de ev dezgeh rakir.

Îstatîstîk, Îzlanda, dezgeha dewletî ya îstatîstîkan, nediwêrî ku balê bikişîne ser nelirêbûna parvekirina deramedê û serweta neteweyî. *Zanîngeha Îzlandayê* jî serî li ber fişaran danî daku navenda xwe weha bike ku bikaribe debara xwe bi xwe bike -an ku her tim lêkolînên ku jê dihat xwestin encam didan- ku lêkolînên bi encamên li gor daxwazan diweşandin û êdî raporên rexnegir nediweşandin. (helbet mînak dikarin li hin derên din bên dîtin.) Hevdem, *Îndeksa Têgihiştina Gendelîyê* ya *Transparency International* (Rêxistina Şeffafîyê ya Navneteweyî) her berdewam dikir ku Îzlandayê di nav rêvebirîyên herî paqij a cîhanê nîşan bide, û serbilindîyek e ku bi ***Zellandaya Nû*** û ***Fînlandîya***yê re par ve dikin.

Bi demê re nepox her ku çû mezintir bû. Dema ku ew cara pêşîn nepixî, raporên rexnegir hatin weşandin; qet nebe ***Bankaya Navendî*** weşand. Lê belê heta 2007 û 2008ê, dema ku xeter bûn rastî, rapor, ku di nav de yên ***IMF***ê jî hebûn, zimanê xwe ji nişka ve nermtir kir. Weha xuya dike ku dezgehên fermî yên aborîyê û herweha yên banker û siyasetmedaran, bi têgihiştinekê tevgerîyan ku rewş êdî hesas e û heger der barê wê de bipeyivin, ev yek dê bibe sedem ku xelk ji bankayan bireve û bi vî awayî dikarin pêşî li vê revê bigirin. Nûçeyên xerab diviyabûn her tim dûr bihatana hiştin û kesên ku israr dikirin ku vê yekê pêşkêşî xelkî bikin, divê wekî xerapker û nezan bihatana nîşan dan.

Biryara hikûmeta ***IP- SDA*** a dayîna garantîya bêsînor a piştî şkestinê, dilsozîya wê ya bi elîtên aborî nîşan dide. Hikûmetê garantî bi 5 mîlyon krón, an ku kêm zêde bi 50.000 euroyan bi sînor kir, daku % 95ê hemû depozîtoran bixe jêr ewlekarîyê; û bi tenê % 5ê wan ji garantîya bêsînor sûd wergirtin, ku ev yek jî bû sedem ku niha ji bo lêçûnên giştî tedbîrên tassarûfê bên sepandin.

Biryara tazmînkirina pereyên depozîtorên îzlandî bi pereyên derveyî derameda bacan, xwedî encamên ciddî ne. Vê yekê hişt ku hikûmet bi wan daxwazan re rû bi rû bimîne ku ew pereyên hemû depozîtorên bîyanî yên Icesaveyê bi giştî tazmîn bike, yan na ew bi cudagerîya li dij hevwelatîyên bîyanî hiqûqa ewropî bin pê bike. Digel hemû pirsgirêkên ku piştî şkestina 2008ê rû dan, ***Icesave*** ew mijar bû ku hikûmet, parlamento û gelê îzlandayê ji yên din bêhtir westandin.

* Li *London School of Economics* profesora aborîzanîya polîtîk e. Ev nivîs, ji gotarên wê yên konferansên ku bi navê "*Polîtîkayên Gelemperî yên Îzlandayê"* dayî hatiye rojanekirin û jinûvesazkirin. New Left Review, no 65, London, Îlon-Cotmeh 2010

1 *World database of happiness*, (Doneyên bextîyarîyê yên cîhanê) 2006, http://worlddatabaseofhappiness.eur.nl

2 Bixwînin "Le krach du libéralisme", (Têkçûna lîberalîzmê) Manière de voir, (Awayê nihêrtinê) no 102, Kanûn 2008 – Çile 2009

3 *Partîya Gelê Min*: Di muxalefetê de bi taybetî partîya sosyaldemokrat û partîya kesên ji rêzê tê dîtin û bêtir wek partîyek çepgir tê naskirin

4 Hannes Gissurarson, "Miracle on Iceland" (Mûcîzeya li Îslandayê), TheWall Street Journal, New York, 29 Çile 2004

5 Danske Bank, "Iceland: Geyser Crisis", (Island, Krîza Gayzerê) Copenhague, 2006

6 Piştî binketina Îlona 2008an, Mishkin, bi dizî li ser CVya xwe navê xebata xwe ya "Îstikrara Fînansî ya Îslandayê" guhert û navê rapora xwe kir, "Bêistiqrarîya Fînansî ya Îslandayê"

7 Arthur Laffer, "Overheating is not dangerous" (Germahîya zêde ne xeter e", Morgunbladid, reykjavík, 17 Çirîya Paşîn 2007

8 Ev hevkarî, ji Partîya Sosyaldemokrat, Lîsteya Jinan û fraksîyoneke Hevkarîya Gelêrî pêk tê. Ji baskê çepgir tê, di heman demê de hem NATOyê û hem jî Pakta Warşovayê rexne dike

Wergera ji îngilîzî: Celîl Kaya

Malpereke mezin a hevpar ji alîyê dêwekî înternetê ve hate kirîn

# Îxaneta li hember *Huffington Post*ê

Rodney Benson *

Çend blogerên kevn yên dilxwaz, meha nîsanê qerar dan da ku li hember Huffington Postê mahkeme vekin, ev malpera amerîkî ku wan bi cîh kiribû û ji bo pêşvebirina vê malperê wan jî xebat kiribû.Van blogeran li hember firotina malperê ku ji alî America Online ve hatibû kirîn derdiketin û 105 milyon dolar dixwestin. Çawa medya-pêşeng, ya çepê Amerîkayê, di nav deh salan de, xwe guhert û bû yek ji navenda qezencê ya pirneteweyî.

Bihara piştî ku **George W. Bush** di duyemîn hilbijartinên serokatîyê de têk çû, *Partîya Demokrat* a mirûzxerab bi awayekî ecêb hevgirtinek ava kir. Karîyera vekirî ya **Arianna Huffingston** di alîyê *Komarperwer* a maseyê de dest pê kir. Di salên 1990ê de, piştî ku mêrê wê (ku niha hevdu berdane) ket hilbijartinên Senatoya Dewletên Yekgirtî û bi ser neket, Huffington bû endameke qidemdar a '***think thank***' [Dezgeha Fikr û Ramanê] a Serokê Koma Komarperweran **Newt Gingrich**. Projeya wê ya pêşîn a Înternetê *Resignation.com* bû û vê malperê hewl dida ku piştî rûdana 'Monica-Gate' li derveyî meqamê wî dû serok **Bill Clinton** bernede.

Heta destpêka salên 2000ê sîyaseta wê ber bi çepgirîyê ve çû û di 2004ê de ji bo serokatîyê piştgirî da **John Kerry**ê Demokrat. (1) [Malpera] *The Huffington Post* di gulana 2005ê dest pê kir û wekî alternatîva [Malpera] "*Drudge Report,"* pir bi lez bû peyvgeha çepgiran li hember rastgiran. Hîn ji destpêkê ve, pir li ser ***HuffPo*** hat peyivîn; ne bi tenê ji ber sîyaseta wê, lê herweha ji ber naveroka wê –şandîyên tev li hev ên bloggeran (zêdeyî 15.000), 'berhevkirina' naverokên ji dezgehên din ên çapemenîyê (bi binxêzkirineke berbiçav ji bo seks û navdaran) û hin naverokên resen ku ji kargerên edîtoryal, ku hejmara wan bi ser 100ê ketîye– çapemenîya 'serwetmend' hesûd bû û ew ji xwe re kir hedef. Hejmara kesên ku ew malper dixwend di destpêka 2008ê de 1 mîlyon hatibû hesab kirin lê ev hejmar di destpêka 2011ê de firîya 25 mîlyonan û malper ket nav 10 malperên nûçeyî yên herî populer ên DYAyê.

Bi demê re the ***Huffington Post*** pêşengîya têkoşîna li dij şerê Iraqê kir û di serî de ***New York Times***, ku derewên rêveberîya **Bush** a sebaret bi çekên komkujîyê weşandibûn, çapemenî digel *Navenda Nûçegihanîya Lêkolîner*, ku xwedîya mebestên aborî nîne, hevkarî kir û ji bo amerîkîyan bangek weşand ku pereyên xwe ji bankayên mezin yên ku bûbûn sedema krîza aborî bikişînin daku stratejîyên wan ên darayî şermezar bikin.

## Bilindbûna bêsebrîya sermayederan

Diviya ne suprîz, ne jî hêvîşkenandinek bibûya dema ku **Arianna Huffington** vê sibatê ragihand ku şirketa Înternetê ***AOL*** (*American Online* ya berê) dê the *Huffington Postê* bi 315 mîlyon dolaran bikire. (2) Her çend HuffPo di 2008ê de di Konvensîyona Demokratîk a Neteweyî de sponsorîya koneke populer kiribû jî, ku tê de mûmîk û masajên piştê hebûn, Huffington ji herkesî re digot ku malper dê bi tenê bi sîyasetê re têkildar nebe. (3) Di 2010ê de malper kara xwe ya pêşîn bi dest xist –30 mîlyon dolar– û xelkê pistepist dikir ku kapîtalîstên muteşebbis, ku ji bo mezinbûna HuffPo pere dabûn, dixwest wê bifiroşin û bikin pere.

Lê belê hêvîşkestinek hebû. Û muhasebeya navxweyî jî. Firotin dibe sedema peydabûna pirsan, herçend versîyona nû ya Arianna Huffington gavên xwe yên nû pir hêdî diavêje jî: Di şopa prensîpên siyasî û rojnamegerîyê de, ji bo ku xwe bigihînin pirtir kesan çi qas dikare were qurbanî kirin? Di navbera gotin û tevgeran de divê çi têkilî hebe? Û encamên demdirêj a rojnamegerîya amerîkî dê çawa be heger weha berdewam bike ku bi kêrî wan şirketan were yên ku reklaman didin, herweha bi kêrî muteşebbisên bazara serhev û bi awayekî berfirehtir çanda reklamê ku li ser serfkarîyê ava bûye?

Di 9ê sibatê de di dema danûstandina bi AOLê re **Arrianna Huffington** ji *Washington Postê* re got *"Dem hatiye ku em pêşîya çepgirî û rastgirîyê kevin."* (4) Wê peyv bi peyv ew tiştên ku berîya deh salan, dema ku ji rastgirîyê derbazî çepgirîyê bûbû gotibûn, dubare kirin.

Bi tenê çend hefte berê, nivîskarê kedkar **Mike Elk** di nav wan kesan de bû, yên ku cara pêşîn lê hay bûbûn ka wateya siyaseta piştî-pêşveçûnê ya Huffington çi bû. Elk li Washingtonê alîkarîya 200 endamên sendîkayê kir daku bi ser konferansa *Komeleya Bankerên Mortgage* de bigirin û suîstîmalkirina fonên hikûmetê ya ji alîyê serkêşên kombûnê ve protesto bikin.

Dema ku derket holê ku Elk hiştibû ku endamên sendîkayê karta wî ya çapemenîyê bi kar bînin daku bikevin konferansê ev 'kêmasîya profesyonelî' ji alîyê edîtorê karsazîyê **Peter Goldman** ve, ku nûçegihanê berê yê New York Timesê bû, ji bo bi heq nîşandana ji kar avêtina Elk hat bi kar anîn. Di çavê Elk de li cem HuffPo xeta navbera rojnamegerî û çalakvanîyê tu caran weha tûj nebûbû; lê dawîya dawî fîlmsaz **Michael Moore**, ku ji bo wî asêbûn, ji bo pêvajoyeke afirînêr parçeyekî gelek girîng bû, bloggerekî timî yê HuffPo bû. Ji bo wî pirsgirêka mezintir a etîkê –sûcên îddiakirî yên bankeran, ku bi tenê ji ber protestoyê derketin holê, li alîyekî –ew e ku nûçegihanekî tim-demî yê jîyana kedê yê Huffington Postê tunebû (û hîna jî tuneye) Berî ku ji kar bê avêtin Elk endamê artêşa bloggeran bû ku tu pereyan nastînin.

Piştî mijara firotina bo AOL, bloggerên din tev li Elk bûn û wan xwest ku nivîskara pirtûka *Amerîkaya Sêyemîn: Sîyasetmedar Çîna Naverast Çawa bi Tenê Dihêlin û Îxanetê li Xewna Amerîkî Dikin* (Pirtûka Huffington ya 13emîn) (5) li gor tiştên ku nivîsandine tev bigere. Çavkanîya Hunera Dîtbarî, kollektîfeke nivîskaran, û li dû wan Rojnameya Neteweyî *Guild* banga grevê kir.

Bersiva Huffington? *"Fermo, herin grevê bikin –lê tu kes dê guh nediyê."* Helwêsta wê ji zû de weha bû ku blogger ji ber karê xwe dîtbar in û ev yek bi têra xwe ji bo wan tazmînatek e, ku ev yek bi tenê piştî firotina malperê çend qat zêde bû. Wekî parçeyekî AOLê, hejmara xwendevanan bi giştî li DYê mehane dê bibe 117 mîlyon û li seranserî cîhanê jî weha tê guman kirin ku bigihîje 250 mîlyonan. Bi qewlê Huffington: *"Em ji trênekê peya dibin û li jetekê siwar dibin, ku ji deng bi leztir diçe."* (6)

Nivîskarên girîng, ên wekî quncik-nivîsê berê yê *Los Angeles Times* **Robert Scheer** heman argumentê ji bo piştevanîya wê anî zimên. Çalakvanê **Latîno Roberto Lovato**, ku dema pêşîn firotina bo AOL bihîstibû ji ber navdarîya AOLê bo muzafazakarîyê, hêvîyên wî şkeştibûn, tiştên xeyalî îddîa nekirin: *"Arianna hertim xerîkî guherîna navxweyî bû"*. Ji bo projeyên wî yên polîtîk tu kes li ser bikêrhatîbûna Huffington Postê nikaribû gengeşe bike, dema ku wê bi awayekî serkeftî ji ber helwêsta wî ya daîmî ya li dij koçberan fişar li ser CNNê kiribû ku pêşkêşvanê bernameyeke siyasî **Lou Dobbs** ji kar biavêje.

Bi kurtî, armancên siyasî yên hin kesan çi dibin bila bibin, ji bo bloggeran derfeta xwe gihandina ew qas mirovan faktoreke biryardar e, nemaze ji bo nivîskarên rûniştî yên wekî **Scheer** û **Lovato**, daku bikaribin debara xwe bikin, pêdivîya wan bi mûçeya ji Huffington Postê nîne. Heger Huffington bloggeran bi kar tîne, blogger jî wê bi kar tînin. Lê belê ji vê peymanê, ê ku pirtir sûdê werdigire kî ye? Û encamên demdirêj ên vê cure 'rojnamegerîyê' çi ne?

Naveroka wê ku xwe dispêre ewqas bloggerên ku bê pere dixebitin dikare bibe helwêsteke maqul ji bo ***HuffPo***, ku ew karekî weha pîneyî encam bide. Piştî ku ***Arianna*** sûd jê wergirt, naskirin û xelatkirina rista bloggeran di giranbûhakirina markaya HuffPo de, dê dijwartir be, ku were paşguh avêtin. Dema ku Blogger **Mayhill Fowler** ji bo axaftinên namzedê serokatîyê **Barack Obama** yên li ser 'dilsozîya bi çek û olê re' dîtinên 'rojnamegerê hevwelatî' diyar kiribûn, malperê navdarî bi dest xistibû. Dora sed blog piştre –piştî ku HuffPo ji bo cara duduyan karê **Fowler** ji bo ***Xelata Pulitzer*** namzed nîşan da û paşê jî çend bar û bi awayekî sernekeftî hewl da ku ji bo nivîsên wê pere bide Fowler– Fowler dest ji kar kişand, ku edîtorê HuffPo bi tundî bersiva vê yekê da: *"Tu çawa dikarî ji karekî dest bikişînî ku te tu caran bi dest nexistibû?"* (7) Xeta navbera nivîskarên ku pere distînin û bloggerên ku pere nastînin hîna jî ne diyar e. Blogên Mike Elk hingî pir bûn (bi giştî 105) û bi nûçeyên rêk û pêk tije bûn, ku piranîya xwendevanên wî bawer dikir ku ew kadroyê bi maeş ê Huffington Postê bû; di nav rêxistinê de jî wî carna ji bo blogên xwe yên belaş bi edîtorên nûçeyan dişewirî.

Lê belê di dawîyê de, pisgirêka mezin ew e ku modela 'nû' ya rojnamegerîyê ya *Huffington Post*ê herçend cih dide dîtinên çepgir û pêşketinperweran jî, ew parçeyek û qadeke dubare-feodalîzasyona berfireh a pergala civakî û aborî ya amerîkî ye. Li gor 'Rapora Rewşa Çapemenîyê' ku di demeke nêzîk de ji alîyê *Weqfa Pew* ve li ser Înternetê hat weşandin, di nav deh salên çûyî de zêdeyî ji sêyekê rojnamegeran ji kar hatin derxistin, ku ya 10.000ên ji wan di nav sê salên dawîyê de pêk hat.

Di gotareke rexnegir a tund a bi navê "Şêlankarîya Huffingtonê" de, ku di malpera ***truthdig.com*** de hat weşandin, nûçegihanê berê yê *New York Times*ê û endamê qidemdar ê *Enstîtuya Neteweyî Chris Hedges* weha nivîsî:

*"Maskeyên wan xuya dike ku mebestên wan ên sîyasî çi dibe bila bibin, kesên ku karkeran bi kar tînin daku ji vê girseyê sûdê werbigirin, endamên daimî yên çîna mêtînger in. **Karl Marks**ê xwe ji refan derxin. Ew dijminên jin û mêrên karker in. Û ew herweha, di vê rewşê de, xwîna jîyanê ya pîşeyekê dimijin, ku ez pir girîngîyê didimê."* Wekî bersiva wê argumanê ku digot bloggerên HuffPoyê 'xwedîyên alternatîvekê bûn' **Hedges** dinivîsîne ku ev yek heman arguman e ku ji alîyê *"mudîrên xwêdanxaneyên (kargehên ku xelkê pir didin xebitandin û gelek kêm pere didin) li Komara Domînîk û Meksîkayê, şirketên komirê yên li Virginia ya Rojava û Kentuckyê û çewlikên qirase yên mirîşkan ên li Maine (...) ve dihatin pêşniyar kirin. Ev argumanek e ku elîtên serwetmend, ku xwe di pergaleke olîgarşîk de bi çîmento zeliqandine, ku tê de hilbijarokên rastî nînin, bi kar tînin da ku zexta xwe biheq derxin."* (8)

## Feodalîzma dîjîtal

**Anthony de Rosa**, mudîrê berheman ê *Reuters*ê, peydabûna ekosîstema agahîyan ku ji alîyê *Huffington Post* û medyaya wê ya civakî û pismamên amator ên wekî Facebook, Twitter û malpera blogan Tumbler ve dihat domîne kirin, wekî 'feodalîzma dîjîtal' bi nav kir: *"Teknolojîyên van malperan dilê mirovan dibijînin û vexwendkar in ku mirov tê de tevkarîyê bike. Da ku hût dermale bikin, me dixin şûna ehmaqan, di dawîyê de ji bo kesên din nirxan pêk tînin."* (9) Dema ku dem û bal çûn ser van malperan, reklam jî zûka li dû wan çûn. Encam –her ku diçe modela reklamgerîyê hakim dimîne– veguherîneke tûj a naverokê nîne û 'nûçeyên' teşwîqkar ên bilez û erzan çêdikin û ji bo wê jî teknîkên hilbijartinê yên motorên lêgerînê bi kar tînin. (10)

AOL li enîya pêş a van teknîkan e, ku di gîrêdaneke daxuyanîyê ya 'ji nav karsazîyê' ya malperê ya bi navê '*AOL Way'* de xuya dibe. Wekî ku rojnamegerekî anonîm ê AOL ji nav karsazîyê diyar kiribû *"AOL Way piranî ji bo zêdekirina dengî ye û bi berfirehî jî bi riya manuplasyona teknolojîyê û hewlê dide ku her bi awayekî serbixwe ji kalîteya wê 'parçeyekî naverokê' heta dawîyê biguvêşe daku jê sûdê werbigire."* (11) Dema ku daxuyanî hat weşandin, Huffington bi awayekî aşkere bêdeng ma û serokê AOLê **Tim Armstrong** guh neda rexneyên ji çapemenîyê û diyar kir ku *"Şirketên ku li ser Înternetê kar dikin, dibêjin ku 'Em her roj weha kar dikin'"*

Di civîna hevbeş a çapemenîyê de, ku tê de peyman hat aşkere kirin, Armstrong got, *"Arianna jî wekî me xwedîya heman berjewendîyan e, ku di xizmeta pêdivîya bikarhêneran de ne û ji pêdivîyên rasterast ên sîyasî yên mirovan wêdetir in."* (12) Huffington hewl dida, diyar bike ku nûçeyên siyasî bi tenê bala bi kêmî % 15ê xwendekarên malperê dikişîne, ku ev rêje di salên destpêkê yên malpêrê de % 50 bû. Ev rê guhertina ber bi nûçeyên nepolîtîk ve bi rastî jî di 2008ê pêk hat daku bala bêhtir dolarên reklaman bikişîne.

Ji bo demekê, ev talebên pîyasayê ku pir nedihat guh dan, bi mebestên tevgereke siyasî re di nav lêkdanê de bûn. Huffington, oportunîsta xweşbîn, şanşê xwe bi dest xist. Quncikniv̂îsê Washington Postê **Dana Milbank** piştî ku Huffington ji çalakvanîya çepgirîyê derbasî patronîya medyayê bû, weha şirove kir: *"Her kesê/a çav lê ye ku* [Arianna Huffington] *berdewam bike ku bibe dengekî hêjayî bawerîyê yê çepgirîyê xwendekarê/a feqîr ê/a dîroka Huffingtonê ye."*

Piştî firotinê, pêngava AOL û HuffPoyê, ku rojnamegerên profesyonel girtin kar, ku piranîya wan ji dezgehên mezin ên medyayê bûn (*main stream media*) û *New York Times* jî di nav wan de ye, herçend ji gelek alîyan ve pêngaveke erênî bû jî, bi tenê guherîna ber bi rastgirîya-navendî pêk anî. Bloggerên pêşketinperwer divê bi awayekî ji xwe bipirsin ka ew li ser malperê ne daku dîtinên xwe di nav xwendekaran de belav bikin, yan jî li ser malpereke weha, ku ji şirketên din ên karsazîyê ferqa wê nîne, wê dîmena pirrengîya îdeolojîk bidin.

Pirsgirêka medyaya amerîkî wekî zêde-tîcarîbûnê dimîne, ji her neteweyekî din ê li ser rûyê erdê –ku xwe bi giştî dispêre debara ji reklaman, xwedîyên ji Wall Streetê ku sûda herî zêde pêştirî ya wan a bilind e û karûbarên mevzuatî ku firotin û destguhertina dezgehan teşwîq dike, ku piranîya medyayên sereke xistiye nav deynên mîlyar dolaran. Wekî ku Weqfa Pew jî tespît kiriye, ev yek sedemên mezin ku 'krîza rojnamegerîyê' li Amerîkayê ji Ewropaya Rojava û ji demokrasîyên rojavayî yên din sexttir bûye. Ji dêlva ku mirov li benda *'SuperHoffê'* raweste –yan jî destekî din ê navdar ku bi çalakîyeke rojnamegerîya rojê rizgar bike- dijwarî û pêdivî ew in ku cureyên medyayê, him yên dewletî him jî yên nedewletî, bi çavkanîyan bên ava kirin û vînek peyda bibe ku li dij erîşa kambax a bi ser demokrasîya amerîkî raweste.

* Profesorê sosyolojîyê li Universiteya New Yorkê.

1 "10 questions for Arianna Huffington", (10 pirsîyar ji bo Arianna Huffington) Time Magazine, New York, 3 Tîrmeh 2008

2 Emily Steel, "AOL chops 20% from work force", (AOL pîrzola %20 ji hêza kar) TheWall Street Journal, NewYork, 11 mars 2011

3 Lauren Collins, "The Oracle," (Kehanet) *The New Yorker*, Cotmeh 13, 2008

4 Dana Milbank, "Arianna shifts again" (Arianna cardin diqelibe), TheWashington Post, 9 février 2011

5 Arianna Huffington, L'Amérique qui tombe. Comment les politiques ont trahi le rêve américain et abandonné la classe moyenne, (Amerika ya ku dikeve. Çawa sîyasetmedar ixanetê bi "xewna amerîkî" kirin û çîna qata navîn ji bîr kirin, terk kirin.), Fayard, Paris, 2011.)

6 Emily Steel, "Huffington Post's politics give pause" (Polîtîka Huffington Postê navberekê dide), TheWall Street Journal, 10 février 2011

7 Michael Calderone, "Huffington Post fires back at ex-blogger Fowler ", (Huffington Post bloggerên berê bi paşde davêje) news.yahoo.com, 28 septembre 2010

8 Chris Hedges, "Huffington's plunder",(Talana Huffingtonê) www.truthdig.com, 21 février 2011

9 Cité dans David Carr, "At media companies, a nation of serfs" (Şirketên medyayê xwedî neteweyeke kole ne), The New York Times, 13 février 2011

10 Propos de Mme Huffington à la conférence Paid Content organisée à New York en mars 2011, rapportés dans La Correspondance de la presse, Paris, 7 mars 2011. (Pêşniyara Mme Huffington a ji bo konferansa Paid Content a li New Yorkê, di adara 2011an de, di La Correspondance De La Press de hatiye rapor kirin, Parîs, 7 adar 2011)

11 Cité dans Dan Mitchell, "The AOL way: Broken, battered and hopeless", (Rêya AOL: Broken, lêdan û bêhêvîtî) CNNMoney.com, 2 février 2011

12 Dana Milbank, op. cit.

Wergera ji îngilîzî: Celîl Kaya

## JI HOLÊ RAKIRINA MESLEKEKE HEZKIRÎ

# Komputervanê bi baterî

NICOLAS SÉNÉ *

*"Berî sî salan, perwerdeya ji bo mihendizîyê ji bo gihandina pisporên teknîkê, yên maden an jî piran û kolanan bû. Ji niha û şûn ve, çîna bijarte ji Dibistana Neteweyî ya Kargerîyê (ENA) mezûn dibe. Endamên vê çînê yên bijarte li vê dibistanê fêrî hisab û kitabê baş bûn". Ev nirxandin, bi heyfanîna li serdema berê, ji alîyê statîsyenê li zanîngeha Paul-Sabatier ya Toulousê,* Joseph Saint-Pierre ve tê kirin. Niha ti fors û îtîbara berê ya mihendizîyê nemaye û ev pîşe veguheriye karûbarekî jirêzê.

Di pîşeya înformatîkê de, binavkirina giştî ya "mihendiz" hemû qadên pîşeyan dide ber xwe. Di pêvajoya salên 1970yê de, şirketên şewirmendîya di warê înformatîkê de, (SCI) derdikevin holê daku destekê bidin warê hejmarî (dîjîtal) ê ku bi kompîturên pêşî re derkete pêş, û di heman demê de pîşeyên xweser jî bi gewde bûn: Bernameçêker, klavyekar, pergal-bernamesaz, analîst, karbidestê/a projeyan. (1) Salên 1980yê mohra xwe li serdestîya înformatîka şirketa hevpar a diravî didin. Şirketên şêwirmendîya di warê înformatîkê de (SCI) vediguherin şirketên karûbarên di warê mihendizîya înformatîkê de (SSII) û ji bo vê yekê, teknolojîyê û rantabîlîteya darayî bi hev re bi kar tînin.

Ji 1990ê û vir ve, cîhana pîşesaz bi gelemperîkirina dewrkirina kar, xwe biserûber dike. Gava ku weke prensîp, şirketek hin karûbarên xwe dewrî hevparên din ên bisporbûyî dike, hingê "agahîgerî" xwe ferz dike. Kêmkirina lêçûnan dibe mijûlahî û pêdaketineke herdemî. Înformatîsyenê ku rola karmendîya hilberînê ya li pişt ekrana xwe lê tê barkirin, bi modela nû ya civakî re ya ku SSII lê ferz dike, rû bi rû dimîne. Şertûmercên wî yên kar xirab dibin û herdiçe ji şertûmercên ku li dibistanên mihendizîyê bi pesindarî behsa wan dihat kirin, bi dûr dikeve.

> Di çavên raya giştî de înformatîsyen ji çîneke bijarte ya biîmtiyaz pêk tên. Li gel vê yekê, li pişt perdê geşedana vî karî ku rêveberên çavkanîyên mirovî xwe pir pê dipesinînin, gelek caran ji mubalaxeyekê pêk tê û li pişt vê mubalexeyê ya rastî binpêkirina hiqûqa kar heye.

*"Li sinifa amadekarîyê* [ya ku dihêle ku xwendekar di îmtîhanên mezin ên dibistanên mihendizîyê re derbas bibin], *mamosteyan hertim ji me re digot ku em kesên bijarte ne",* karwergirekî Airbusê, şefê projeya li Safran Engineering Services, François (2) wisa rojên berê tîne bîra xwe. Hempîşeyê wî, delegeyekî sendîkaya Hêza Karker (FO) Julien Le Pape jî wiha dewam dike: *"Ji me re digotin ku em ê bibin rêveber".* Gava ji vî yê dawîyê statuya wî tê pirsîn, ew pêşî îşareta 'raweste' dide. Ew paşê xwe weke "mihendizê lêkolînên radyonavîgasyonê" dide nasîn, tevî ku hempîşeyên wî, yên ku tev li derdora sî salî ne jî, *"mihendizên têgeh-hilberên pergalê, mihendizên lêkolînên mekanîk an jî mihendizên pergalê"* ne. Le Pape wekî din vê tesbîtê dike: *"Ev nekarîna binavkirina pîşeyên me tiştekî xweserî SSIIyê ye. Weke ku em heta radeyekê kesên bihevguhêrbar bûn".* Ew niha pir dûr in ji xweşxeyalên xwe yên pêvajoya pênc salên xwe yên perwerdeya bilind.

### Bingehên berhemên teknîkî

Mihendizan bendav û pir ava dikirin. Îro, kompîtura xwe datînin ber xwe û dikevin nav hewldana pêşvebirina projeyên ku ew timî ne ehlê tişt û bûyerên bi wan re elaqedar in. Li gor analîza François, *"pîşeya mihendizîya di qada SSIIyê êdî ji rê derketîye û ber bi hêleke din ve diçe. Ew dadikeve asta karûbarên teknîk, ên gelek caran pirbare dibin, di nav kirasekî teng ê belgekirinê û tengezarker de dimîne, lewre ti karîna me ya biryardanê tuneye".* Le Pape wiha li gotinên wî zêde dike: *"Li wêdetirî bergeha teknîkê, pirsgirêk di warê karbidestîyê de têkçûneke xeyalan e. Diviyabû karger bibûya nimûneyek, bibûya xwedî nêrîn û ramanên balkêş. Di heqîqetê de,karger zimanekî ku me biçûk dixe bikar tîne, û ew li himber hîyerarşîyê stûxwar e. Nikare binirxîne, tiştê ew dike bi tenê bicihanîna fermanan e".*

Ev tesbît encama pergala xweser a ji alîyê SSIIyê ve bicihkirî ye. Li nav SSIIyê karbidestîyê yek ji formên herî guhêrbar a meaş afirandiye. Înformatîsyen li cem mişterîyan "bi cih bûne". Di jargona şirketên xizmetê de, ev yek weke "alîkarîya teknîkî" tê bi nav kirin: Vegotineke şermoke ya îşaret bi miteahidîyê dike. Rêxistina bispor Muncî, a ku karmendên bi meaş û lêgerên karê têkildarî warê înformatîkê, tevn û dûrragihandinan di nav xwe de radigire, tê de sedemeke nerihetîya înformatîsyenan dibîne: *"Gelek SSII kirêkarên besît ên karkeran in û ne hilberînerên esasî yên xizmetê ne, ango ne şirketên bi rastî yên bispor in. Ew karwergirên sexte ne, ji ber ku ew li gel mişterîyên xwe yên ku bi awayekî qaçax karkeran bi kirê didin, xwe dixin rewşa sûcdaran* (...) *û sûcên bazarê yên têkildarî îhaleyên alîkarîya teknîkî".* (3)

### "Qîmeta zanînê nemaye"

Bikirêdayîna karker/kedkaran ya rastî pir bi hişkî bi hiqûqa kar ve hatiye girêdan, û bi tenê di çarçoveya karê demî de legal e. Daneyeke teyîdkirî di 1999ê de ji alîyê Martîne Aubry, ku wê demê wezîra îstîhdamê bû: Li gor xala L.125-1 ya qanûna kar sûcekî bazarê weha pêk tê: *"Her cure karûbarên ji bo kirêkirina kedkêr yên bi armanca kar û qezencê yên ku dibin sedemê pêşhukmekê der barê meaşgirên veqetiyayî an jî xwerizgarkirina ji pêkanînên têkildarî tekstên legal, rêzikî an jî peymanên ku di şirketa bikarhêner de di meriyetê de ne".* (4)

Serwetên mezin li ser vê sextekarîya ku xwe dispêre qanûna der barê kar de, hatin bi dest xistin. Bi navgîna vê awartehîyê rewşeke taybet peyde dibe û rêza hîyerarşîk serûbin dike. Bi vî awayî mihendiz (ên xwedî dîplomeyên lîse + 5) ji alîyê bazirganên (xwedî dîplomeyên lîse + 2) ve tên dorpêç kirin, û ev yek hilberîna girêdayî hêza firotinê mehkûm dike. Çawa bazirganî weke erka herî bilind tê ferz kirin, wisa afirînerî jî ji bo qezenca zêdetir dadikeve plana duyemîn..

Derdorên bazirgan ji bo mezinkirina para xwe ya qezencê bi xêra "çavkanîyên mirovî", azadîyên mezin bi dest dixin. François vê yekê jî wiha rave dike: *"Kargerîya bi hejmaran dibe sedemê peydebûna rewşên seyr yên ku tê de projeyan disipêrin kesên neperwerdekirî. Lewre berpirsiyarên me berî her tiştî dixwazin kesên "navber-kontrat" wezîfedar bikin. Ew ji xwe re wiha dibêjin: "Ew mihendiz e, dikare van karûbaran bimeşîne." Zanîn û tecrûbe êdî ne girîng e".* Navber-kontrat têkildarî pêvajoya bêlebatîya navbera du mîsyonan e. Armanca nediyarkirî ya vê îcada pak a SSIIê ya ku ne xwedî ti bingeha huqûqî ye, ew e ku berpirsiyarîya bêlebatîyê bide kesê xwedî meaş. Bi sendîkalîzekirina bi qasî % 2yê, livûtevgera sektorê neçar e ku dest bi îcad û afirandinê bike. Û rewşeke pir lezgîn xwe ferz dike: Synteca dîjîtal, ku şaxekî Tevgera Tirketên Fransayê (Medef) ye, ji niha û pê ve ketiye nav hewldana pêkanîna bisporîya xebatkarên ku "xwe li gor şertûmercên bazarê eyar nekirine".

*Rojnamevan, nivîskarê berhema *Derrière l'écran de la révolution sociale [Li pişt perdeya şoreşa civakî],* Res Publica, Gémenos, 2010.

1 Christian Bret , "L'histoire des quarante premières années des SSII en France à travers leurs hommes et leurs activités [Dîroka çil salên pêşî yên SSIIyan li Fransayê, têkildarîya mirovên wan û karûbarên wan]", *Entreprises et Histoire*, hej. 40, Paris, 2005

2 Pêşnavê wergirtî

3 "Înformatîsyenên SSIIyê: Sedemên bêhuzûrîyê", 20 sibat 2002, www.munci.org

4 Rojnameya fermî, 20 adar 1999, rûp. 1834

Wergera ji fransî: Baran Nebar



MÎRÊ HÊKAN: **Koleyên sedsala 21ê**, (2000) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê, 125 x 60 x 12 cm

# Otomatên ragihandinê

IGNACIO RAMONET

Lêgerîna ji bo berhemdarîyê dibe sedem ku dezgehên medyayê ji hemû deman zêdetir li ser cureyê agahîyên ku raya giştî jê hez dike, ji xwe pirsan bikin. Ew ji ber vê tesbîtê dikevin nav hewldaneke wisa: Rêjeya agahîyên ku bi rastî ji bala piranîya mirovan dikşînin, kêmtirî % 15ê ye. Pirsgirêk li vir ew e ku tiştên tên pêşkêş kirin an bersivê nadin, an jî bersivên tetmînkar nadin daxwazan. Îcar bersivên van her du pirsan li vir xwe ferz dikin: Kîjan cure agahî divê bên dayîn? Wekî din, tam kengê divê ev agahî bên dayîn?

Cara pêşî ye ku Înternet bi alîkarîya hin amûrên nû wê bikaribe bersivê bide her du pirsên ku bi qasî medyayên girseyî qedîm in. Ji bilî hinên din, Google Trends jî derfetê dide ji bo *"mirov bizane ka peyvek çend caran di motora lêgerînê ya Googleyê de hatiye nivîsandin û her weha mirov dikare herêm û zimanê van daneyan jî bibîne"*. (1) Bi vî awayî mirov di dema rastîn de dikare bizane ka di heyameke diyar de kîjan mijarên rojevê dikarin herî zehf bikarhênerên Înternetê eleqedar bikin.

Bi xwe spartina van dane û zanînan, Google Nûçeyan (Google News) dibe tevna belaş a cûyeke agahîyan a ku bi awayekî jixweber, nimûneyên nivîsarên gelek çavkanîyên Torê û bi taybetî yên medyayên din pêşkêş dike. (…) [Lê belê] pêşengê mezin ê formuleke nû ya *"nivîsarên li ser daxwazê"*, malpera amerîkî ***Demand Media*** ye (www.demandmedia.com). Ev malper di 2006ê de hat saz kirin. Di *Xwedanasîna* xwe de, ew dide zanîn ku *"peywira"* wê ew e ku *"bibe bersiv ji bo daxwazên ji her derên cîhanê yên têkildarî naverokên xwedî nirxên bazirganîyê"*. (2) Lê belê ew her naverokê jî nade ber xwe, ji ber ku ew, armanca xwe ya bi coş weha vedibêje: *"afirandina naverokên ku pirsgirêkan çareser bikin, bersivê bidin pirsan, fêrî komkirina pereyan bikin, fêrî zûtir bikaranîna demê bikin û mirovan bextiyar bikin"*. (3) Medyaya bextiyarîyê!

Baş e, lê ew çawa vê yekê dike? Xanimeke rojnamevan pêkanîna vê yekê zêde hêsan dibîne û wê weha îzah dike: *"Ji bo destnîşankirina mijarên bên nirxandin, algorîtmaya **Demand Media** hesabê têgehên herî zêde li ser Înternetê li wan tê gerîn dike, herweha ew peyvên veker ên ji alîyê reklamvanan ve tên bi kar anîn û hebûn an jî nebûna nivîsarên têkildarên wê mijarê yên li ser Tevnê li ber çavan digire. Ew ji bo tiştên bikarhênerên Înternetê dixwazin bizanin, balansek eyar dike û tesbît dike ka kesên reklaman didin bi armanca xwenîşandana li tenişt van mijaran ji bo dayîna berdêla madî çiqas amade ne. Kêlîya ku ev daxwaz bi riya algorîtmayê tesbît dibe, mijarên bên nirxandin jî li ser **Demand Studio** xuya dibin: ya ku dibe platforma ku 10 000 redaktor û vîdeovan bi awayekî serbixwe li serê nivîsar û vîdeoyan amade dikin. Ev redaktor û vîdeovan pêşî xwe li ser malpera Înternetê ya Studioyê qeyd dikin û li hêvîya sîparîşên di derbareyê mijarên li ser malperê tên diyar kirin, dimînin –carina tenê di rojekê de 62 000 berhem ji bo weşandinê tên pêşniyar kirin. Ev kedkarên serbixwe heqdestên xwe jî li gor hejmara nivîs (10 dolar) û vîdeo (20 dolar) ên xwe yên didin weşandin distînin"*. (4)

**Demand Media** bi vî awayî bi pîşesazîkirina girseyî ya hilberîna tiştên li ser Înternetê agahdarîya *low cost* [erzan] afirand. Mesela, di duyemîn demsala 2010ê de, 10 000 nûçegihanên wê yên nivîsfiroş di zikê hev de rojê 6 000 nivîs an jî vîdeo hilberandin! (…) Helbet, dema kar û bar ewçend bi lez were kirin, divê mirov hêvîya agahîyên pir bi kalîte jî neke. Lê belê ev malper bû hilberînera herî girîng a ***Youtube***yê û niha jê re her meh ji 10 000 heta bigihe 20 000 vîdeoyan amade dike. Ev jî tê wateya ku rojê bi qasî 1,5 mîlyon rûpel bi gewde dibin… Ev jî di warê medyaya Înternetê de diyardeyeke nadîde ye. Bi gotineke din, **Demand Media** bûye karûbarekî ku êdî bi serûber û pir baş dimeşe: Bîlançoya wê ya kar a 2009ê di navbera 200-300 mîlyon dolaran de bû.

Bi vî awayê bîrbirinê, yek ji motora herî navûdengdayî ya Tevnê û reqîba **Google**yê, **Yahoo!**yê di tîrmeha 2010ê de li Dewletên Yekbûyî, malpereke agahîyan a bi navê **The Upshot** ava kir. Mijarên vê malperê jî ne ji hêla rojnamevanan, lê ji hêla statîstîkên lêgerîna bikarhênerên Înternetê yên li ser xeta **Yahoo!**yê û bi taybetî jî yên li ser tevna **Yahoo! Nûçe** ve tên dest nîşan kirin û neqandin. (5) Jixwe di gulana 2010ê de, Yahoo!yê şirketên amerîkî yên di warê hilberîna tiştên *low cost* ên li ser dazwazê bisporbûyî, ***Associated Content***, kirî. *"Xebatkarên wê her meh zêdetirî 50 000 nivîsar, wêne, deng û vîdeoyan dinirxînin. Ev berhem ji alîyê bi qasî 380 000 hilberînerên xwe yên serbixwe ve tên amade kirin û di nav van berheman de li ser mijarên cihêreng her cure nivîsar hene"*. (6) Ji bo bikarhênerên Înternetê yên dixwazin binivîsînin û nivîsên wan bên weşandin, ***Associated Content*** diyar dike ku ew dikarin hinekî din jî pereyan qezenc bikin û li ser vê yekê armanca avabûna xwe bi van gotinan bi bîr dixe: *"Çi kesê agahîyên fêrker, rêbername, hevpeyvîn, nûçe û meqale û nivîsên din binivîse û bişîne, divê berdêla berhemên xwe bi awayê diravî bistîne û ji ber bisporîya xwe bibe xebatkarekî bi meaş"*. (7)


Li vê derê, bi awayekî ji awayan "girseyîbûna ku seranserê cîhanê dide ber xwe" ya karê nûçevanîya perakende mijara gotinê ye. Ev platform weke "pirêzeyên mijaran" an jî "kargehên nûçeyan" tên bi nav kirin. Baş e, lê kî van agahîyên "bi fiyetên erzankirî" dikire? *"Weqf, şirket, malperên Înternetê, kovar û komên çapemenîyê, şirketên ku dixwazin mişterîyên xwe zêde bikin û helbet pê re jî firotina xwe, hatinên xwe yên ji reklaman an jî hejmara mişterîyên xwe yên potansîyel zêde bikin"*. (8)

Koma dezgehên çapemenîyê ya amerîkî AOL, ku ew jî yek ji pêşengên rojnamevanîya li ser Înternetê ye û îro êdî ji koma şirketan a ***Time Warner*ê** cuda ye û ketiye nav qonaxa xwenûkirineke biserûber, biryar da ku *"xwe weke dezgeheke nûçevanîyê bi rêk bixe"* (9) –bi vê armancê, wê di sibata 2011ê de rojnameya li ser Înternetê *The Huffington Post* kirî. AOLê di 2010ê de dest bi vekirina "zevîya xwe ya mijaran" kir. Navê vê zevîyê ***Seed.com*** e û ew nivîsarên nû-ciwanên rojnamevanîyê, wêjeyê an jî wênekêşîyê yên mijarên têra xwe cihêreng (xwemijûlkirinên bikêf, tendurustî, werziş, sewalên kedî, teknolojîya nû, aborî, dirav, ger û gest, siyaset) dinirxînin, pêşwazî dike da ku wan di gelek malperên xwe yên bisporbûyî (*Daily Finance, Stylelist.com, AOL Travel, Moviefone, Wow.com, AOL Food,* û hwd.) de belav bike. Weke ku yek ji berpirsîyarên ***Seed.com*ê** û herweha nûçegihanê berê yê *New York Times*ê, **Saul Hansell** jî dibêje, *"li vir rasterast modela rojnamevanîya bi qebale ya ku her tim hebû û bi bandorkirina vî cureyê rojnamevanê, mijara gotinê ye"*. (10)

Li Ewropayê jî, "zevîyên mijaran" ên bi vî şêweyî hêdî hêdî tên saz kirin. **Populis** ku jêdera wê Îtalya ye, platforma serek e û dîruşmeya wê ya pir bi îdîa jî weha ye: *"Gava ku nûçevanî bi zanista Tevnê re digunce"*. Ew îdîa dike ku her meh zêdetirî 18 milyon ziyaretvanên wê yên berdewam hene. Berpirsîyarên wê, baregeheke daneyan e ya cih dide bi qasî 16 milyon xal û mijarên pir balkêş hem ji bo bikarhênerên Înternetê hem jî îlanvanên muhtemel ên ku reklamên wan jî di heman demê de li gel nivîsaran dikarin bên weşandin. Nivîsên mijara gotinê, ne ji alîyê rojnamevanên profesyonel lê ji alîyê "*redaktorên serbixwe*", amatorên bicoş ên mijarên taybet ve, tên nivîsandin. Ev kes helbet dizanin pir baş binivîsînin û bi taybetî jî hêla malperê ve tên tercîh kirin. Rojnamevanên bi qebale dixebitin an jî karên perakende dikin, ji bo her nivîsarê herî hindik 5 herî zêde jî 150 euro distînin û kêmbûn an jî zêdebûna vê fiyetê girêdayî çendanî an jî çawanîya nivîsarê ye.

Li Fransayê jî, malperên bi naverok ên li ser daxwazê derdikevin holê. (11) Bi vî awayî, **Wikio**, paca ewrûpî ya lihevgihandina herikîna agahîyan, mehê bala bi qasî 3 milyon ziyaretvanan dikşîne. Malpera wê, ***LesExperts.com*** nivîsaran, bi taybetî jî yên li ser pêdivîyên jiyana rojane, pêşkêş dike. (12) Ev mijar jî alîyê xwendevanên li ser xeta Înternetê ve tên dest nîşan kirin û neqandin. Armanca vê malperê ew e ku her meh bi qasî 100 000 nivîsên ji alîyê artêşek blogvanên girêdayî xwe ve nivîsandî, biweşîne û bi her nivîsarê re jî li gor girseya têkildar, hin hêmanên reklamî tên bi cih kirin û bisporîya her blogvanî/ê jî tê dest nîşan kirin. Li gel vê yekê jî, kovara li ser Înternetê ya kanadî *Suite101*, ku ji îlona 2009ê ve li Fransayê ye (***www.suite101.fr***), perê karên perakende nade hevkarên xwe yên serbixwe. Tenê bi şertê ku eger ji alîyê xwendevanan ve qutîyên reklamê yên bi fiyetên pir erzan li tenişt nivîsarên belavkirî bên "tikandin", ev malper pereyekî bi navê "hatinên reklamî " dişîne ser hesabê xwedîyê/a nivîsê. Lê belê lêkolîneke amerîkî ya li ser aborîya înternetê di 2010ê de dide xuya kirin ku ji sedî 79ê xwendevanên li ser xetê, qet, an jî pir kêm qutîyên reklamê ditikînin. (13) Çavtêrnebûyên "daxistina lêçûnan" di elehîyê rojnamevanan de komên adetî yên çapemenîyê hêdî radihêjin van rêbazên nû yên hilberîna "beşdarîger" a nûçeyan. Bi vî awayî koma çapemenîyê ya alman ***Hubert Burda Media*** xwedîya 186 kovarên li nêzî deh welatan, di navbera ji sedî 35-40ê sermayeya malpera ***Suite101*ê** bi dest xist.

Gelo ev "kargehên nûçeyan" dikarin li hember medyayên klasîk ên nûçeyan an jî malperên "li ser xetê" yên ji alîyê rojnamevanên profesyonel ve bi nûçe û nîvîsaran tên xwedî kirin, xwe ragirin? Piranîya karbidestên van "zevîyên mijaran" ji ber du sedeman li vê yekê nafikirin: Berî her tiştî, ew difikirin ku kewara malperên nûçeyan têr û tije ye; bi dû re, ew bê dudilî didin zanîn ku qet dilê wan tune ku tevlî nav vê yekê bibin. Nivîsarên (kurt, hêsan, bi dilê herkesî) dinivîsin, bi taybetî cih didin mijarên têkildarî jiyana rojane yên weke "mirov çawa dikare jiyana xwe ya rojane baştir bike", şîretên weke *self help* [alîkarîya xwe bi xwe], pêşniyarên di derbareyê mijarên tendurustîyê, dirav, kar, kêf û xweşî, û ger û geştê de... Ev malperên bi naverokên *low cost* bi taybetî dikevin nav hewldana ber bi xwe ve kişandina girseyên mezin ên bikarhênerên Înternetê ji bo ku bi fiyetên pir kêm reklaman bifiroşin û "aborîyeke li ser tikandinê" jî bi pêş bixin. Serok û avakarê *Populis*, **Luca**



MÎRÊ HÊKAN: **Diranên me**, (1994) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê, 120 x 60 x 10 cm

**Ascani** wisa hizir dike ku malpera wî dikare tevî vê yekê jî xwe weke temamker bide xuya kirin: *"Li ser Înternetê, ji sedî 20 ta 25ê nûçeyan ji medyayên adetî, ji sedî 60 ta 65ê wan ji lêgerînê û bi qasî ji sedî 15ê wan jî ji zevîyên mijaran ên tevnên civakî, tên bi dest xistin. Em hewl didin van her sê waran dagirin û bersivên maqûl bidin pêdivîyan".* (14)

Li gel vê yekê jî, bi buhrana medyayan re, malperên belaş ên nûçevanîya li ser xetê ji nêz ve çavdêrîya serkeftina van "zevîyên mijaran" dikin […]. Heta hin rojnameyên bi referans jî li ser mijarê difikirin. Ji koma çapemenîyê ya amerîkî ***The Washington Post Company***, edîtorê rojnameya navdar a bi heman navî, di tîrmeha 2010ê de malpera ***iCurrent*** bi dest xist. Ev malper dibe destpêkek a ku ji bikarhênerên Înternetê re pêşniyar dike bi *"rojnameyeke li gorî eleqeyên wan hatiye amade kirin"* bişewirin. Ew bi awayekî bixweber tevahîya naverokên 27 000 malperên çapemenîyê û blogên ji xwendevan re pêşniyarkirî dide ber xwe û dikare van pêşniyaran bixemilîne û biserûbertir bike (15). Ev perspektîv bi taybetî gerînendeyê *New York Times,* **Bill Keller** ditirsîne: *"Ez ê çarenûsa ragihandinê bi destên* ***Google****yê ve bernedim".* (16)

1 Nivîsara bi navê " Google trends ", Wikipedia.org, 10 sibat 2011

2 *Heman çavkanî*

3 www.demandmedia.com/about/demand-media-manifesto

4 Caroline Boudet, "Demand Media, l'usine à infos du Web" ["Demand Media, kargeha nûçeyên Tevnê"], *Les Echos*, Parîs, 23 mijdar 2009

5 *Bnr.* Cécile Ducourtieux û Xavier Ternisien, "Quand les internautes dictent l'actualité " ["Gava Xwendevanên Înternetê Rojevê Dest nîşan dikin"], *Le Monde*, 13ê tîrmeha 2010ê

6 AFP, 18ê gulana 2010ê

7 L'Expansion.com, 19ê gulana 2010ê

8 www.tubbydev.com, "Fermes de contenus: business plan et métriques" ["Zevîyên bi mijar: Planên Karsazîyê û Pergala Wezînandinê"], kanûn 2010

9 L'Expansion.com, 17ê adara 2010ê

10 *Heman çavkanî*

11 Nicolas Rauline, "Les "fermes de contenus" à la demande se lancent à la conquête du marché français" [" "Zevîyên bi Mijar " ên li ser Daxwazê ji bo Vegirtina Bazara Fransî Zend û Bendên Xwe Ba Didin "], *Les Echos*, 2ê1 kanûna 2010ê

12 Nimûneyên ji mijaran: "Mirov Çawa di Hevdîtina Kar de Bi Ser Dikeve? Mirov Çawa Xanîyê Xwe Difiroşe? Ji bo Porên Birûn Kîjan Şampûan? Qerenfîlên Erzan li ku derê Peyde Dibin?"

13 *Le Monde*, 20 adar 2010

14 Nicolas Rauline, *gotara navbihurî*

15 Maris-Catherine Beuth, "Les nouvelles "ficelles" des sites d'infos américains" [" "Lîstikên Zirav" ên nû yên malperên amerîkî yên nûçeyan"], LeFigaro.fr, 18 tîrmeh 2010

16 *El Pais*, Madrid, 25ê tîrmeha 2010ê

Wergera ji fransî: Baran Nebar

DI TÊKILÎYÊN TIRKIYÊ Û WELATÊN AFRÎKÎ DE ROLA TUSKONÊ

# Aktîvîzma karbidestan

WENDY KRISTIANASEN

Rizanur Meral dibêje; *"dema krîza malî ya navneteweyî da der, Afrîkayê ji Tirkiyeyê re xeleka xelasîyê pêşkêş kir. Niha dora Amerîkaya Latîn, başûr û başûrrojhilatê Asyayê ye ku alîkarî bidinê daku ji nav vakûma ku serîhildanên cîhana ereb ew provoke kirin, derbas bibe"* Beşa herî girîng di Tuskonê (1), Konfederasyona Bazirgan û Pîşesazên Tirkiyeyê re derbas dibe, ku Meral serok-damezirênerê wê ye.

Serfirazîya wî xwe dispêre têkilîyên ku Tuskonê ji dema avakirina xwe ve ( 2005ê) li ser navê patronîya tirk girêdane. Bîst û neh hezar şirket endamên vê organîzasyonê ne, ya ku para bêtir li Anatolîyayê bi cih bûye. Tevî ku ji pêncsed şirketên herî mezin ên Tirkiyeyê sed endamên wê ne jî, piranîya endaman kargehên biçûk û navinî ne.

Gelek kesên ku dibêjin "Tuskon" bivê nevê dibêjin "Afrîka". Di hevdîtina xwe ya mezin a yekemîn de (2005), dezgeha patronan li Stenbolê mêvandarîya pêncsed delegeyên ku ji sih û yek welatên Afrîkayê hatibûn kir. Bi her halî, çalakîyên wê ji Federasyona Rûsyayê heta bi Dewletên Yekbûyî didin ber xwe, di ser Ewropayê (hem rojhilat û hem rojavayê wê), Ewrasyayê re derbas dibe, dawîyê her weha cîranên herêmî yên Tirkiyeyê –heta bi serhildanên vê dawîyê, bazara herî zêde bi kar dianî- , Asya û heta Başûrê Amerîkayê jî li van zêde bûn.

Li gor Meral serkeftin bixwe xwe rave dike: *"Tişta ku em pêşekîyê didinê: Afirandina çalakîya aborî ye. Li Anatolîyayê, struktureke me ya hilberîner a zexm heye, ya ku ji alîyê haci babalar* [nifşên kevn ên ‚bavan' ku li Mekkeyê çûne hecê] *ve hatiye damezrandin û êdî kravatli ogullari* [kurên wan yên bi kirawat] *dixwazin bi pêş de bibin. Em hevdîtinan di navbera karsazên tirk û şirîk û hevkarên potansîyel ên li welatên bîyanî de çêdikin, em wan dişînin daku seredana welatên cuda bikin û em ji bo vekirina bazarên nû yên îxracatê bazirganan vedixwînin vir."* Ixracat –a serfkarîyê, materyelên avahîsazîyê, mobîlya, tekstîl, alavên makîneyan, hesincaw (parçeyên yêdek), hwd.– %90ê çalakîyên aborî yên şirketên ku endamên Tuskonê ne, pêk tîne.

Meral difikire ku sedemeke din a populerîya Tuskonê ya di nav karsazên Anatolîyayê de ev e: "Em tevlî polîtîkayê nabin." Rewşa dezgehên din ên patronan ne wisa ye: *"Askon têkilîyên xwe bi Necmeddin Erbakan re berdewam dike* [Partîya Refahê sala 1997ê ji bo demeke kurt dibe desthilatdar]. *Paşê Musiad derkete holê. Em li alîyê xwe, digel ku di gelek waran de wekî AKPê* [Partîya Dad û Pêşketinê, niha desthila tdar e] *difikirin jî, lê tevlî siyasetê nabin.* Vê yekê alîkarî da me ku ji welatên misilman wê de, yên ku Musiad li wir hatiye bi sînor kirin, em xwe bi pêş ve bibin."

Halbûkî Tuskon xwe jê nade alî û xwe jê nade paş ku şêwra xwe bi tevna dînî ya ji alîyê Fethullah Gulen ve hatiye ava kirin bike, û sûdê ji serketina birêveberê dînî yê tirk digire ku li seranserê cîhanê gelek dibistanên taybet vekirine Û ne bi tenê li welatên misilman: Meral xuya dike ku *"li welatên ku Tirkiye li wir ne xwedîyê muxatebên fermî ye, tevna Gulen ji me re riya bazar û têkilîyên digel rayedarên payebilind vedike. Li pêncî û sê welatên Afrîkayê jî bîst û pênc balyozxaneyan zêdetir balyozxaneya welatê me tuneye."*

Li meha adarê, Tuskonê delegasyoneke girîng bi serokatîya serokkomar Abdullah Gul bir Ghana û Gabonê. "Li Gabonê balyozxaneya me tuneye. Lê li dibistanekê çar mamosteyên Gulen hene: Bi saya serê wan me karî em xwe bigihijînin muxatabên cuda û agahî û têkilîyan bi derdorên karsazan re bi dest bixin. Gelek ji endamên me di warê malî de destekê didin dibistanên Gulen, herweha li Gabonê jî. Em wisa difikirin ku ji ber asta wan a bilind a perwerdeyî û exlaqî, û girêdana wan a bi pêşketina ferdî, ev dibistan bi kêrî Tirkiyeyê tên."

1 Dezgeha bazirgan û pîşesazên serbixwe ya li Anatolîyayê hat damezrandin daku li hemberî Tusiada pir laîk û nûnera şirketên herî mezin ên Tirkiyeyê, reqabetê bike

Wergera ji fransî: Sevda Orak

JI KABÎNEYÊN WEZARETAN HETA SEKTORÊN ŞEXSÎ, ŞIVERÊYA BISPOREKÎ

# Amerîkîyekî aşt û aram

PIERRE CONESA *

Piştî felaketa Fukushima sentralên nukleer tên firotin? Ger ev tişt gelek kesan bitirsîne jî gelekên din ji nuha ve baş fam kirin ku, di kirînê de divê ekipmaneke ku di çareserkirina ewlekarîyê de muteber e, hebe.

*– Ez gotarekê li ser sedemên biserketina erza nukleerî ya koreyî li Ebu Dabîyê dinivîsînim, ku ji bo Fransayê ne bi xêr bû. Gelo hûn ê hevpeyivînekê qebûl bikin?*

*– Mixabin, ev çênabe.*

Mixabin, ji ber ku mirovê weha bi nazikî daxwaza me red dike, dikare pir tiştan bibêje. Berîya demeke kurt hê nû ew di konferansekê de axivî ku ji hêla navendeke mezin a mîrîtîyê ya lêkolînên stratejîk (Emirates Center for Strategic Studies and Research) ve hat li dar xistin. Di axaftina xwe de –ya li ser mijara "ewlehîya li bajarê şareza yê siberojê"- wî ji bo nîvseetekê hemû krîzên mezin ên salên dawîn li pey hev rêz kirin: Suîkastên 11ê îlona 2001ê, erdhêja bi an bê tsunamîyê, şewatên li Awustralyayê, tofana Katrînayê, vîrusa Stuxnetê... (1) Heta weha pir bû ku guhdarekî niştecihî hêrs bû, got ku rojavayî endîşe û metirsîyan dinepixînin daku çek û teçhîzatên xwe çêtir bifiroşin welatên din.

Lê ev mirov bi meseleya metirsîyan dizane. Li DYAyê, ew "şêwirmendê taybet li ser metirsîyên dinyayî, hevkarsazê ewlehî û dijterorîzmê û şêwirmendê taybet yê ewlehîya Înternet û kompûteran" ê sê serokkomarên li pey hev bûye: George H. Bush, William Clinton û George W. Bush. Bi dû re, wî karê xwe di qada taybet de domand û weke hevkarê Good Harbor Consulting ("Şêwirmendên li Xweşlîmanê") bûye serkêşê mekanîzmaya amerîkî li Kendavê. Ev şirketa 2003ê damezrandî, ji bo çareserîya hemû pirsgirêkên ewlehîyê û pêşkêşkirina xizmetên cihê, gişeyeke yekane ye. (2) Malpera şirketê ji van pirsgirêkan yanzdehan rêz dike, weke ewlehîya aktîvîteyên balefirgehî, an jî deryayî, parastina kesayetîyan, her weke parêzvanîya binesazîyên herî girîng an jî ya nukleerê. Wê li gel operatorê ewlehîya pîşesaz a herêmî World Security hevkarîyeke nû çêkir. Serokê World Securityê jî Mahmûd Amîn e ku temînkarê holdinga dewletê ya ji bo ewlehîyê Dubai Worldê ye. Ev şirket yek ji wan şirketên kêm ên herêmî ye ku xwedî destûr û erk in ku lîmanan li gor pîvanên ewlehîya deryayî yên International Ship and Port Facility Security Code (ISPS) misoger bikin. Di nav xebatkarên wê de hejmareke mezin a kevnexebatkarên Central Intelligence Agency (CIA) û National Security Council (NCS) jî hene.

### Eger pompa çend metreyan bilindtir danîbûyana, santral wê hê jî bişixuliya

Ew bi jîrî xizmetên xwe pêşkêş dikin: Encamên zêde yên tofanên ji xwezayê an ji însanan, ji ber nepêşbînîya rîska herî mezin, çêbûn. Rêbaz, teknolojî û hunera kirinê hene, Good Harbor bi wan dizane û dikare wan bixe nav pergaleke ahengdar. Li pêşîya guhdarên matmayî hiştî, zilamê me encamên qethî yên bobelata Fukuşîmayê derêxistin: Eger pompa çend metreyan bilindtir danîbûyana, santral ê hê jî bişixuliya.

Ew hevpeyvînan nake, lê hê jî îmajeke erênî ji xwe re çêdike. Mînak, tê gotin ku wî di îmzeya peymaneke firotina şêst balafirên şerî yên F-16 Block 60 ji bo Mîrîtîyên Ereb ên Yekgirtî de, ku pîşesazîya balafirî ya fransî xistibû şokê, navberkarî kiriye. Herweha, gotegot heye ku wî berîya demekê jî, jîyana Şêx Mihemedê mîrê warîs rizgar kir, dema ku Şêx li Asyaya Navîn ligel Usama bin Ladîn nêçîrvanî dikir û fuzeyeke keştîya şer a CIAyê ew her du jî ji xwe re kiribûn hedef. Di kêlîka dawîyê de, wî rê li ber avêtina fuzeyê girtibû û xizmeteke girîng a cihê serfirazîyê li yek ji bibandortirîn mirovên Mîrîtîyan kiribû. Ku mirov bi xêra bûyereke xeyalî tesîra xwe mezin bike, ev bi rastî jî jîrekîyeke mezin e! Peyman sala 1998ê hat mohr kirin.

Li gel sî şêwirmendên xwe yên li cihê cih, Good Harbor di bernameya nukleer a mîrîtîyê de bi roleke serekî rabûye. Amerîkîyan bi du awayan kar kir: Reqabeta pîşesazîyê, her weke du sazûmanên ku ji bo vê peymanê hatin damezirandin, Emirates Nuclear Energy Corp û Federal Authority for Nuclear Regulation (dezgeha danîna rêbazên ewlehîyê ye, ku Fransayê jî hewl da têkevîyê), da ku bi awayekî îndîrek firotina pergala parastina dijfuzeyan ya ji çar santralan re pêwîst amade bike. Çavên Fransîyan li ser hev û du û li ser reqîbên wan ên nukleer û amerîkî bûn; lê Koreyî û taşeronên amerîkî bazar bi dest xistin.

### Parastina xetên trênê

Îro, binesazîyên mezin ne bi tenê bi kalîteya berhemê, lê belê berî her tiştî herweha bi ewlehîyê tên firotin. Tesîr êdî ne bi riya şêwirmendên leşkerî yên li nik biryardêran çêdibe, ji ber ku "bisporên ewlehîya dinyayî" ne ku ji bo şirketên taybet dixebitin û lewre jî tê îdia kirin ku qenaetên wan "serbixwe" ne, şûna wan girt. Fîrma Good Harbor, ligel şirketa brîtanî Abbott Risk Consulting, weha hê nû peymaneke ewlehîyê ya ji bo projeya bê ya 1500 kilometreyên riya hesinî ya ji bo trena bilez bi dest xist. Ev riya hesinî dê şeş welatên Desteya Hevkarîya Kendavê bi hev ve girêbide. Me pê nedizanî ku pergalên trenên bilez ên amerîkî û ingilîzî ev qasî bi pêş ketibûn -nemase di warê ewlehîyê de. Çavdêrîya karmendên pîşesaz ên ku wê dawîyê bên hilbijartin, dê balkêş be.

Ne weke qehremanê romana Graham Greene (3), lêhengê me suîkastan nake: Ew ji bo xatirê bazara xwe, rîsk û terorê radixîne ber çavan. Îstixbaratên amerîkî nekarî rê li ber suîkastên 11ê îlonê bigrin, an jî Bîn Ladîn bibînin, lê ew hê jî "bisporên navneteweyî yên navdayî" li ser tevahîya dinyayê ferz dikin. Heta ji wan tê ku Smart City ("bajarê şareza û ewle") yê siberojê terîf bikin, ligel ku bajarên amerîkî weke cihên aram û aştîyane qet navdar nînin. Her çi Fransa ye ku pir projeyên mezin difiroşe (çek, enerjî, veguhestin, nukleer), divê ew li du alîyan îlhama xwe ji amerîkîyan jî werbigire. Yek, pergala wê ya bisporîyê parçe parçe ye (parastin li hêlekê, ewlehî li hêla din e) û bi dû peymanan re tê, li şûna ku berî wan bê û wan bide îmze kirin (mînak fîrmaya Défense Conseil International ji bo perwerdekarîya muşteriyên peymanên parastinê bisporan dixebitîne, lê belê piştî îmzekirina van peymanan). Didu, bila bisporên fransî neşînin Desteya Dewletê an jî balyozxaneyên cihê, baştir e ku ew di beşa taybet de karîyerên xwe bidomînin...


Diranên me (Detay)


* Memûrê bilind ê berê li wezareta parastinê

1 Bixwînin Philippe Rivière, "Cyber-attaque contre Téhéran" ["Êrişa vîrtuel li dijî Tehranê"], *Le Monde diplomatique*, adara 2011ê

2 www.goodharbor.net

3 Graham Greene, *Un Américain bien tranquille [Amerîkîyekî aşt û aram]*, Marcelle Sibonê ji ingilîzî wergerandiye fransî, 10/18, Parîs, 2003 [1955]

Wergera ji fransî: Simko Destan



Mîrê Hêkan: **Rondikên Şêrîntal**, (1994) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê, 120 x 60 x 9 cm

## Êrişa li dijî bernameya nukleerî ya Îranî

# Sîber-êriş li dijî Tehranê

Philippe Rivière

Çend roj berê muzakereyên Stenbolê yên li ser bernameya nukleer a Îranê, li çîleya 2011ê, îdiayên dengvedêr di çapemenîyê de cih girtin: Vîrusa komputerî Stuxnet, ku tûşî Îranê bûbû, li Îsraîlê bi alîkarîya DYAyê hatibûye çêkirin. Gelo vê êrişa ku binesazîyên pîşesazîyê ji xwe re dikirin hedef, heyameke nû ya sîberşerî bi me nîşan dide?

### Vîruseke komputerê ya weke çekê şerî?

*Çernobîleke nû!* Di destpêka 2011ê de, **M. Dmitry Rogozin**, balyozê rûs ê li Rêxistina Peymana Bakurê Atlantikê (NATO), bi daxwaza destpêkirina lêpirsînekê der barê *Stuxnetê*, vîrusa komputerê ku van mehên dawîn miseletî ser tesîsên nukleer ên Îranê bûye, bû sedema sansasyonê. Ew dibêje ku, ev vîrus, di santrala hilberînê ya vejenê ya li Buşehrê de, ku li başûrê Îranê hatiye ava kirin, dikare bibe sedemê teqîneke termonukleer. Bisporê ewlehîyê yê alman û xwedîyê lêkolîneke pêşîn a birêkûpêk a vê vîrusê **Ralph Langner**, di meha îlonê de dibêje ev faraziyeyeke *"vîrtuel* [û] *bitemamî bêbingeh"* e. *"Berîya her tiştî, Stuxnet, Buşehr ji xwe re nekiriye armanc"*. Lê bi rastî zirar li Natanzayê bûye, ku lê heft hezar santrîfujên ûranyûmê dewlemend dikin hene. *"Ya duyem, heta di rewşeke wiha de jî, vîrus nikare bi sîsteman re bikeve reaksîyonê, ew dewreyeke avê ye ku 'bi radyoaktîvîteyê re di têkilîyê de ye'. Tiştê ku kenê guran jî pê tê, ew e ku rûs bixwe vê yekê baş dizanin"*. (1) Lewra, di vî warî de Rûsya hevkareke serekî ya Tehranê ye. Bûyera Stuxnetê, çîroka sabotajeke teknolojîya bilind, romanek e ku kiryar zû ji çarçoveya kodên komputerê derdikeve û ber bi lîstikên mirêkî yên ragihandinê û dîplomasîyê ve dibeze.

Xwuya ye hin rastîyan cihê xwe girtiye. Diyar e êdî gumana kesî tuneye ku wextê çêkerên vê vîrûsê hebûye. (koda jêdera wê, li dora 15 000 rêzan e, ku li gor hin texmînan bi kêmanî deh "sal-endazyari"ya xebatê) û zanyarîyên tûj (ji bo ku kurmik karibe xwe bigihêniyê, dê ji çar valahîyên nebelavkirî yên sîstema bikaranînê ya Windowsê îstifade bike) jê re divên. **Langner** dibêje, *"analîza kodên wê bi awayekî vekirî diyar dike ku armanca Stuxnetê ya mesajekê bişîne yan têgehekê nîşan bide tuneye. Ya pêdivî, bibiryardarîyeke biawayê leşkerî hilweşandina armancan e"*. Gelo tesîsên nukleer ên Îranê dikevin ber armanca wê? Gotareke kite bi kite ya *New York Times,* a 15ê çileya paşîn a 2011ê vê yekê piştrast dike û derdixe holê ku vîrus hatiye ceribandin û li ser bingeha ji nû ve derhênaneke bi mezinahîya tora santrîfujên Natanzê hatiye pêşxistin. Li gor rojnameya amerîkî, ev yek di navenda kompleksên atomî ên Dimona, li çola Neguevê de, ku dilê bernameya nukler a leşkerî ya îsraîlê ye, weke operasyoneke mezin pêk hatiye. Lêkolîn xwe dispêre gelek şahidîyên fermî yên amerîkî û îsraîlî – ku hemî jî nayên zanîn û îsbata wan ne mimkun e. Encam: *"Pêşbirka neqanûnî ya çêkirina Stuxnetê, projeyeke hevbeş a amerîkî û îsraîlîyan e, ku bi alîkarîya haydar an nehaydar a alman û îngilîzan jî pêk hatiye"*. (2)

Almanên navbihurî yên fîrmaya *Siemens*ê, karkerên ku li kargeheke sîstemên kontrolê yên komputeran ji bo sanaîyê (binavê SCADA) çêdikirin, bixwe bûn. Stuxnet "kurmikekî komputerê" ye, ku şopa wî ya cara pêşîn digihê heta 2009ê û ku li seranserê cîhanê bi dehan hezar makîne xirap kirine. Li gor lêkolîneke çêkerê dijvîrusan ***Kaspersky***, li Moskovayê, ev kurm li gelek welatan, bi taybetî jî li Hindistanê, bi 8565 makîneyên xirapbûyî (di îlona 2010ê de) welatê herî zirardîtî belav bûye, piştî wê Endonezya tê (5148), Îran jî bi 3062 weqayên dîtî di rêza sêyem de ye. (3) Li gor hin senaryoyan, Stuxnet divê bi wasîteya mifteya USB a vegirtî ya yek ji maldayê xwe yê rûs di wextê xwe de ketibe malpera *Natanz*. Ji ber ku, wê nîşanên cihê yên armanca xwe (şopa kontrolkerê xwe yê her car) nas dikirin, vîruse diviya rêze êrişin weke filmê *Hollywoodê* pêk banîya. Bi diyarkirina herikîna daneyên rewşa wan normalxwuya, li ser ekranên ewlehîyê yên operatoran re, wê diviya gelek caran gurana rêguhastina santrifujan zêde bikira, rotor banîya sînorê qetîyana fizîkî û bi vî awayî bibûya sedema rêjeyeke nexwezayî ya arizayan.

### Kuştina fîzîknasan

Herçend dewleta îsraîlê li vê vîrusê xwedî dernakeve, Telavîv mandelê lê nade û hin zabit jî bi serê zimanan bahsa wê dikin. Tevî vê jî, bûyera Stuxnetê di nav kiryarên sabotajê yên berfireh ên li dijî bernameya nukleer ya îranê de cihê xwe digire, ku serekê kevin ê Mossadê, **M. Meir Dagan**, berî niha ne bi gelekî kêfxweşîya xwe diyar kir ku dibîne dê ev bername *"gellek salan bajo û heta berîya 2015ê dê kapasîteya nukleerî ya Îranîyan tunebe"*. (4) Li gor raporeke Enstîtuya Aşîtîyê ya Amerîkî (5), Tehran birastî divê pêrgî *"gelek astengên mezin bibe, ku bêtir wext bide dîplomasîyê û acîlîyeta lêdaneke leşkerî kêm bike"*. Û birêzkirina: *"Astengên her diçe zêde dibin li hember bidestxistina parçeyê bivê nevê hewce li bazara navneteweyî; alozîyên bikaranîna jimareyeke mezin a santrîfujan; û wiha xwuya ye ku, kiryarên nehînî yên buroyên îstixbaratên biyanî ne"*. Di nav rêbazên bikarhatî de: *"Êrîşên sîberî, sabotajên materyalî, bi nihênî ketina nav tora tedarikkirinê û kuştina bisporên nukleerê"* jî hene. Tarîxên bûyerên dawîn: Bi teqandina tirimbêla wî re mirina fizîsyen **Mecîd Şehriyarî** di 29ê çirîya paşîn a 2010ê de, dema tirimbêl teqîya ew jî tê de bûye. Lê, ji bo raportorên wek **David Albright** û **Andrea Stricker**, *"alozîyên herî mezin xwiya ye ji ber Stuxnetê bûne, ku ji 2009ê ve dest pe kiriye û bandora xwe li ser santrifujên Natanzê dike"*. Piştî ku ev bûyer weke çîrokekê got, serok **Mahmûd Ahmedî Necad** di encamê de, di dawîya 2010ê de îtiraf kir, ku kurmik bûye sedema *"hin probleman",* lê ew êdî *"çareser bûne"*.

### Korsanîya komputerî werzişeke lêxistinê ye

Di gotareke kovara taybet a *Nuclear Intelligence Weekly* de, **M. Scott Ritter**, serokê kevin ê çavdêrên Neteweyên Yekbûyî yên bêçekkirina Iraqê (1991-1998), di şiroveyên xwe de behsa hin cudayîyên balkêş dike: *"Karbidestên amerîkî û îsraîlî bi awayekî eşkere dibêjin ku Stuxnetê, niha, rê li ber bernameya dewlemendkirina ûranyûmê ya Îranê girtiye.* (…) *Lê dîsa jî, nirxandineke ku vê dawîyê ji alîyê Federasyona Zanyarên Amerîkanî* (6) *ve, li ser bingeha daneyên ekîbên çavdêrên Neteweyên Yekbûyî [li ser malpera Natanz] hatiye kirin, dest nîşan dike ku tevî êrişa Stuxnetê jî, Îranê çalakîyên xwe yên dewlemendkirina ûranyûmê, di 2010ê de, berfirehtir û bibandortir kirine"*. (7)

Li gor Ritter, ev nêrînên cuda, bi tansîyona li dora *"beza bilez"* hikum dike, dikare bê şirove kirin, ku Tehran û gruba "P5+1 (8)" bi vê yekê rabûne. *"Nirxandinên li ser bingeha rastîyê, ji bo xatirê spekulasyonên senaryoyên muhtemel ên "rêvekirinê" di ser guh re hatin avêtin.* Bi saya dubarekirinê ya nêzîkî bîst salan e, ku Tehran dike bombeya nukleer bi dest bixe, dîplomat *"qîma xwe bi tercîhên siyasî yên ku qîmet didin van hîpotezan tînin",* ku Ritter wê bi *"mezinkirinê"* gunehbar dike. Bi vî awayî jî, ew sînorên xwe yên minaqeşekirinê teng dikin. Derengmayina ku xwedêgiravî ji ber tevgera sabotajê ye riyeke bifêde vedike ji bo berdewamîya minaqeşeyan bêyî ku derfet ji dest biçe.

Ji xeynî lihevnekirina diyar a di navbera van herdu cîranan de –li alîyekî bombeya îsraîlê ya ku "sira herî xirab veşartî" ya dinyayê ye (9), li alîyê din jî bernameya nukleer a îranê ya ku hîn dûr e bi encam bibe–, operasyonên sabotajê yên di dema aştîyê de ne bêyî riskên bersivdanê yan jî pîjkirina şerî ne. Paradoksal e, gava ku mirov dibîne welatên di warê computerê de herî pêşketî û ji serî ve dibe ku herî zêde zirar li wan bibe, kiryarên wiha, meşrû dikin. Lê belê, korsanîya komputerê xwe amadekirina ji bo şerî ye û em dizanin ku di vî warî de bergirîya herî mezin êrîşkarî ye. Li Washingtonê, ku hîn bîranîna hakkirina malika mesajan a *Google* (îhtimaleke mezin) ji alî çînîyan ve teze ye, ji bo wê jî Serok, li hemberî *"êrîşên hakkirinê yên ji derve bên"* weke riya dawîn a bergirîyê, doza bişkokekê dike ku pê karibe hemî înternetê qut bike. Estonyaya ku bedelê "êrîşeke hakkirinê" ya kirdarê wê nediyar (lê herkes difikire ku ji alî Rûsyayê ve hatiye kirin) di 2007ê de da, ji bo wê jî ew ji wê demê bi vir de, ji bo bergirîya xwe ya înternetê, mazûvanîya navenda birêkûpêk a NATOyê dike.

1 "The Virtual Chernobyl (Çernobîla Ferazî)", 1ê sibata 2011ê, www.langner.com

2 William J. Broad, John Markoff û David E. Sanger, "Israeli Test on Worm Called Crucial in Iran Nuclear Delay (*Ceribandina Îsraîlî ya Kurmikê Ferazî, di Derengketina Bernameya Nukleer a Îranî de bi Roleke Diyar Rabû*)", *The New York Times,* 16ê çileya paşîn a 2011ê

3 Jeffrey Carr, "Reality Check: Is Stuxnet's Iran Connection The New Iraqi WMD? (*Kontrola Rastîyê: Gelo Girêdana Stuxnetê ya bi Îranê ve WMDya [çeka qirkirina girseyan] Nû ya Iraqî ye?)",* Firewall, *Forbes,* 28ê îlona 2010ê

4 Yossi Melman, "Outgoing Mossad chief: Iran won't have nuclear capability before 2015 (*Kevneşefê Mossadê: Jêhatîbûna Nukleer a Îranê wê Berîya 2015ê çênebe*)", *Haaretz,* 7ê çileya paşîn a 2011ê

5 "Iran's Nuclear Setbacks: A key for U.S. Diplomacy (*Şkestinên Nukleer ên Îranê: Ji bo Dîplomasîya DYAyê Mifteyek e)",* 18ê çileya paşîn a 2011ê, United States Institute of Peace, www.usip.org

6 Di 1945ê de ji alî gelek zanyarên beşdarî berhênana bombeya atomê bûne ve hatiye damezirandin, ku FAS pê bûye xwedî îtibareke pir mezin

7 Scott Ritter, "In Perspective: The Stuxnet Effect (*Di Perspektîfê de: Bandora Stuxnetê*)", *Nuclear Intelligence Weekly*, New York, 31ê çileya paşîn 20011ê

8 Her pênc endamên daîmî yên Konseya Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî – Amerîka, Brîtanya, Fransa, Rûsya û Çîn–, + Almanya

9 Li gor sernivîsa berhema Avner Cohen, *The Worst-Kept Secret: Israel's Bargain with the Bomb* (*Sirra Herî Hirab Hatî Veşartin: Bazara Îsralî ya bi Bombe*), Columbia University Press, New York, 2010

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr



Mîrê Hêkan: **Pêlên Tirsê**, (2009) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê, 120 x 60 x 15 cm

## Çil salan piştî şerî dozek

# Di dawîyê de, darazek ji bo "tawanên şerî" çêdibe

DAVID MONTERO *


MÎRÊ HÊKAN: **Kilît**, (2006) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê 60 x 120 x 13 cm

**Gelo komkujiyên di dema veqetîna ji Pakîstanê sala 1971ê pêk hatin – behsa sê milyon kuştiyan tê kirin – wê bibin mijara dadgeheke adilane?**

Li çileya dawîn, serokwezîra Komara gel a Bengladeşê, **Şêx Hasîna Wajed**, êrişeke giran bir ser nîzama olî ya ku heta wê demê li vî welatî serdest bû. Bi piştgirîya Dadgeha Bilind, wê benda destûra bingehîn ku, li 1979ê, Bengladeş kiribû komareke îslamî, betal kir û statuya resen a dewleta laîk li sêyemîn welatê mezin ê misilman ê dinyayê vegerand. Ev gava hiqûqî ya pêşî nîşan dide ku hikûmet dixwaze makîneya dewletê, ya ji sî salî ve di destê rayedarên îslamî de ye, ji nû ve bi dest bixe. Ji sazûmanan û wê de, ev yek ber bi guherîneke rûyê tevahîya civakê ve dibe.

Ev çend meh in ku partîya ***Hasînayê*, Lîga Awamî** (çepa naverast), her di nav hewldanekê de ye da ku hemû şopên îslama radîkal ji holê rake. Çend mîlyon dolar weha ji bo guherandina navên bi dehan avahîyên dewletê hatin xerc kirin, ku heta niha navên şexsên sembolîk ên fundamentalîzmê li wan bû. Qanûna ku sergirtin li jinan ferz dikir jî hat betal kirin. Wekî din, hikûmetê hêz û derfetên pêwîst ji bo jihevxistina tevnên îslamperest ji xwe re bi dest xist. Stûna bingehîn a tedbîrê jî ev bû: Sazkirina dadgehekê ji bo darizandina tawanên şerî yên ku îslamperestan di ber şerê serxwebûnê yê 1971ê re kirin.

Lê belê, alîyekî tarî yê van guherînên radîkal heye. Tevî ku armanca wê durist be jî, hikûmet vê dozê li derveyî destûra bingehîn dimeşîne. Ew tade li muxelîfên siyasî, nemaze birêveberên partîya bi hêz ***Jamaat-e-Îslamî*** (1), ku 12 milyon partîzanên wê hene, dike û mafên wan bin pê dike. Bi xêra serdestîya xwe, serokwezîr rêbazên tundrew yên li nirxên azadî, maf û demokrasîyê nayên -ku ew qaşo dixwaze li welatî vegerîne- bi kar tîne, da ku hêzên îslamperest û her weha dijberên din ên desthilata xwe nehêle. Li vî welatê nifusa wî 150 mîlyon yên bi dabaşbûna dînî û siyasî lawaz bûyî û fêrî qutbûnên av, gaz û ceyranê bûyî, siyaseteke stemkar dibe ku agir bi barûdê bixe. Tundrewîya **Hasîna**yê, bingehên demokrasîya ku ew xwedêgiravî dixwaze biparêze, dixe xeterê.

**Mîrpur** yek ji xizantirîn taxên **Daka**yê ye. Muzeya Neteweyî ya Rizgarîyê lê nayê, ji ber ku paqij tê parastin. Li vê muzeyê, şerê serxwebûnê yê 1971ê li dijî Pakistana rojavayî û pêşengê tevgerê, **Şêx Mujîbur Rahman**ê bavê serokwezîra niha, tên bi bîr anîn. Ew hingê serokê ***Lîga Awamî*** bû û ji bo rizgarkirina eyaletê ji zilma rayedarên Pakîstanê û avakirina dewleteke laîk, Bengladeş, têkoşîya. Nerazîbûna Pakistanê tund û tûj bû. Di neh mehan de, artêşa pakistanî serokatîya ***Lîga Awamî*** bi temamî îmha kir. Li gor hin dîroknasan, sê milyon bengalî hatin kuştin û tecawiz li du sed hezar jinan hat kirin. Hejmara qurbanên vî şerî hê jî mijara nîqaşan e, lê ew ê weke goleke xwînê di dîrokê de bimîne. Ev kiryar jî ne tenê yên leşkerên pakistanî bûn: Pir bengalîyên misilman beşdarî qetlîaman bûne û li ser navê parastina nirxên îslamê, misilmanên laîk û hindû jî kuştin.

### Haya vî nifşî, bi rêya şahidî, belge, wêne û vîdeoyên li Înternetê belavbûyî, ji rastîya trawmaya neteweyî çêbûye

**Muhammad Abu Saeed** ê sax mayî, zirav, bi rûyê şermok û çil salî ye. Em li muzeyê rastî wî hatin. Ew çîroka birayê xwe vedibêje, ku eskerên pakistanî lê xist û îşkence lê kir. Dema ku wî ji bo avê hawar dikir, wan di devê wî de mîst û ew kuşt. Her çi **Şêx Şarîful Îslam Babû** ye, ji ber serbihurîyên bi vî rengî, xew pir caran nakeve çavên wî. Di panzdeh salîya xwe de, ew bi mucîzeyî ji destê çeteyeke xwînmêj filitî ku hewl dabûn serê wî jê bikin. Cihê birînê hê jî di gerdena wî de xuya ye.

Dema ku bûyeran vedibêjin, rondik ji çavên wan tên xwarê. Ji xemgînîyê bêhtir, hêrs serdest e. Ew ne li dijî leşkerên pakistanî, ku her kes pê dizane dest bi wan nabe, bi hêrs in. **Saeed** û **Babû** dixwazin ku hevwelatîyên wan bên mehkeme kirin. Li gor wan, bi tenê mehkemeyek bi encama mehkûmkirina tawanbaran wê rehetîyê bide şehîdan.

Ev daxwaza wan niha ji alîyê giregirên dewletê ve jî tê gotin û dibe ku ew di demeke nêzîk de pêk bê. Rewşa nakok ev e ku ji mexdûran bêhtir, nifşê ciwan dengê xwe ji bo edaletê bilind dike. Haya vî nifşî, bi rêya şahidî, belge, wêne û vîdeoyên li Înternetê belavbûyî, ji rastîya trawmaya neteweyî çêbûye. **Imtîaz Ahmed** ê profesorê têkilîyên navneteweyî li Zanîngeha Dakayê, û nivîskarê çend pirtûkên li ser şerê 1971ê (2), şirove dike: *"Ciwanan çîrokên erjeng bihîstin. Bi ya wan, şik û guman tê tuneye : Ev jenosîd e. Ew bê sebr in û dixwazin ku tawanbar hesabê kirinên xwe bidin"*.

**Hasîn**a xanim bi bersivdayîna zexmbûna xwestekên raya giştî sala 2008ê hat hilbijartin û soz daye ku ew ê dadgeha şerî, ya ku çil salan ji ber xemsarîya rayedaran asê maye, saz bike. Li adara 2010ê, biryar hat girtin û hiqûqnasên cîhanê teva ew bi çepikan pêşwazî kir. Jixwe, ku ew baş biçe serî, mehkeme wê rizgarker be û hesabên salên şerî bike. Bi vî rengî, ew ê bikaribe bertîlxwarîya berbelav asteng bike û dawîyê li pevçûnên siyasî bîne; yên ku welêt ji dema avabûnê ve xira dikin.

Armanc evqas girîng e, lê pir cihê daxê ye ku li şûna lêgerîna bi sedan tawanbarên hesibandî, xuya ye sazîya nû tevahîya quweta xwe ji bo hedefeke tenê bi kar tîne: Tadelêkirina li ***Jamaat-e-Îslamîyê***. Şûna encama xilasker a ji welêt re pêwîst, ev tevgera çewisandinê dikare pir xeternak be û civaka bengalî têxe qonaxeke nû ya bê istîqrarîyê.

### Rast e artêşa pakistanî tevna partîyê bi mîlîsên tundrewbûyî saz kir; weke komên talîban ên pêşî

**Muhammad Kamaruzzaman** li derdora pêncî salî ye û serbilind xuya dike; ew yek ji wan kesan e yên ku bi hevkarîya Pakistanê tên sûcdar kirin. Berdevkê fermî yê ***Jamaat-e-Islamîyê*** ye û ew dixwaze vegere dewleteke ku îslam ola wê ya resmî ye. Di hevdîtina me ya gulana 2010ê de, dema ku lawê wî çay ji me re anîbû, wî bi statîstîk û referansên dîrokî yên pirhejmar nihêrîna xwe parastibû. Lê dema ku nîqaş hat ser meseleya wî, vegotina wî kêmtir zelal bû. Rola nediyar a partîya wî li ser dika siyasî ya bengalî weha di wî de jî xuya dike. Ew rave dike: *"Li 1971ê, **Jamaat-e-Islami** li dijî têkoşîna bo serxwebûnê pir çalak bû. Sedemên vî tiştî hestiyarî bûn. Pakistan ava bû da ku bibe welatê misilmanên jêrparzemîna hindî. Çawa bû ku em dabeşkirina welêt bipejirînin?"*. Ew her weha lê mikûr tê û dibêje: *"Rast e ku artêşa pakistanî tevna partîyê bi mîlîsên tundrewbûyî saz kir; weke komên talîban ên pêşî. Gelo van mîlîsan tawanên şerî pêk anîn? Ev ne diyar e"*.

Lê belê, herkes pê dizane ku hingê, **Kamaruzzaman** li bakurê welêt navendeke lêpirsînê bi rê ve dibir, ku tê de li bêhtir ji sêsed neteweparêzan êşkence hat kirin û hatin kuştin. Lewre, rewşenbîr û komele weha difikirin ku divê edalet pêk bê, lê bila partî bi giştî berpirsiyar neyê hesibandinê. Jixwe, tawanbar hemû ji refên ***Jamaat-e-Islami*** nehatin. Li ser vê pirsê, mehkemeyek dê belkî nîşan bide ku şexsên ji komên siyasî û dînî yên cuda piranîya tawanan pêk anîn.

Mixabin, **Hasîna** xanim bi hemdê xwe li hember van tiştan bê deng dimîne. Li ser dika neteweyî û navneteweyî, ew her demî ***Jamaat-e-Îslamî*** weke stara sûcdaran nîşan dide, ku guman ji tawanbarîya wan tune. Surprîz nîne ku lîsteya deh tawanbarên herî mezin ên şerî, ya ku hikûmeta wê derxist, **Kamaruzzaman** jî di nav de, bi tenê rayedarên vê partîyê ji xwe re dike hedef.

**Kamaruzzaman** bêgunehîya xwe îfade kir û gava **Hasîna**yê weke hesabekî siyasî yê bêbingeh da xuya kirin. *"Lîga Awamî ji bo hilbijartinan ev nîqaş da dest pê kirin. Bi vî awayî, ew dixwazin me marjînalîze bikin û derîyê hilbijartinên siberojê li ser piştê ji wan re vekirî be"*, wî tehlîl dikir, berî ku bi provokasyonê bidome: *"Eger **Hasîna** xanim di pêkutîyên li ser partîya min de bi israr be, dibe ku ciwan berê xwe bidin şidetê"*. Wî di dawîya axaftinê de weha hişyar kir: *"Ku rayedarên tevgerê bên girtin, em nizanin bê dê çi pêk were. Dê lawên me, hogirên me çi bikin? Em bi fikar in ku hin ji wan bikevin nav tevgereke neqanûnî û biryara tolhildanê bidin"*.

Li tîrmeha 2010ê, çend hefteyan paşê, serokê wê yê bilind jî di nav de, **Kamaruzzaman** û çend kadroyên din ên ***Jamaat-e-Îslamî*** hatin girtin û li ber kamerayen televîzyona neteweyî hatin pêşan dan. Bengalîyan bi matmayî li vê şowê temaşe kir û ji xwe pirsîn ka gelo welatê wan ne li ber (li berbanga) serdemeke nû ye.

Lê belê, nîqaş zû dest pê kirin. Siftê doz li **Kamarûzzaman** û hevdînên wî ne ji bo tawanên şerî, lê ji bo komeke sûcên ku ne têkildarên bûyerên 1971ê ne, hatin vekirin: Yek ji wan bi îfadeyên kufurî yên li dijî pêxember Mihemed hat sûcdar kirin; yê din, bi kuştina kesekî di komcivîneke siyasî de. Bi tenê bi pey biryara girtinê re, îthamên tawanên şerî derketin holê. Li wan gunehbarîyên bertîlxwarinê, şûştina pereyan û terorîzmê zêde bûn.

### Di heman demê de, tehdîdên alozîyê li welêt zêde dibin û tansîyon radibe

Berîya demeke kurt jî, serokwezîrê, nivîsên damezirênerê tevgerê **Syed Abul Ala Maududî** û her weha olnasê herî bi tesîr ê Asyaya başûr, dan qedexe kirin. Di paşxaneke wisa de, çavdêr li hember meylên otorîter ên desthilatê, her ku diçe ecêbmayî dimînin. Tirsa xirakirina fersenda mehkûmkirina tawanbaran serdest e. **Ameena Mohsîna** profesora hiqûqa navneteweyî li zanîngeha Dakayê, hişyar dike: *"Tu nikarî berî mehkemê xelkê mehkûm bikî. Hikûmet hebûna mehkemê bixwe dixe xeterê"*.

Di heman demê de, tehdîdên alozîyê li welêt zêde dibin û tansîyon radibe. Pevçûnên navbera çalakgerên ***Jamaat-e-Îslamî*** û hêzên ewlehîyê zêde dibin. Hin kes hatin girtin û bi wan re teqemenî hebûn. Ji nişka ve, tehdîtên **Kamaruzzamanî** ji provokasyonê bêhtir, weke pêşbînîyan xuya dikin. Li mijdarê, piştî ku wî pêşniyaznameya guherandina destûrî ya ji bo vegera li dewleteke laîk parastibû, molotov avêtin dîwarên xanîyê serokê Dadgeha Bilind.
Li ser navê têkoşîna li dijî îslamperestîya siyasî, Bengladeş bi heman rêya zilmkarîyê de mîna Misir, Tûnis an Cezayirê diçe. Em bi qedera wan dizanin. Ji hatina wê ya ser kar a 2008ê ve, **Hasîna** xanim nekarî pirsgirêkên rûniştî û rojane yên hevwelatîyên xwe çareser bike. Raperînên birçîtîyê li hev zêde dibin, kêmbûna avê û ceyranê şênîyên jixwe lawaz bêhtir diwestînin. Karkerên tekstîlê, ji bo zêdebûnên meaşî tevgereke protestoyê ya berfireh da dest pê kirin *(li jorê bixwînin)*. Herî dawîyê, serokwezîrê, pêkutîyên li dijî ***Jamaat-e-Îslamî*** berfirehtir kirin û ***Partîya Neteweyî ya Bengladeşê*** (BNP), reqîba wê ya siyasî ya sereke jî kete ber van pêkutîyan û ji hingê ve tade li endamên wê tê kirin û ew tên girtin. Ji niha ve şerê kolanan ê di navbera partîzanên her du alîyan de, çil û pênc kesan jîyana xwe ji dest da û du sed kes jî birîndar bûn. Heke rewş wiha biçe, dibe ku artêş ji baregehên xwe derkeve da ku ewlehîyê vegerîne welêt, weke wê li 2007ê bi pey pevçûnên nav partîzanên Lîga Awamî û yên BNPê re kiribû. (3) Ji civaka demokratîk a soza wê dayî, dûr, Bengladeş ê wî çaxî vegere ser rewşa xwe ya berî çil salan. Dem nema: Şahidên şerê serxwebûnê kal dibin û dimirin. Delîl ji holê radibin. *"Ez mehkemeyeke bi edalet û bi lez dixwazim*, **Bablû** diyar dike. *Ev fersenda dawîyê ye"*.

* Rojnamevan û çêkerê belgefilman. Belgefilmê wî yê dawiyê: Pakîstan: The Lost Generation (nifşê winda), FrontLine World, Delhî, 2010

1 Jamaat-e-Islami Bengladeş meztirîn partîya îslamî ya welêt e. Ew nirxên sertî û kevneperest dide pêş û ji bo sazkirina dewleteke îslamî -bi riya sindoqan- têdikoşe

2 *Historicizing 1971 Genocide : State Versus Person [Dîrokîkirina jenosîda 1971ê : Dewlet li dijî Şexsî* University Press Limited, Daka, 2009

3 Hingê, rewşa awarte îlan bûbû û hilbijartin jî taloq bûbûn

Wergera ji fransî: Simko Destan

Dîrok

# 1848, Bihara Gelan

Alain Garrigou *

**Ewropa 1848. Şoreş carna wek nexweşîyên epîdemîk in. Çirûskek li bajarekî: barîkadên gel ku li hember tivingên parastina qralîyetê xwe bi cîh dikin û dilxwazê guhertineke rejîmê ne. Ev dijîtî belav dibe, diçe welatên cîran, di nêzîk de jî dê li hemû qitayê belav bibe. Li gor wî jî, monarşî, dê gavên xwe bi tedbîr bavêjin.**

Ev bihar, roja 22ê sibata 1848ê, li Parîsê dest pê dike. Ji bo ku ji qedexeya civîn û komelebûnê, ya ku ***Monarşîya Tîrmeh***ê li ser xelkê ferz kiribû xilas bibin, parêzvanên reformeke dengdana rêjeyî ji tîrmeha 1847ê ve, *"Kampanyayeke ziyafetan"* li dar dixin û dema pîyaleyan dinoşînin, axaftinên siyasî jî dikin. Qonaxa herî bilind a vê kampanyayê dê bibûya kombûneke li *Parîs*ê: Ev tê qedexe kirin. Lê belê, organîzator mîtîngê betal nakin û tarîxa 22ê sibatê jê re hildibijêrin. Berîya rojeke, ew dev ji projeyê berdidin, lê êdî dereng e: Beşdar, li ber devê tifingan tên cem hev. Êvar bi pevçûnan bi dawî dibe.

Ji wê û pê ve, bûyer bi bayê bezê li pey hev diqewimin. 23ê sibatê, xelkê Parîsê di nav kolanan de digerin û bang dikin: ***"Bijî reform!", "Guizot bimre!"*** (Guizot serokê desteya wezîran bû). Piştî nîvrojê, qral îstîfaya wezîrê xwe dipejirîne. Dîsa jî dereng e: Li hember xwepêşandêrên ku pîrozbahîyên serkeftinê dikin, nobedarên wezareta karên derve, ku **François Guizot** lê dimîne, bi ser girseyê de guleyan direşînin. Termên pêşî li erebeyan tên bar kirin û li Parîsê tên gerandin. Dotira rojê, 24ê sibatê, serîhildêr di çend noqteyên paytextê de êrişî leşkeran dikin û herweha bi ser qesra ***Tuilleries***ê [îqameta qralî] de digrin. Qral, **Louis Philippe** ji neçarî ji textî vedikişe. 25 sibatê, di odeya ***Saint Jean*** a avahîya şaredarîyê de, **Alphonse de Lamartine**yê şair ji bo dengdana giştî soz dide: Gel ê cihê textî bigire.

Qesrên monarşîk yên Ewropayê ji ber şoreş û îlankirina komarê li Fransayê bi endîşe ne. Nîzama ku li 1815ê di kongreya ***Vîyana***yê de, ji bo parastina li hember şoreş û şerên navewropî hatibû dayîn, di bin metirsîyeke cidî de ye. **Nicolasê 1.**, çarê Rusyayê jixwe amadekarîyên şerî dike û manîfestoyeke weha diweşîne: *"Ji bo edaleta Xwedê û qaîdeyên pîroz ên nîzama heyî ya li ser textên îrsî danî "*.

**Alphonse de Lamartin**e, wezîrê karên derve yê nû, aştîxwaz e û wî dil nîne ku ***Hevpeymanîya Pîroz*** (1) ji nû ve saz bike; lewre jî ew bi lez û bez rêbazên siyaseta derve ya komarî wisa dide xuyan: *"Îlana **Komara Fransayê** ne kiryareke şerî li hemberî çi şiklên hikûmetên li dinyayê ye. Dirûvên hikûmetê pirreng in, pirrengîya wan jî, bi qasî ya karakteran, rewşa coxrafyayî û pêşketina entelektuel, exlaqî û madî li cem gelan meşrû ye"*. Ew ji şoreşa 1789ê jî cudatîya xwe nîşan dide: *"Ne weke pêwîstîya qederî û qehremanîya 1792ê, şer êdî ne prensîpa Komara Fransî ye"*. (2) Karekî lezgîn e ku dilên qral cînar rihet bike.

## Xelk bêhtir azadîyê dixwaze

Li dawîya sedsala 18ê, sempatîzanên ***Şoreşa Fransî*** hê jî hindik bûn; bes li 1848ê, meyl û daxwazên siyasî li civakên ewropî berbelav dibin: Xelk bêhtir azadîyê dixwaze. Têgiha azadîyê berfireh û pirdirûv e, li welatên dagîrkirî -mîna ***Polonya***ya parçekirî an jî Îtalyaya Bakur-, ew tê maneya welatparêzîyê, lê ew xwestekên yekîtîyê yên welatên alman an jî daxwazên serxwebûnê yên gelên bindest -weke li Macaristana di bin destê awusturîyan de- jî vedihewîne. Herweha, ew daxwazên xelkê bajaran ji bo azadîya çapemenîyê û danîna destûrên bingehîn ên demokratîk jî îfade dike. Di vê paşxanê de, nûçeya şoreşa parîsî weke çîrûska yekem tê hesibandin.

Li 3ê adarê, **Louis Kossuth**ê parêzer û rojnamevan li pêşîya ***diet*** [meclis] a macarî diaxive û doza sazkirina rejîmeke parlemanî dike; piştî wê, ew bi serokatîya heyetekê berê xwe dide ***Vîyana***yê. Li paytexta Împaratorîya Awusturî-macarî, serîhildan li 12ê adarê dest pê dike. Weke li Parîsê, xwîna xwepêşandêran tê rijandin û kortejên cenazeyan li kolanan digerin. Raperîn gur dibe. Şeva dotira rojê, sazkerê kongreya Vîyanayê, mîrê ***Metternich***, ji karê xwe dibe. Li 15ê adarê, girseyên kêfxweş û şa pêşwazîya heyeta macarî ya di bin serokatîya **Kossuth** de dikin. Gaveke berî serxwebûnê, ***Macaristan*** ji bo cara yekem serokwezîrekî ji xwe re hildibijêre, ev jî **Batthyány**ê kont e.

Bi matmayî haya **Lombardî**ya bi tevahî li dijî dagîrkirina awustûrî ye, ji bûyerên Parîsê dibe. Esîlzadeyên wê welatparêz in, şoreşger nînin. Bi pey gihîştina nûçeya raperîna Vîyanayê, 17ê adarê, barîkat li ***Mîlan***ê jî tên danîn. **Mareşal Radetzky**, fermandarê leşkerên dagîrker, li ber ihtîmala êrişeke ji ***Piemont***ê hêzên xwe vedikişîne. Piştî pênc rojên serîhildanê, xelkê ***Mîlan***ê dagîrkeran neçar dike ji bajêr vekişin.

Li ***Berlîn***ê, key **Friedrich Wilhelm** li ber daxwazên sazkirina mecliseke destûrnivîs wextê bi dest dixe. Ew qasidekî dişîne qesra ***Vîyana***yê û dibêje ew li hêvîya civîna hikumdaran a 25ê adarê li ***Dresden***ê dimîne. Di heman demê de, ew leşkeran vediguhêze Berlînê û bajarên din ên ***Prusya***yê. Kombûnên gelî tên belav kirin, lê dotira rojê gel ji nû ve kom dibe. Li 17ê adarê, qralê Prusyayê nûçeya şoreşa Vîyanayê dibihîze. Roja din, ew azadîya çapemenîyê îlan dike û meclisekê dicivîne. Girse tê ber pencereyên qralê ku mirûzkirî, li şaneşînê xuya dike. Ew nikare dengê xwe bi girseyê bide bihîstin, tê gotin, ew vedigere hundir û dibêje *"aramî!aramî!"*. Leşker guleyan direşînin. Banga çekhildanê li kolanên Berlînê olan dide. Li hemberî berfirehîya raperînê, destûreke bingehîn a demokratîk jî di nav de, **Friedrich Wilhelm** tiştên nû qebûl dike. Qralê ***Munich***ê dev ji text berdide. Serîhildan li ***Leipzîg, Hannover, Wurtemberg*** û bajarên mezin ên Almanyayê belav dibe. Li Polonyaya parçebûyî jî, xirecir zêde dibe.

## Monarşîyên ewropî nakokîyên di navbera neteweyan de jî bi kar tînin

Seray jî bi ser xwe ve tên. Daku xwe ji xelkê biparêzin, ew paytextan diterikînin, ji Berlînê diçin ***Potsdam***ê, ji Vîyanayê diçin ***Înnsbruck***ê. Ew xwe dispêrin artêşan û *"rewşa awarte, ku dermanê her tiştî ye"*. (3) **Mareşal Radetzky *Lombardya***yê ji nû ve distîne; mareşal **Windischgraetz *Prag*** û ***Vîyana***yê jî vedigire. Monarşîyên ewropî herweha nakokîyên di navbera neteweyan de jî bi kar tînin, mînak ew kêmneteweyên alman û cihû li ***Polonya***yê, li hember xelkê polonî pîj dikin. Leşkerên xirwatî yên albay **Jallanich** dikevin Vîyanayê. **Karl Marx** 7ê mijdarê bi îronî dibêje: *"Azadî û nîzama xirwatî bi kêrî wan hat, wan ev serfirazîya xwe jî, bi şewat, tecawiz, talan û tawanên nayên gotin, pîroz kir"*. (4) Qralê ***Napolî***yê, bajarên xwe ***Napolî*** û ***Mesîna***yê dide ber topan. Li 5ê kanûna 1848ê, general **Wrangel** rewşa awarte li Berlînê îlan dike. Qral jî meclîsê ji hev de dide xistin û ji sozên xwe vedigere.

Sala 1848ê, bi trajedî û xeyalên şkestî bi dawî dibe. Li her alîyê Ewropayê, dîmenên mîna hev xuya dibin: Xwepêşandan, stranên şoreşgerî, dirûşmên rizgarker an jî bi hêrs, kampanyayên îmzeyan, axaftin, sohbetên di wê kêlîyê de li taxan an jî li pişt barîkadan. ***"Barîkad":*** Ev peyv li her derê Ewropayê belav bûye û vegeriyaye nîşaneke raperînê. (5)

## Di nav şoreşgeran de burjuwa, proleter, xwendekar, mêr û jin, heta zarok jî hene

Di nav xelkê şoreşger ê 1848ê de bûrjuwa, proleter, xwendekar, mêr û jin, heta zarok jî, peyda dibûn. Wan di bangên ji bo *"welat"* û *"azadîyê"* de, ku li kûçeyên ***Parîs***ê deng vedida, eynî tişt nedidîtin. Bi xêra vê têkilbûna civakî, xewna civat, destbiratî û yekîtîyê dibû rastî. Xelkê gazî hev û din dikir, hevdu maçî dikir, bi hev re digirîyan û dikeniyan. Hestên mirovan ji ber tehlûkeyê dikeliyan. Hin sahne di bîran de mane. **Marie de Flavigny** roja duyemîn a raperînê weha vedibêje: *"Li taxa **Les Halles**ê, jin erzaq ji leşkeran re tînin û wan hemêz dikin, ew rica ji wan dikin ku li ser bira, mêr û zarokên xwe agir nebarînin. **Barîkad** bi kêfxweşî û serhişkî, ji eskeran bîst gavan dûr tên danîn. Xortan digot "Hûn ê bêyî hişyarîyê guleyan nereşînin." Leşkeran li wan vedigerand "Aram bin, hê ferman nedane me""*. (6) Kengî ferman hat, girse dibehece: Guleureşandin jîyanan bi dawî tîne..

Heta mirin jî vediguhere xwepêşandana ji bo heqîyê. Rewayîya vê îqtîdarê, ku fermana gulereşandina li xelkê aştîyane daye, çi bû gelo? Li seranserî Ewropayê, meşên merasîmên cenazeyan çêdibin, mînak li 23ê sibatê li Parîsê: *"Di erebeyeke ku hespekî spî dikêşe, hefsarê wî di destê karkerekî miltazî de, pênc cesed bi sîmetrîyeke xofdar raxistî ne* (...). *Carina, karkerekî din ku li pey erebeyê dimeşe, laşekî bêcan hemêz dike, radixîne û meşaleya xwe li serî dihejîne. Li nav çirûsk û birîskên agirî, ew li girseyê bi awirên tûj dinihêre û gazî dike: **"Tol! Tol! Xelkî ser jê dikin!"**"*. (7) Li ***Berlîn***ê, roja 22ê adarê, girseyê cesed anîn bin şaneşînên qesra qralî. Qral li ber terman bejna xwe tewand; keybanû jî ji ser hişê xwe çû. Qurbanên qral û leşkeran bûne leheng. Ev îmaja heysiyeta welatî hinekî mirinane xuya dike. Lê eger însan ji bo wê nemiribana, dê çi nirxê demokrasîyê hebûya?



**Barîkadên rêya Saint-Maur, li Parîsê li taxa 11an, 25 hezîran 1848** Wêne: RMN/LMD

* Profesorê zanyarîya siyasî li ***Zanîngeha Paris Ouest Nanterre La Défense***, nivîskarê *Mourir pour des idées [Mirina ji bo fikiran]*, Les Belles lettres, Parîs, 2010

1 Hevkarîya Pîroz, li kongreya Viyanayê, li hember Fransaya napolyonî, monarşiyên serkevtî civandîye (Împaratorîya Rûsyayê, Împaratorîya Viyanayê û Macarîstanê û Qraliyeta Prûsyayê

2 Di Daniel Stern, *Histoire de la révolution de 1848 [Dîroka şoreşa 1848ê]*, Balland, Parîs, 1985, r. 289-290 de vegotî. Daniel Stern, şanenavê Marie de Flavignyê ye, jineke azad û bêşerm ya ku herweha rewşenbîreke mezin bû. Piştî ku dev ji mêrê xwe berda, ew bûye hevsera Franz Liszt û bêyî bizewice çend zarok jî anîne dinyayê

3 Karl Marx, *Révolution et contre-révolution en Europe, Œuvres politiques [Li Ewropayê şoreş û dijşoreş, Berhemên siyasî]*, La Pléiade, Parîs, r. 55

4 Ibid

5 *Bnr.* Alain Corbin, Jean-Marie Mayeur (brv.), *La Barricade [Barîkad]*, Publications de la Sorbonne, Parîs, 1997

6 Daniel Stern, *heman berhem*, r. 106

7 Ibid, rûpel 124

Wergera ji fransî: Simko Destan


arsivakurd.org

# ÇAND Û HUNER

## Rênas Jîyan: "Bedewî", ji "serbestî"yê diafire

ÇÎYA MAZÎ

Kedkarekî mezin yê zimanê kurdî ye Rênas Jîyan. Ji bilî helbestên wî, nivîsarên wî yên di derbarê estetîkê û feodalîteya kurdan de bala min kişand û bawer im bala gelek kesan bi taybetî ya nivîskar û wêjevanan jî kişandibe. Helbestvanê kurd Rênas Jîyan li Amedê dijî û edîtorê weşanxaneya Belkî û kovara Çirûskê ye. Balkêşîya Rênas Jîyan, ji nivîskarên kurdan yek jê jî diyarkirina ekolekê, ya bi navê ***Çirûskîzm***ê ye. Wekî tê zanîn pirtûka wî ya yekem ***Janya*** -helbest- ye, dûre ***Mezzena Xwînê*** –helbest- û ***Di Tuwaletê de*** -tîyatro-çap kiriye Rênas Jîyan.


ÇÎYA MAZÎ

Dema ku mirov pirtûka wî ya ***"Ji şevê re"*** dixwîne, mirov dibîne ku nivîskar xwestiye bingeh û hundirê ***'Ekola Çirûskîzm'***ê dagire. Ev pirtûk ji 81 nivîsarên wî yên ku di rojname û kovaran de hatine weşandin, pêk tê. Di pêşgotina wê de navê pirtûkê û hinekî jî wateya şevê diyar dibe ji bo Rênas. Wisa tê gotin; *"Ji ber ku ew şev e hemû xerabîyan di xwe de vedişêre; vêketina çirûskekê ji bo dîtina dilê wê bes e, lê wê tucarî ji rûyê xwe, ji hebûna xwe fedî nekiriye, heger dilê wê bixwaze dikare di hundurê xwe de çirûskek an jî şevçirayeke xweşik jî rê mirovî bide û wî/wê ji kêfan bifirîne; û dikare cinnekî jî rê mirovî bide û wî/wê ji tirsan biqetîne!"*

Min xwest di wan mijaran de çend pirsan ji bo rojnameyê jê bipirsim. Wî jî bi dilgermî bersiva pirsên min da.

**Birêz Rênas Jîyan, we jî di salên 90ê de dest bi helbestê kir û bi cehdek pir mezin meşiyan heta îro. Îro hûn di weşanxaneyê de, di nav pirtûkên kurdî de avjenîyê dikin. Kêfa we li gor wan salan çiqasî tê?**


RÊNAS JÎYAN

Ji bo helbestkarekî-nivîskarekî, war an jî mekanên herî îdeal *weşanxane* ne, lê bi şertê ku ew weşanxane karibin ku weke *atolyeyên wêjeyî* û weke *laboratuarên zimanî* bixebitin, ne ku dirûvê *qehwexane* û *dikan*an bigirin, bi rastî jî *sazî* bin.

Li vê dinyaya ***sar*** û li vê jîyana ***har*** kêm cih hene ku ez lê disitirim û bêhnê lê distînim, weşanxane ji van cihan yek e. Ez bi xêra vê weşanxaneyê *tenêtîya* xwe dikewînim, hêrsa xwe dimelisînim û hêvîyên xwe disûtînim. Ez bi xêra weşanxaneya ***Belkî***yê û kovara ***Çirûsk***ê bîra xwe ya birîndar ji bîr dikim; weşanxane û kovar hem kêfê û hem jî êşê dide min.

Mezin-biçûk, baş-xerab ez ji hemû weşanxane û kovarên kurdî hez dikim. Divê mirov *holik*ên xwe bi *qesr*ên bavê xelkê nede; ji ber ku *holik* bin jî, ew yên me ne û siberoj ji bo ku ew jî weke yên xelkê veneguherin qesran tu sedem tune ne.

**Bi taybetî di gelek nivîs û hevpeyvînên xwe de hûn li ser estetîka hunerê sekinîne. Ev mijar dûr û dirêj e, lê bi kurtî; aniha estetîka bi tevahî di hunera kurdî de, bi taybetî jî di helbesta kurdî de dilê we xweş dike an na?**

Em civakeke kêm sazî ne, şikestî ne… û hwd, lê weke kurd em jî mirov in û xwedî dilîn in, teqez êşên ku em jî bibêjin, çîrokên ku em jî vebêjin hene weke yên gelên din, hetta ji ber dozaja pirbûna êşê ji yên gelên din bêtir jî hene, di vir de ya girîng nabe hebûna mijar û çîrokan, a girîng dibe *"dirûv"* û *şêwaza* vegotina mijaran. Her nivîskar an jî her netewe *serbestî* an jî *evîndarîyê* vedibêje, lê weke kurd ***em*** serbestî û evîndarîyê *çawa* vedibêjin, bi çi dirûvî, bi kîjan şêwazê; estetîk ev e, bedena berhemê ye.

Ez helbesta kurdî hem a do û hem jî ya îroj di ser standardên dinyayê re dibînim, weke mînak **Ehmedê Xanî**, Xanî ji bo min hevtayê **Homeros, Firdewsî** û **Dante**yî ye ku ev helbestkar di ser standardên helbesta dinyayê re ne. Lê ji pexşana kurdî re hîn divê, pexşana kurdî di bin standardên dinyayê de ye, ne xwedî rêgeh, tevnsazî, karakter û kevneşopîyeke pêşketî ye.

**Estetîka ku di klasîkên kurdî de ye, tevlî dengbêjîyê jî, gelo hûn wê û ya aniha bidin ber hev, hûn ê ji kîjanê hez bikin?**

Ji bo afirandina berhemeke baş *kesayeteke* baş pêwîst e, kesayet çiqasî resen û estetîk be berhem jî weke wê kesayetê resen û estetîk e. Kurdê do, resentir (orîjînaltir) bû, ji ber wê estetîktir e jî. Berhema *orîjînal* estetîktir e, ji ber ku *kokdar*tir e, jixwe peyva ***orîjîn***ê tê wateya ***kok***ê. Heger berhem li ser *kok*a çanda xwe şîn hatibe bedew e, guhertî ye, na di nav lepên asîmîlasyon û alîyanasyonê (jixwebîyanîbûyîn) de xeniqîbe ne bedew e, hetta dev ji bedewîyê berdin ne tu tişt e. Tiştê weke xwe be, bedew e, estetîk e, lê na, ne weke xwe, weke tiştekî din an jî yekî din be, kirêt e. Weke mînak *jin*a ku jin be, bedew e, lê na heger *jin*ê xwe şibandibe ***mêr***î ne bedew e, kirêt e. Resenî, resenî, a ku jê tê hezkirin, resenî ango orîjînalîte ye. Çanda resen û axir zimanê resen…

**Hunerê çiqasî bandor ji alî estetîkî de li civaka kurd kiriye, ji demên berê û heta niha?**

Heger mirov dengbêjan jê derxe dikare bêje ku hunerê pir kêm bandora xwe li civaka kurd kiriye. Jixwe sazîya dengbêjîyê jî her û her meth û pesnê *feodalîte*yê daye. Di civaka kurdî de *ya diyarker* ne huner ango bedewî ye, *ya diyarker* hêz ango desthilatdarî ye. Bêguman *hêz*a hunerê jî heye, lê ji bo pêkhatina hêza hunerê dem, alav û şiûr pêwîst in.

Ji gişan girîngtir jî, bindestî… Civaka kurdî civakeke bindest e û civakên bindest nexweşik in. Koleyek çiqasî dikare bedew be? Civakeke ku vîndarîya wê di binîya îpotekê de be çiqasî dikare bedew be? Bindestî tiştekî *madxelandî* ye. *Bedewî*, ji *serbestî*yê diafire. Heta ku em serbest nebin an jî heta ku em xwe serbest nekin em ê estetîk jî nebin.

**We gelek caran bahsa feodalîya kurdan kiriye û we qala astengên ku ji pêşketinê re derdixe, kiriye. Gelo ew hişmendîya feodalîya kurdan ya îro çiqasî zincîrê li dora estetîka hunerê digerîne?**


MÎRÊ HÊKAN: **Nelihevbûna beramberî**, (1992) Teknîka şexsî ya li ser tabloyê, 125 x 60 x 8 cm

**Marc Bloch**ê ku dîroknas û bisporê feodalîteyê ye, dest nîşan dike ku mirovê feodal tabi'î senyorê xwe ye, senyor çi bibêje, ew pêk tê. Di feodalîteyê de vîna serbest tuneye, vîndarî ango îrade tunebe kesayet û takekes jî tunene, ev tunebin estetîk jî nikare hebe. Herkes dişibe hev. Li nivîskarekî/e ku di civaka feodal de dijî bifikirin ku bi sedan, bi hezaran mirov li dora wî/wê ne; ew nivîskar di wê qerebalixê de çawa dikare biafirîne, ji bo ku biafirîne berê berê divê ***tenê*** bimîne. Jixwe berî her tiştî weke pîşe civak nahêle ku ew pîşeya nivîskarîyê hilbijêre, heger hemû civak cotkar be, divê ew jî cotkar be, nahêlin, divê ew jî weke wan be, tu çare tuneye.

Alîyên feodalîteyê yên baş jî hene, weke mînak *ziman*, di civakên feodal de ziman pir baş tê parastin, lê ev parastin ne ji ***nêt-baş-î***-ya wan pêk tê, ji ber ku ji bavê kesî ne zêde ye bibe yekî din, ev kirûya parastinê pêk tê. Ev parastina zimên, dike ku zimanê neteweyî şîfreyên xwe ji feodalîteyê bigire. Îroj di nav kurdan de gelek nivîskar ji ber kesayetên xwe yên feodal li zimanê xwe yê kurdî xwedî derdikevin û ji wê *binhişînê* biryara nivîsînê didin, armanca wan bi parastina zimên ne parastina *netewe*yê, parastina *feodalîte*ya wan e; ji ber ku ew ziman weke nirx, feodalîteya wan sembolîze dike, ew li wî nirxê feodal xwedî derdikevin û di *devok* û *aksan*a wê feodalîteyê de israr dikin û xwe cirrnexweş dikin...


KURDISH-ART.COM

DAXUYANÎ

Em bi navê *kurdish-art.com* malpereke nû ya online galerî ava dikin; mebesta wê berhevkirin, danasîn û pêşkêşkirina berhemên hunerên bedew (wênesazî, şêwekarî, peykertraşî, grafîk…) ên kurdî ye. Armanc ew e ku em bala raya giştî ya kurd û cîhanê bikşînin ser hunermendên kurd, derfetan biafirînin ku hunermendên kurd bikaribin xwe û berhemên xwe bidin nasîn û ev malper ji bo wan bibe platformeke ragihandinê.

Herweha bi riya vê online galerîyê, dê hunermend bikaribin berhemên xwe ji bilî kurdan pêşkêşî hemû hunerhezên cîhanê bikin û bi firotina berheman jî di vî warî de bazarekê biafirînin. Bi vî avayê malpera kurdish-art.com xwedîyê vîzyoneke navneteweyî ye jî.

Di online galerîya xwe de em ê hewl bidin ku xwe bigihînin hunermendên kurd ku li gelek welatên cuda yên cîhanê belav bûne û li welatên ku bi cîh bûne, hunerên xwe didomînin.

Demeke dirêj e ku em li ser hunermendên kurd xebatekê dimeşînin, lê bi tenê bi hewldana me gihîştina hemû hunermendan gelek zehmet e.

Ji ber vê yekê em daxwaz û hêvî dikin ku hemî hûnermendên kurd di vê xebatê de cîh bigirin. Ji bo avakirina "database"ke nav û navgînên tekîlîdanînê -e-mail, navnîşan, nimroyên telefonê- ji me re bişînin an jî bi navnîşana jêrê re bikevin têkîlîyê. Bi alîkarîya we em ê gelek kêfxweş bin.

**Bi dostanî û biratî...**

**Agahîyên têkilîyê:**
**Hasan Huseyin Deveci**
**Tel: 0049 (0) 1788602796**
**E-mail: info@kurdish-art.com**

**Projeya kurdish-art.com**

IKMG
INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP

RADYOYA YÊRÊVANÊ *

# Ji bo bîranîna daner, kedkar û dengbêjên wê

AYHAN ERKMEN **

Sedsala 20ê jî, wekî sedsalên berî xwe ji bo kurdan xêr û bêrek neanî. Di nîvê sifte yê sedsala 20ê de, kurdan salên xeter û biêş li pey xwe hiştibûn. Bi destê dewletên dagîrker, -hemûyan gotina xwe kiribû yek- her deh salan carekê, komkujîyek hatibû serê kurdan. Dawîya salên 1920ê **Serhildana Agirîyê**, dawîya salên 1930ê **Serhildana Dersîmê** û disa van salan bi destê Stalin sirgûnkirina kurdên Kafkasê, ber bi Asyaya Navîn ve, dawîya salên 1940ê **Serhildana Barzanî** û disa van salan, nemana Komara Mahabadê, kurd bi komkujîyên mezin re rû bi rû man. Di dawîya van salên perîşantîyê de, bêdengîyekê esmanê kurdan girtibû.

**Serokkomarê Ermenistanê Sver Tomasyan, sala 1954ê bi mezinên kurdan re li Yêrêvanê civînekê çêdikê. Piştî vê civînê kurd gelek mafan bi dest dixin û yek ji wan jî; rê li ber Radyoya Yêrêvanê vedibe.**

Di pey mirina Stalîn re, serokkomarê Ermenistanê Sver Tomasyan, sala 1954ê bi mezinên kurdan re li Yêrêvanê civînekê çêdikê. Dixwaze guhdarîya daxwazên kurdan bike û wan daxwazan bi cih bîne. Piştî vê civînê kurd gelek mafan bi dest dixin û yek ji wan jî; rê li ber Radyoya Yêrêvanê vedibe.

Sala 1955ê bi damezrênerîya **Casîmê Celîl**, Radyoya Yêrêvanê bi anonsa *"Yêrêvan xeber dide, guhdaren êzîz, naha bibîsin deng û behsên teze"* ve dest bi weşana xwe dike. Dema sifte bi tenê 15 deqe mafê weşanê heye. Di pey hevdîtina **Mistefa Barzanî** re -wê demê li Sovyetistanê li sirgûnê ye- û Kremlînê, ev weşan dibe saet û nîvek û li her çar parçeyên Kurdistanê jî tê guhdarî kirin. Di pey wan salên xeter re, dengê Radyoya Yêrêvanê wek mizgînîya serxwebûn û azadîyê tê fêm kirin.

Radyoya Yêrêvanê, li paytextê Ermenistanê Yêrêvanê, tevî zimanê kurdî, tirkî û farisî, bi 12 zimanan weşan dikir. Piştî **Casîmê Celîl**, bi rêzê **Xelîlê Çaçan** û **Ehmedê Gogê** serokatîya Radyoya Yêrêvanê ya beşa kurdî kir. Niha jî nêzî sî salan e **Keremê Seyad** serokatîyê dike.

Herweha di van salan de gelek kesên din, wekî **Nûrê Polatov, Zeyneva Îvo, Ordîxanê Celîl, Şamîlê Beko, Xelîlê Abdullah, Egîdê Cimo, Karapêtê Xaço, Aram Tîgran, Nûra Cewarî, Cemîleya Celîl, Zarê Seyad Tîtal** û **Leyla** li Radyoyê xebitîn. Ev kes hemû jî stêrkên esmanê Kurdistanê ne. Heya jîyan hebe, wê kurd van egîd û nemiran hertim bi qedirgiranî bi bîr bînin.

**Dema Radyoya Yêrêvanê weşan dikir, li Iraqê Radyoya Bexdayê û li Îranê jî Radyoya Ûrmîyê bi kurdî weşan dikirin. Lê belê van her du radyoyan wek Radyoya Yêrêvanê, li her çar parçên Kurdistanê di nav kurdan de cih negirt û lê nehat guhdarî kirin.**

Heya salên 1990ê, vebûna kanalên televîzyonê yên kurdan, guhdarîya Radyoya Yêrêvanê, di nav kurdan de wekî nexweşîyekê bû. Frekans û saeta wê ya weşanê, wek mîxa di hişan da cih girtibû. Nêzî nîvsedsalê, kurdan bi wê, nefes hildan û dan. Ew welatê çar parçe, saya serê wê hay ji hevdû dibûn; bi şahî û şînên hev kêfxweş û xemgîn dibûn. Vê radyoyê, ew sînorên dagirkeran yên ku kurd ji hev veqetandibûn, nas nedikir. Ew ji bo kurdan wek pireyekê bû.

Dema Radyoya Yêrêvanê weşan dikir, li Iraqê Radyoya Bexdayê û li Îranê jî Radyoya Ûrmîyê bi kurdî weşan dikirin. Lê belê van her du radyoyan wek Radyoya Yêrêvanê, li her çar parçên Kurdistanê di nav kurdan de cih negirt û lê nehat guhdarî kirin. Mixabin di van radyoyan de, zimanê kurdî, di bin bandora zimanê erebî û farisî de dima, zimanê Radyoya Yêrêvanê kurmancîyeke zelal bû.

**Arşîva herî mezin ya muzîka kurdî, niha jî di destê Radyoya Yêrêvanê da ye**

Radyoya Yêrêvanê ji bo nêzîkkirina kurdan roleke mezin dît. Li gund û bajaran, wan salên tuneyîyê, hejmara radyoyan bi qasî pêçîkên destekî bû, ji bo wê jî, xelk di wê saeta weşanê da dihatin cem hev, li her malekê 40-50 kes, wek îbadetekê xelkê guhdarîya radyoyê dikir, li ber dengê radyoyê digriyan, dikeniyan, xeber û gotin şirove dikirin.

# *Jiyan bi kurdî xweş e!*

Arşîva herî mezin ya muzîka kurdî, niha jî di destê Radyoya Yêrêvanê da ye. Li gor gotinan, nêzî 1500 qeydên wan hene. Ev bi serê xwe bi tenê xizmeteke herî mezin e. Xebatkarên radyoyê, ji bo vê xizmetê gund bi gund û mal bi mal geriyane.

Miho, Apo, Temo Lawo, Lawikê Metînî, Bişarê Çeto, Mîrzikê Zaza, Emê Gozê, Filîtê Quto, Xozan Daxê, Derwêşê Evdî, Mem û Zîn, Siyabend û Xecê, Salih û Nûrê, Huso û Nazê û bi hezaran stranên din jî wek kulîlkên keda radyoyê, hê hene û dijîn.


Radyo demekê di pey vekirina xwe re û bi şûn de, wek cihekî weşanê zêdetir, bi rola konservatuara dengbêjîyê jî rabû. Dengbêjan çav dan hev û xwe pêş da birin. Bi sedan gotinên cuda keşf kirin. Ku meriv bêje her dengbêjek stîleke xwe hebû, ne şaş e. Tenê klam û stran na, xebatkarên wê jî,wek xebatkarên enstîtûyê, wek şoreşgerê çandê, çanda Kurdîya devkî, hemû hildan bin qeydê û ji mirinê jî xelaskirin.


Aramê Tîgran


Nûra Cewarî


Ordîxanê Celîl


Xelîlê Çaçan


Feyzoyê Rizo


Sûsika Simo



Aslîka Qadir


Eyşeşan


Karapetê Xaço


Cemîla Celîl


Şêroyê Biro



Casimê Celîl



Meryemxan



Ehmedê Gogê


Zadîna Şakir


Egîdê Cimo


Zeyneva Îvo


Keremê Seyad


Mihemed Arifê Cizîrî


Xana Zazê

**Wan salên ku radyoyê weşan dikir, li Kurdistanê agir bi ser kurdan de dibarî**

Radyo ji bo kurdan dibistan jî bû. Wan salên radyoyê weşan dikir, li Kurdistanê agir bi ser kurdan de dibarî. Li başûrê piçûk, kurd ji welatîtîyê hatibûn derxistin, li bakûr zimanê kurdî qedexe bû, kesên bi kurdî dipeyivîn, bi cezayên pere rû bi rû diman. Heya salên 1990ê jî, muzîka kurdî qedexe bû; kesên ku kaseteke bi kurdî li mala wan bihata girtin, dihatin ceza kirin. Li dijî asîmîlasyonê jî Radyoya Yêrêvanê, sînor nas nekirin; gotibêjên dîrokî, xeber, şanoyên radyoyê, klam û stran, tax bi tax, mal bi mal dibistana zimanê kurdî bû. Bi xêra wê haya kurdan ji pêşeroj û paşeroja xwe, ji gelê xwe, ji parçeyên dinê çêdibû û wan keyfa çîrok, stran û klamên xwe derdixistin.

Di Şerê cîhane yê yekemîn de, Kurdistan serûbin bû, bi peymanan sînorên sedsalane li ser wê, hatin kişandin û hin kurdan cih guherandin û malbatan hev winda kirin. Radyoyê ji bo hevdîtinê jî rolek dît; kesên merivên xwe winda kiribûn, dem dem di radyoyê da navê gund, bavik, êl û eşîrên xwe digotin û li merivên xwe digeriyan.

Ez van navan nebêjim, ez ê gunehkar bim. Min hemû roja sifte bihîstine, dengê wan hê jî di guhên min da û cîhê wan bi wê germîyê va li ser dilê min e: **Şiblîya Çaçan, Werda Şemo, Asa Evdîle, Xana Zazê, Begîya Qadîr, Sûsika Simo, Eyşe Şan, Fatma Îsa, Meyrem Xan, Aslîka Qadîr, Zadîna Şakir, Karapetê Xaço, Şeroyê Biro, Efoyê Esed, Ahmê Çolo, Egîdê Cimo, Aramê Tîgran, M. Arîfê Cizîrî, Seyadê Şamê, Hêmidê Mecîd, Feyzoyê Rizo** û gelek dengbêjên din, dengê xwe, bi riya Radyoya Yêrêvanê gihand hemû kurdan û di dilê wan da cihekî mezin girt.

Min ev nivîs ji bo bi bîranîna guhdarîya stranên Radyoya Yêrêvanê nivîsî, ew deng û muzîk nebûna, ev nivîs jî nedibû.

*Radyoya Yêrêvanê; hin kurd dibêjin, "Radyoya Rewanê"
**Şaredarê Bazarcixa Qersê

# NAVEROK

GULAN 2011


Siyaseta kurd û raperîna sîvîl
PROF. DR. MESUT YEGEN
► R. 1

Hilbijartinên giştî û yekîtîya neteweyî ya kurdan
ORHAN MIROGLU
► R. 1

JI ÇAPEMENÎYÊ
► R. 2

Piştî çar salan…
SERGE HALIMI
► R. 2

Jêder û rêzebûyerên "hiqûqa desttêwerdanê"
ANNE-CÉCILE ROBERT
► R. 6

Çavkorîya qedera malbata Esed li Sûriyeyê
PATRICK SEALE
► R. 8

Li Tûnisê hilpekîna şoreşê
JEAN-PIERRE SÉRÉNI
► R. 9

El-Cezîre, meydaneke alternatîf a siyasetê
MOHAMMED EL OIFI
► R. 10

Hindistan-Çîn; lihevnekirin, dubendî û cudayetî
CHRISTOPHE JAFFRELOT
► R. 11

Kurdistan: Piştî sê salên dîktatorîyê
HUSEYIN YILDIRIM
► R. 12

Dema ku gelê îslandî li hember bankeran deng didin
OBERT WADE & SILLA SIGURGEIRSDOTTIR
► R. 14

Îxaneta li hember Huffington Postêr
RODNEY BENSON
► R. 16

Komputervanê bi baterî
NICOLAS SÉNÉ
► R. 17

Otomatên ragihandinê
IGNACIO RAMONET
► R. 18

Aktîvîzma karbidestan
WENDY KRISTIANASEN
► R. 19

Amerîkîyekî aşt û aram
PIERRE CONESA
► R. 19

Sîber-êriş li dijî Tehranê
PHILIPPE RIVIÈRE
► R. 20

Di dawîyê de, darazek ji bo "tawanên şerî" çêdibe
DAVID MONTERO
► R. 21

1848, Bihara Gelan
ALAIN GARRIGOU
► R. 22

ÇAND Û HUNER
► R. 23



## Forma Abonetiyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê:
Postcode

Bajar:
City

Telefon:

E-Mail:

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €) ☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

**Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)**
**Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin**

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB